

K.T.
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTITUYA ZIMANÊN ZINDÎ
MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



KIRDEYA HOŞDARÎKIRINÊ DI GOTINÊN MEZINAN DE



TEZA LÎSANS A BILIND

Xwendekar

Araz Khalaf AMO

Şêwirmend

Doç. Dr. Haşim ÖZDAŞ

WAN-2023

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI



ATASÖZLERİNDE UYARI EYLEMLERİ



YÜKSEK LİSANS TEZİ

Öğrenci

Araz Khalaf AMO

Danışman

Doç. Dr. Haşim ÖZDAŞ

VAN-2023

KABUL VE ONAY

Araz Khalaf AMO tarafından hazırlanan “Kirdeya Hoşdarîkirinê di Gotinên Mezinan de” adlı tez çalışması aşağıdaki jüri tarafından OY BİRLİĞİ / OY ÇOKLUĞU ile Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında YÜKSEK LİSANS TEZİ olarak kabul edilmiştir.

Jüri Üyeleri

İmza

Danışman: Doç. Dr. Haşim ÖZDAŞ

Van YYÜ. İlahiyat Fakültesi Tefsir Anabilim Dalı

Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum.

.....

Başkan: Dr. Öğr. Üyesi Kenan SUBAŞI

Mardin Artuklu Üniv. Yaşayan Diller Enstitüsü

Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum.

.....

Üye : Unvanı Dr. Öğr. Üyesi Yakup AYKAÇ

Van YYÜ. Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum.

.....

Tez Savunma Tarihi:

05/06/2023

Jüri tarafından kabul edilen bu tezin Yüksek Lisans Tezi olması için gerekli şartları yerine getirdiğini ve imzaların sahiplerine ait olduğunu onaylıyorum.

.....

Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ
Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürü

ETİK BEYAN SAYFASI (EK-4)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü **Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;**

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumu,
- Tez çalışmada yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi,
- Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
- Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu

bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim. (05/06/2023)

(İmza)

(Araz Khalaf AMO)

(Teza Lîsansa Bilind)
Araz Khalaf AMO
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
Hezîran - 2023
**KIRDEYA HOŞDARÎKIRINÊ DI GOTINÊN MEZINAN DE
KURTE**

Ziman sîstemeke destnîşankirî ye li gorî yasa û rêzikan. Xwedan formeke cihgir û gelemper e, lê her miletekî li gorî xwe ev yasa û rêzik dariştine. Alaveke sereke ye ji bo duristkirina peywendîyên navxweyî û navdewletî. Ziman gelek kirde û kiryanan radigehîne, çî ew kirde rasterast bihên ragihandin an bi rêya hawirdorê hest pê bê kirin. Yek ji wan fakterên bi zengînkirina zimanî radibe pragmatîk e. Hoşdarîkirin sereketirîn kirdeya pragmatîkê ye û roleke giring di nava zimanî de heye, bi şêweyeke taybetî, herwesa bi şêweyeke sertaserî rola xwe di nava civakî de dibîne. Çimkî ev kirde radibe bi hoşdarîkirina komelgehê da ku bihêne parastin û dûrkirin ji ewan kar, kiryar, reftar û hizrên negunca, ewên heyîn û dê hebin. Ev kirde di hemû mecalên jîn û jîyarê de dihêne bikaranîn. Gotinên Mezinan ew gencîneya biqîmet e ya ku ji bab û kalên me ji bo me maye, ew nexşeyê xwecih e yê ku heta îro jî qîmetê xwe ji dest nedaye, berevajî bihêztir lêhatîye û bûye tovê hemû kûr û danîştinên rewşenbîrî û asayî. Çimkî axêver ji bo selmandin û bihêzkirina axiftinê û çendîn meremên din penayê ji bo vî janrê folklorê dibe. Kirdeya hoşdarîkirinê ji hêla formê ve kurt û sivik e, lê di warê naverokê de peyamek kûr û kêrhatî heye, ev xala hevpar a di navbera vê kirdeyê û gotinên mezinan de ye. Çimkî ev beşa edebîyatê ji hêla ruxsarê ve kurt e û xwedî naverokeke kûr e, ev çende di pragmatîkê de rolek mezintir dilîze, bi vê wateyê ev her du cure derbirînê ji naverokek berfireh dikin bi rêya kurtasîyê. Herweha amanca van xizmetkirina civakê ye, da ku hişmend bin û dûr bin ji nexweşî û belayan. Ev yek bû sebab ku kirdeya zimanî ya herî giring bi beşa herî giring a edebîyata folklorî re bê tevlihevîkirin û ev yek ji bo vê xebatê bû navnîşan.

Peyvên Sereke: Ziman, Pragmatîk, Kirde, Hoşdarîkirin, Gotinên Mezinan.

Hejmara Rûpelan: I-VII + 1-139

Şêwirmend: Doç. Dr. Haşim ÖZDAŞ

(Yüksek Lisans Tezi)
Araz Khalaf AMO
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
Haziran - 2023
ATASÖZLERİNDE UYARI EYLEMLERİ
ÖZET

Dil, kendi kural ve düzenine göre kurulmuş yerel ve genel bir şekli olan fakat her milletin bu kural ve düzeni kendine göre kurmuş olduğu, iç ve milletler arası ilişkileri düzeltmede başlıca araç olan bir sistemdir. Dil birçok eylem ve durumu aktarır, bu eylemler ister doğrudan ister çevre aracılığıyla iletilir. Dili zenginleştiren faktörlerden biri pragmatiktir. İkaz etmek pragmatizmin en önemli işlevidir ve dil dünyasında önemli bir role sahiptir. Bu rol genel olarak toplumda karşılık bulur. Çünkü bu eylem, toplumu onları korumaya veya kaçınmaya teşvik ederek ortaya çıkar. Yaşamımızda yanlış eylem, davranış ve uygunsuz düşünceler vardır ve var olacaktır, bu ikaz etme sayesinde hayatın bütün bağlamlarında kullanılmaktadır. Atasözleri, atalarımızın bize bıraktığı kıymetli hazinedir. Çünkü bugün bile değerini kaybetmeyen yerli harita, aksine güçlenmiş, derin ve entelektüel ve sıradan tüm tartışmaların sebebini oluşturur. Konuşmacı konuşmasını daha etkili ifade etmek için kelimelerin ya da ifadelerin temel anlam dışında folklorun derinliklerinden de istifade eder. İkaz etme eylemi biçim olarak kısa ve hafiftir, ancak içerik olarak derin ve anlamlı bir mesaja sahiptir. Bu gibi eylemlerin atasözleriyle ortak noktası budur, çünkü bu edebi sözler doğası gereği kısadır ve derin bir içeriğe sahip olduğundan pragmatizmde daha büyük bir rol oynar. Bu anlamda bu iki anlatım türü kısalık yoluyla bir içeriği genişletir ve bunların amacı toplumu mutlu etmek ve hastalıklardan ve felaketlerden uzak tutmaktır. Dilsel etkinliğin en önemli etkinliği halk edebiyatının en önemli bölümüyle karıştırılmasının nedeni buydu ve bu durum da bu çalışmanın yapılmasına aracı oldu.

Anahtar Kelimeler: Dil, Pragmatik, Eylem, Uyarmak, Atasözleri.

Sayfa Sayısı: I-VII + 1-139

Danışman: Doç. Dr. Haşim ÖZDAŞ

(M.Sc. Thesis)
Araz Khalaf AMO
VAN YÜZÜNCÜ YIL UNİVERSİTY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES
June - 2023
WARNING ACT IN PROVERBS

ABSTRACT

Language is a system that has a local and general form established according to its own rules and order, but each nation has established this rule and order according to its own, and is the main tool in improving domestic and international relations. Language conveys many actions and situations, either directly or through the environment. One of the factors that enrich the language is pragmatic. Warning is the most important function of pragmatism and has an important role in the world of language. This role is reciprocated in society in general because this action occurs by encouraging society to protect or avoid them. There are and will exist wrong actions, behaviors and inappropriate thoughts in our life, thanks to this warning it is used in all contexts of life. Proverbs are the precious treasure left to us by our ancestors, because even today, the local map, which has not lost its value, is the reason for all the discussions that are strengthened, deep and intellectual and ordinary. In order to express his speech more effectively, the speaker makes use of the depths of folklore besides the basic meaning of words or expressions. The act of warning is short and light in form, but has a deep and meaningful message in content. This is what such actions have in common with proverbs, since these literary sayings are short in nature and have a deep content, thus playing a greater role in pragmatism. In this sense, these two types of narration expand a content through brevity and their purpose is to make the society happy and to keep it away from diseases and disasters. This was the reason why the most important activity of linguistic activity was confused with the most important part of folk literature, and this situation was instrumental in making this study.

Keywords: Language, Pragmatic, Act, Warning, Proverbs.

Quantity of Pages: I-VII + 1-139

Supervizor: Doç. Dr. Haşim ÖZDAŞ

NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	II
ABSTRACT.....	III
PÊŞGOTIN	VI
DESTPÊK.....	1
1. HOŞDARÎKIRIN WEKÎ KIRDEYEKE AXAFTINÊ	5
1.1. Tewrîya Kirdeyên Axaftinê	5
1.1.1. Polînkirina Kirdeyên Axaftinê	12
1.1.1.1. Polînkirina Austin ji bo Kirdeyên Axaftinê	13
1.1.1.2. Polînkirina Searle ji bo Kirdeyên Axaftinê	14
1.1.2. Cureyên Kirdeyên Axaftinê	16
1.2. Kirdeya Hoşdarîkirinê.....	18
1.2.1. Zarava Hoşdarîkirinê di Ferhengan de.....	18
1.2.2. Destpêkek ji bo Kirdeya Hoşdarîkirinê di Zimanî de	20
1.2.3. Pênaseyên Kirdeya Hoşdarîkirinê	21
1.2.4. Zimanê Hoşdarîkirinê	22
1.2.5. Qadên Kirdeya Hoşdarîkirinê	24
1.2.6. Kar û Karvedan di Kirdeya Hoşdarîkirinê de	25
1.2.7. Giringî û Feydeyên Hoşdarîkirinê.....	26
1.2.8. Hoşdarîkirin wekî Kirdeyeka Axaftinê	27
1.2.9. Cureyên Kirdeya Hoşdarîkirinê	28
1.2.10. Taybetmendîyên Kirdeya Hoşdarîkirinê	30
1.2.11. Erkên Hoşdarîkirinê	32
2. ZIMANÊ GOTINÊN MEZINAN Û KIRDEYA HOŞDARÎKIRINÊ	38
2.1. Kirdeya Hoşdarîkirinê û Tewrîya Rêzgirtinê.....	38
2.2. Kirdeya Hoşdarîkirinê û Derdor “Hawirdor”	42
2.3. Kirdeya Hoşdarîkirinê û Çand “Keltûr”	46
2.4. Kirdeya Hoşdarîkirinê û Pragmatîk	50
2.5. Kirdeya Hoşdarîkirinê û Kirdeyên Têkildarî wê.....	55
2.5.1. Kirdeya Hoşdarîkirin û Kirdeya Şîretkirinê	55
2.5.2. Kirdeya Hoşdarîkirin û Kirdeyên Arastekirinê	59

2.5.3. Kirdeya Hoşdarîkirinê û Kirdeya Têkçûna Rû.....	63
2.5.4. Kirdeya Hoşdarîkirinê û Kirdeya Gefkirinê (Tehdîtîkirin)	67
2.6. Gotinên Mezinan.....	72
2.6.1. Zimanê Gotinên Mezinan.....	74
2.6.2. Rehendên Gotinên Mezinan.....	76
2.6.2.1. Rehendê Civakî.....	77
2.6.2.2. Rehendê Abûrî	80
2.6.2.3- Rehendê Dîrokî (Mêjûyî).....	82
2.6.2.4. Rehendê Exlaqî (Rewîştî)	83
2.6.2.5. Rehendê Olî (Ayînî).....	85
2.6.2.6. Rehendê Sîyasî (Polîtîk).....	86
2.6.2.7. Hoşdarîkirin Wekî Rehendeke Gotinên Mezinan	87
2.6.3. Hoşdarîkirina Rasterast û Nerasterast di Gotinên Mezinan de	89
3. STRATEJÎYÊN HOŞDARÎKIRINÊ DI GOTINÊN MEZINAN DE	95
3.1. Modela Searle ji bo Kirdeya Hoşdarîkirinê	95
3.1.1. Hoşdarîkirina Eşkere (Explicit Warning)	95
3.1.2. Hoşdarîkirina Nepenî (Implicit Warning).....	96
3.1.3. Hoşdarîkirina Rasterast (Direct Warning)	96
3.1.4. Hoşdarîkirina Nerasterast (Indirect Warning).....	97
3.2. Stratejîyên Hoşdarîkirinê yên Searle di Gotinên Mezinan de	97
3.2.1. Hoşdarîkirina Eşkere di Gotinên Mezinan de	97
3.2.2. Hoşdarîkirina Nepenî di Gotinên Mezinan de	103
3.2.3. Hoşdarîkirina Rasterast di Gotinên Mezinan de	105
3.2.4. Hoşdarîkirina Nerasterast di Gotinên Mezinan de	116
ENCAM	132
ÇAVKANÎ.....	134
ÖZGEÇMİŞ	
LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU	

PÊŞGOTIN

Hoşdarîkirin kirdeya axaftinê ya herî giring e, rolek giring di ziman de bi gelemperî û di pramatîkê de bi taybetî dilîze. Ev kirde di wêje û hemû qadên jîyanê de jî tê dîtin, cîmkî nameyên hoşdarîkirinê bi zimanekî sade, zelal û kurt ji bo civakê tên pêşkêşkirin. Ji ber vê yekê pêşwazîyeke baş li van nameyên hoşdarîkirinê tê kirin. Ev îsbat e ku kirdeya hoşdarîkirinê bandorek baş li ser dil û mejîyê mirovan kirîye. Sînore kirde ya hoşdarîkirinê pir berfireh e û piranîya kirdeyên din yên axaftinê di vê kirdeyê de tene bikaranîn, lêbelê kirdeyên ku di nameyên hoşdarîkirinê de tene bikaranîn hemû ji amancên hoşdarîkirinê re kar dikin. Yanî ji bo berjewendîya guhdêran xizmetê dikin da ku guhdêr bên parastin ji her nexweşî û zirareke ku hebe.

Gotinên mezinan beşeke giring a edebîyata folklorî ye, di encama bûyerên jîyanê de peyda bûne. Li gorî felsefe û asta zanîna neteweyan derbarê jîyana civakî de tê hejmartin, wekî çandêke pêşîn tê hesibandin û mîna neynîkekê ye ku kevneşopî û serpêhatîyên neteweyê nîşan dide. Ev beşa edebîyata folklorî ji ber kurtasîya xwe ji hemû beşên din ên edebîyatê zêdetir mana xwe parastîye û bi devkî ji nîfşekî ji bo nîfşekî din hatîye veguhastin. Bi erkê parastina ziman, kevneşopî û çandê berpirsyar e.

Ev xebata me ya ku bi navê “Kirdeya Hoşdarîkirinê di Gotinên Mezinan de” hewldanek e, ku em xebateke din li pirtûkxaneya kurdî zêde bikin. Ev xebat ji destpêk, sê beş û encamê pêk tê. Di destpêkê de kirdeya hoşdarîkirinê bi awayekî kurt û hêsan anîye ziman, herweha bêtî ku em bikevine hûrgilîyên xebata xwe me sedema vekolîna tezê, giringîya tezê û sînoren tezê diyar kirine. Beşa yekem bi sernavê “Hoşdarîkirin Wekî Kirdeyeke Axaftinê” dest pê dike, ev beş ji du pişkên giring pêk tê, yek: Tewrîya kirdeyên axaftinê, ev tewrî bi dirêjî hatîye ravekirin, du: Kirdeya Hoşdarîkirinê, ev kirde jî bi dirêjî hatîye şirovekirin. Beşa duyemîn bi sernavê “Zimanê Gotinên Mezinan û Kirdeya Hoşdarîkirinê” dest pê dike. Di vê beşê de hoşdarîkirin bi çendîn zanistan re hatîye nîqaşkirin, herweha hoşdarîkirin û kirdeyên têkildar bi hevdu hatîne hevberkirin, digel vê yekê jî gotinên mezinan û têkilîya di navbera kirdeya hoşdarîkirinê û gotinên mezin de hatîne zelalkirin. Beşa sêyem bi sernavê “Stratejîyên Hoşdarîkirinê di Gotinên Mezinan de” dest pê dike. Di vê beşê de modela Searle ji bo kirdeya hoşdarîkirinê hatîye

şirovekirin, herweha gotinên mezinan jî li gorî stratejîyên Searle, ji bo kirdeya hoşdarîkirinê hatine ravekirin û dabeşkirin. Di dawîya vê xebatê de hin xalên giring ên hoşdarîkirinê û gotinên mezinan derketin holê û ev xal bûne encam ji bo vê tezê.

Li vir, di serî de ez spasîyên xwe ji şewirmendê xwe Doç, Dr. Haşim ÖZDAŞ ra dikim, ku ji despêka xebatê heta dawîyê piştgirî û zanînên xwe li ber min negirt û di proseya amadekirina tezê de bi bêhinfirêhî û dilovanî kêmasîyên min dîyarkirin û rê li ber min vekir. Herweha spasîyên taybet ji bo mamoste û rênîşanderê min Dr. Şêrzad Sebrî, her tim wekî birayekî bi min re serederî kirîye. Herweha spasîyên mamosteyên Hîndekar Hacı YILMAZ û Nesîm SÖNMEZ re dikim ku çavkanîyên xwe ji min ra vekirin û di serdema dersan de min gelek sûd ji wan wergirt. Ji bo Felemez BOZKURT û Nacî ERDAŞ re spasîyên xwe dikim.

Dixwazim xalekî taybet ji bo her du Pirtûkxaneyên “Kolêja Ziman û Kolêja Perwerde û Binyat li Zanîngeha Dihokê” ra vekim ku wan ji destpêka xebatê heta dawîya xebatê cih ji min ra vekirin û bi mêvanperwerî ez li pirtûkxaneyê hewandim û pirtûkên xwe li ber min rêz kirin. Ji ber vê yekê spasîyên herî ji dil pêşkeşî wan hemû mamoste û hevalan dikim.

Di vir de divê ked û zehmeta malbat û mamosteyên xwe ji bîr nekim û spasîyên xwe ji wan kesên henûn ra jî bikim. Herweha spasî bo heval û destebirakê min Yusif Hêşetî ra, teza min ji serî heta binî xwend û kêmasîyên tezê eşkerekirin.

Ez vê tezê dîyarî her kesê aşiqê ziman û çanda kurdî dikim, cimkî çi kesan bi qasî wan qehir nekêşaye.

Araz Khalaf AMO

Wan-2023

DESTPÊK

Kirdeya Hoşdarîkirinê çi ye? Taybetmendîyên wê çi ne? Di ziman û edebîyatê de rola hoşdarîkirinê çi ye? Ma hoşdarîkirin bi zanist û kirdeyên din re têkildar e? Di destpêka hemû xebat û lêkolînan de gelek pirs ji guhdêran re derdikevin pêş, ji ber vê yekê divê pirsên giring bêne kirin û bi zanistî werin bersivandin, ji bo ku feyde û xweşîyê pêşkêşî guhdêran bike. Hoşdarîkirin kirdeyeke axaftinê ye, ku ji bo mirovan pir giring e, çimkî şîret û agahîyan dide civakê, ji bo parastina wan ji nexweşî û pirsgirêkan, Hoşdarîkirin her dem di berjewendîya guhdêran de dixebite. Kirdeya hoşdarîkirinê xwedî gelek taybetmendîyan e, her tim hewl dide bi rêya herî hêsan û kurt bigihîje ber destê guhdêran, ku feydeyê bigihîne wan û bandorê li jîyana guhdêran bike. Hoşdarîkirin di ziman de roleke giring dilîze, radibe bi hêsanîkirin û kurtkirina name û peyamên zimanî, di heman demê de gelek mijarên zimanî yên tevlihev û zehmet bi awayên ne zimanî pêşkêşî civakê dike, ku bi hêsanî bandorê li wan bikin. Herweha di hemû mijarên edebî de hoşdarîkirin tê dîtin. Hoşdarîkirin dixebite ji bo hêsanîkirina berhemî û bi rengeke guncay radestê guhdêran dike. Bi vê wateyê berhemên edebî bi rêya hoşdarîkirinê digihîjin wan amancan yên ji bo hatine danan û hoşdarîkirin ji digihîje amanca xwe, ji ber ku bi kêrî guhdêran tê. Di hemû zanistan de kirdeya hoşdarîkirinê heye, di nava zanistan de çi tiştê bikêrhatî be û hoşdarîkirin bizane dê bi kêrî civakê bê, hoşdarîkirin dê hemû hewlan bide ku vê yekê bi kurtî û xweş ji civakê re ragihîne. Di navbera hemû kirdeyên axaftinê de têkilîyeke xurt heye. Eşkere ye ku çarçoveya hoşdarîkirinê pir berfireh e, ji ber vê yekê peyamên piranîya kirdeyên axaftinê di nameyên hoşdarîkirinê de têne dîtin, lê ew hemû ji bo amancên hoşdarîkirinê têne bikaranîn, anku kirdeya hoşdarîkirinê ji hemû kirdeyên din sûd werdigire da ku xizmeta civakê bike û karî ji bo guhdêran hêsan bike.

Gotinên mezinan çi ne? Zimanê gotinên mezinan çawa ye? Çima gotinên mezinan ewqas belav bûne? Ev pirs û gelek pirsên din li dor gotinên mezinan hene, da ku bigihîjin raman û amancên rast. Gotinên mezinan beşeke giring a edebîyata folklorî ne, ev beş axiftinên kurt û kêrhatî ne, gotina wan sivik in, ji ber vê yekê ew bi hêsanî têne jiberkirin. Van gotinan hemû bûyerên jîyanê birêkûpêk di nava xwe de tomarkirine. Paşxaneyek e ji bo millet, ku bi dîroka xwe ya qedîm aşna bibin, herweha da ew xeletîyên bav û kalên wan

kirine, ji bo jîyana zarokên wan re bibin ders. Ev gotin bi zimanekî sade, sivik, asan, manewî û xweş tên gotin. Ev gotin bi devkî di nav millet de belav dibin û ew ji nifşekî derbasî nifşekî din bûne, da ku ji bo jîyana xwe bikin yasa û destûr. Li ser hemû mijarên jîyanê gotinên mezinan hene, hêsanî û giringîya gotinên mezinan bûye sebeb ku ew tevî hemû babet û zanistan bibe.

Ev xebat ji zanista zimannasî û edebîyatê têkel bûye, ev tê wê wateyê ku di navbera zimanî bi gelemperî û edebîyatê de têkilîyeke xurt heye. Herweha di navbera kirdeya hoşdarîkirinê û gotinên mezinan de jî wekhevî û têkilîyek e giring heye. Çimkî her du jî ji alîyê ziman, naverok û amancê ve wekî hev in, yanî hoşdarîkirin û gotinên mezinan bi zimanekî sade û kurt tên pêşkêşkirin, digel vê jî xwedîyê naverokeke giring û berfireh e û her du jî xwedîyê heman amancê ne. Ew jî ji civakê re xizmetê bikin ku huşmend bibin û nekevîne tu nexweşî û pirsgerêkan. Ziman û çandê bi gelemperî gelek têkilî, cudahî û têkilîyên dualî hene: Mirov ji civakê fêrî ziman dibe û her ji civakê jî bi çanda xwe re şad dibe. Ziman û çand di hemû mijaran de cih girtîye. Ziman ji bo avakirina têkilîyên civakî û çand jî ji bo avakirina têkilîyên mirovan tê bikaranîn. Ziman û çand ji bo neteweyan nasname ne, çimkî taybetmendîyên neteweyî nîşan didin. Ziman û çand aîdî hemû neteweyan e, anku xwedîyên xwe yê taybetî nînin. Merem ji têkilîyên dualî ew e ku her du alî ji hev sûd wergerin, bi vî awayî: Zimanî çand bi devkî parast heta ku hatî nivîsandin û ketî di xaneyê edebî de û çandê ziman tevî hemû alîyên jîyanê kir û di heman demê de zimanê pak û resen di nav xwe de parastîye, bi vê wateyê ziman û çand hevdu ji windabûnê parastin, ger yek ji wan nebûya yê din jî nedibû, ger heba jî ne li asta heyî bûya. Ev hal bû sebeb kirdeyeke axaftinê zimanî têkelî beşeke folklorê bikit, ji bo gihîştin bi raman û amancên rast, çimkî her du hevdu temam dikan.

Di vê xebatê de tu pirtûkên li ser gotinên mezinan nehatine destnîşankirin, da ku sînoren gotinên mezinan teng nebin. Ji ber ku ger pirtûkek bihata destnîşankirin, dibe ew pirtûk taybet bi herêmeke Kurdistanê bûya, yanî ev gotin dê ne aîdî hemû kurdan bûna, ev çende bû sebeb ku gotinên hemû herêmên Kurdistanê bên girtin, da ku ev xebat bibe xebateke gelemper li ser gotinên mezinan. Di vê xebatê de zêdetirî bîst pirtûkên li ser gotinên mezinan hatine bikaranîn. Pirtûkên ku hatine bikaranîn hemû baş û bikêr in, lê bi

gelemperî ev her du pirtûk ji hemûyan bêtir sûd ji wan hatîye girtin, ji ber ku ev pirtûk berfirehtir û bikêrtir in û forma kurdîyatîyê bi van pirtûkan ve xuya ye:

“Ferhenga Gotinên Mezinan” ya nivîser Rêkêş AMÊDÎ, ev pirtûk ji çar bergan pêk tê û ji weşanên Parêzgeha Dihokê ye, li sala 2020an hatîye çap kirin.

“Gotinên Pêşîyan” ya nivîser Mehmet ONCU, ev pirtûk ji çar bergan pêk tê û ji weşanên Sîtavê ye, li sala 2019an li bajarê Wanê hatîye çap kirin.

Ji bo ravekirina gotinên mezinan modela Searle hatîye bikaranîn, da ku ev xebat formeke zimanî ya rast wergire, di vê wateyê de gotinên mezinan bi yasayên zimannasîyê hatine tesnîfkirin û şirovekirin, heta rêjeyek baş ev çende biker e. Di dawîya vê xebatê de hatîye nîşandan ka kîjan stratejî herî berbelav e di nava gotinên mezinan de.

Kirdeya hoşdarîkirinê babeteke giring e di civakê de bi gelemperî û di zimanî de bi taybetî. Di axaftina rojane û nivîsînê de berdewam tê bikaranîn û sêdeke baş bo xelkê heye. Çimkî wan ji metirsî û zîyanan diparêz e û nahêle ku ew bikevine nav arîşeyan. Digel vê jî edebîyata folklorî bi şêweyeke gelemperî ji gelek formên derbirînkirinê pêk dihêt û nexasim gotinên mezinan bêtir ji hemû cur û beşên din ên edebîyata folklorî ev babete di nav de tê xuyakirin. Ev jî ji ber formê wê yê kurt û hebûna hejmara wan a zêde, bi kurtî gotinên mezinan rengvedana hizir, bîr, ketwar, dîrok û rewşenbîrî ya civakî ya milletî ye: bi erkê parastin, arastekirin, perwerdekirin û hoşdarîkirina kesan radibe. Ji ber vê yekê di vê lêkolînê de hoşdarîkirina temam a ku di nava gotinên mezinan de hatî razandin bidine xuyakirin.

Amanc ji vê lêkolînê ew e ku em bikarin kirdeya hoşdarîkirinê bidin xuyakirin û destnîşan bikin ji alîyê giringî û çawanîya karanîna wê ve û diyarkirina wî layenê hevbeş ê bihêz ewê di navbera kirdeya hoşdarîkirinê û gotinên mezinan de hey. Çimkî heta niha jî me serbûr ji ewan rûdan û karasatan wernegirtine yê ku gotinên mezinan di derheqê wan de hatine gotin. Me nikarîye kirdeya hoşdarîkirinê di gotinên mezinan de bi şêweyeke rast û durist bidine xuyakirin ji ber vê yekê jî ev gotinên mezinan bi tenê mayîne gotin.

Ev xebat hem di warê zimanî û hem jî di warê edebî de cih digire. Ji ber vê çendê sînorê wê berfireh e, ji alîyê zimannasîyê ve, sînorê vê lêkolînê bi rolê kirdeya

hoşdarîkirinê di asta pragmatîkê de girêdayî ye. Anku di çarçoveyek pragmatîk de tê berhevkirin û ji sînore pragmatîkê dernekeftîye. Herweha ev çende li gorî stratejîyên Searle ji bo kirdeya hoşdarîkirinê hatîye encam dan. Ev stratejî li ser sed gotinên mezinan hatîne analîz kirin.

Ev lêkolîn li dû rêbaza “wesfî-şîkarî” hatîye encamdan û piraktîkirina lêkolînê li dû dabeşkirina zanayê zimanî Searle, ji bo stratejîyên hoşdarîkirinê hatîye analîz kirin. Ev xebat di çarçoveya zanista zimannasî û edebîyatê de ye. Çimkî di vê xebatê de gotinên mezinan li gorî stratejîyên Searle ji bo kirdeya hoşdarîkirinê têne şirovekirin. Piranîya xebatên zimannasî yê li ser wêjeyê li gorî yasayên wêjeyê têne şirovekirin. Lê di vê lêkolînê de gotinên mezinan li gorî stratejîyên ziman tîne tesnîfkirin û analîzkirin. Bi vê wateyê kirdeya hoşdarîkirinê û stratejîyên hoşdarîkirinê radibin bi analîzkirina gotinên mezinan.

1. HOŞDARÎKIRIN WEKÎ KIRDEYEKE AXAFTINÊ

Hoşdarîkirin kirdeyeke axaftinê ye. Axêver hoşdarîyê dide guhdêr, ku tişteki bike yan neke. Yanî hişyarkirina kesekî ku tişteki bike yan neke, pêşnîyaz e ku eger mirov vê yekê neke, dê zîrarê bibîne. Her ku nameyek hoşdarîyê tê şandin, karek tê encamdan.

1.1. Tewrîya Kirdeyên Axaftinê

Tewrîya kirdeyên axaftinê di ziman de xala navendî ye. Qada herî giring a pragmatîka zimanî ye, ev tewrî ye qada herî kevnar a pragmatîka zimanî ye û hîn jî di ziman de bi gelemperî û di pragmatîkê de bi taybetî nîrxa xwe heye. Ev qad bi gelemperî li ziman dinêre, anku her tiştê ku tê gotin, ji du alîyan ve analîz dike, alîyê êşkere û alîyê veşartî. Belgeyên dîrokî yên vê tewrîyê ji me re dibêjin ku yekem kesê ku ev tewrîye îcad kirîye fîlozofê Alman Wittgenstein (Witginiştayin) bû. Vî feylesofî hin ravekirinên zimanî yên vê tewrîyê pêşkêş kirin. Paşê ji alîyê Austin (Ûstin) û Searle (Sîrêlî) ve hatin pêşxistin (Silêman, 2021: 5), rastîyek neguhur e ku fîlozofê alman Wittgenstein kesê yekem bû, ku tewrîya kirdeyên axaftinê pêşbînkir. Lê ev tewrî vedigere fîlozofê zanîngeha Oxfordê Austin li sala 1962yan, li paş wî fîlozofê Amerîkî Searle di nav salên 1969-1975-1977an de hizrên Austin rastkir û pêşxistin.

Feylesofan pêşî li ser tewrîya kirdeyên axaftinê xebitîn, anku ev tewrî ji hêla filosofan ve, ne ji hêla zimanzanan ve hatî destpêkirin (Levinson, 1983: 227). Ji ber vê yekê ev tewrî pir giring e û ketîye hemû alîyên zimên û bi perspektîfa felsefeya zimannasîyê li pragmatîkê dinêre. Piştî Wittgenstein gelek zanayên din yên curbicur li ser vê tewrîyê xebitîn weke: G.Moor, R.Hare, A.Ayer û C.Stevnson...hwd. Herweha gelek zanayên din berî û piştî Austin kar li ser vê tewrîyê kirine (Axduş, 2016: 4).

Serkêş û damezrînerê vê tewrîyê Austin e, ev feylesofê zanîngeha Oxfordê ye, di sedsala bîstan de. Di heman demê de ew yek ji navdartirîn rexnegiran e. Dîtin û nêrînên Austin bala fîlozof, psîkolog, zimanzan û civaknasan kişandîye ser xwe (Elî, 2015: 328-329). Ev tewrî vedigere bo Austin, demê sala 1955an de di dersên wî de ji xwendekarên zanîngeha Harvardê re pêşkêş kirin di pirtûkekê de bi navê “Tişt Çawa Banderê Li Gotinan Dikin” kom kirin. Piştî Searle û zanayên din ên pragmatîkê di salên 1970 û

1980an de ev tewrî pêş xistin (‘Ebdula & Elî, 2011: 238). Vê tewrîyê çend salekên kêr de cihê xwe di nava pragmatîkê de girt û giringîyeke zor pê hate dan. Evê tewrîyê bi çend hevokan dest pê kir û paşê vê tewrîyê qadeke berfireh girt û ji sînorê çend hevokên taybetî derbas bû, giha wê yekê ku her axaftineke hebe radibe bi kirina karekî. Lewma ev tewrî ber bi şirovekirina zimanê axaftinê ve diçe ne nivîsandinê.

Heta nîvê sedsala 20an pir belav bû ku di navbera gotin û kirina tiştêkî de ferqek mezin heye, wan ev her du dîyarde bi temamî ji hev veqetandibûn, wekî du tiştên ji hev cuda didîtin, ev nêrîn bi tevahî hat qebûlkirin û ji bo ku xwe îsbat bikin hin gotinên mezinan wekî delîl bikar anîn, wekî: Sed gotin gorî kiriyarekî bin, ev nêrîn bi vî awayî berdewam bû heta salên 1960î dema ku fîlozofê Brîtanî Austin daxuyand ku axaftin dibe sedema çalakîyê, bi vê fikrê ferqa di navbera axaftin û kirdeyê de ji holê hat rakirin (Austin, 1972: 13). Austin pêşî dixwaze cure hevokekê nas bike ku di nav de axêver ne tenê tiştêkî dibêje belku di heman demê de tiştêkî jî dike, Mînak Mela gava navî li zarokêkî dike, dibêje: Min navê vî korî kir Şevgêr.

Ev biwêj bi xwe pêkanîna karekî ye, anku binavkirina zarokêkî ye, di vê hevokê de axaftin û kirin yek dîyarde ye û ji hev nayên veqetandin (Tewfîq, 1995: 38-39). Ger em bi baldarî wateya her gotineke ku ji axêverî bo guhdêrî hatî pêşkêşkirin lêkolîn bikin, divê em ji du alîyên cuda yên ramanê lê binêrin. Çimkî du wateyên cuda hene: Ew jî wateya eşkere anku wateya gelemperî û wateya veşartî. Ev pêşkêşîyek çalak e ji axêver ber bi guhdêran ve û li gorî hawirdor (Dewruber) û têkilîya di navbera wan de dimîne.

Axaftin çalakîyek hevpar e di navbera axêver û guhdêrî de, her axaftin dikare bibe sedema têkilîyên civakî. Herweha Austin dibêje: Axaftin û têkelîkirin zincîreyeke ji kirdeyên axaftinê ku ji bo amancek taybetî bi renek rêxistinkirî tene bikaranîn (Austin, 1975: 100). Bi vê wateyê ne çalakîyên serbixwe ne, li gorî şert û mercên civakê dixebitin. Çimkî her hawirdorek peyv û biwêjên xwe yên bi kesianên wê derdorê re têkildar in. Dema ku ev gotin hatine şirovekirin û gotin dê ji wergir re werine şandin, di heman demê de wergir dê karibe karê ku jê re hatî dayîn bike. Austin dibêje ziman kirde ye, ne axaftin e û erka wî ya sereke pêkanîna karekî ye, wek: Raspardî, nûçe, tehdîd, agahdarî, ragihandin, pîrskirin, ferman, sozdan û hoşdarîkirin, ji xeynî van gelek amancên din jî

hene, ji van re kirdeyên axaftinê tê gotin (Dizey, 2012: 34). Ji ber vê yekê, amanca bikaranîna her axaftinê bi rewşa axêver, guhdêr û awayê axaftinê ve girêdayî ye. Anku ew ne tenê bi forma peyvan û çawanîya rêzkirina rêzimanî ve girêdayî ye. Ji ber ku her axaftin dema ku li hawirdorê tê danîn ji wateyekê zêdetir dide.

Kirdeyên axaftinê tene naskirin, ku çalakîyeke peywendîyane, di dema axaftinê de nêrînên axêverî tene ziman û di heman demê de bandoreke êşkere li ser guhdêrî dike û karvedanan li cem guhdêrî çêdike (Crystal, 1992: 362). Li vir qîmeta ziman xuya dibe, çimkî ziman karê ragihandinê bi tenê nake, belku her guherîneke li dinyayê çêbibe ziman sebeb e. Nêrîn an gotin bi kirdeyan re wekhev in. Çimkî gotina çend peyvan mîna kirdeyekê ye, ew karên bi rêya gotinê tene encamdan bi kirdeyên axaftinê tene zanîn û ji bo gelek amancan tene bikaranîn (Yule, 1996: 47). Li vir Yole îfade û axaftinê wekî kirdeyan nirxandine, ev hemû bi hev re, ew kereste û amûr in ku axêver ji bo îfadekirina çend kar û helwestan bikar tîne.

Gelek zana û feylesofan li ser kirdeyên axaftinê axivîne, lê hemû heman wateyê didin û hemû li dora heman mijarê dizivirin. Bi gelemperî Austin û Searle li ser tewrîya kirdeyên axaftinê li hev dikin û bi wî awayî li kirdeyan dinêrin ku erkê ziman kirina tiştan e, li cihê wê yekê ku rabe bi destnîşankirina rastî û nerastîya axaftinê. Austin pêşnîyar kir ku kirdeyên axaftinê ew qada axaftinê ye ku ji bo pêkanîna erkên ji hev cuda di gehandinê de tê bikaranîn û bikaranîna ziman re hin kirdeyên destnîşankirî dikarin bi rêya ziman bêne kirin (el-Marrani, 2010: 166).

Deyo û Tulongawing li ser kirdeyên axaftinê dibêjin: Ew peyv in yên ku axêver dibêje an ew karvedan e, ya ku di her axaftinê de tene kirin. Her dema ku axaftinek ji guhdêr re hate pêşkêşkirin û karvedan li cem guhdêr xuya bû, li wê demê kirdeya axaftinê tê kirin. Giringîya vê kirdeyê ew e ku mirov zanibe ka peyama axêver hatîye wergirtin yan na û heta çi radeyê wergir dikare wê bi cih bîne (Silêman, 2021: 17-18). Bi dîtina van bi rêya kirdeyên axaftinê em dikarin asta têgihîştina di navbera axêver û guhdêr de bizanin. Herweha rola dewruberî jî xuya ye ka li çi ast e û çawan karîye cihê xwe di nava bîrdanka kesianên civakî de bike.

Di derbarê kirdeyên axaftinê de ji encama eva li jorî hatî gotin, em digihîjin vê encamê: kirdeyên axaftinê ew kirde ne ku ji wateya formî wêdetir in û bi hawirdorê re têkildar in. Anku her peyva ku tê gotin, ji bilî wateya xwe ya eşkere wateyek veşartî hildigire. Ev wateya veşartî derbirîn e ji dîtî û ramanên axêverî beramber guhdêrî dikit. Vêca ev dîtina axêverî çî gefkirin, lêbûrîn, medih, silavkirin, retkirin, amojdarî, gazinde an hoşdarîkirin bit, li vir divê bê zanîn ku her axaftinek ji bilî wateya forma peyvan, gelek wateyên din jî hildigire, ku girêdayî hêz, melodî û şêwaza axaftinê ye.

Tevî eva Austin ji bo tewrîya kirdeyên axaftinê pêşkeşkirî, gelek zimanzanan ew rexne kirin, ku ew tewrîyek pêşkeftîya kirdeyên axaftinê pêşnîyaz nekirîye. Cimkî amanca Austin ew bû, ku bersiv bide feylesofên tewrîya delîl “selmandin” û şertên rastîyê. Xebata Austin hewldanek bû, ku van du tewrîyan pûç û bê qîmet bike, wî dijî wan tewrîyên ku erkên ziman sînordar dikin, li berhemanîna pêkhateyên rast û xelet ên ku bi pisporîyê têne bidestxistin xebat dikirin (‘Ebdulcelîl, 2006: 193). Bi gotineke din amanca sereke ya Austin bersing girtina wê nêrînê bû ewa digot, karê herî giring ê felsefî yê ziman afirandina vegotinên rast û derew e, Austin destnîşan kir ku gelek fonksiyonên din ên ziman hene, bi vê nêrînê lêkolînên Austin ji alîgîrên wî re bû pêşengek çêker (Elî, 2015: 330).

Ji hêla din ve derketina vê tewrîyê karvedanek bû ji tiştê ku Austin jê re digot Xeletîya Danasînê “Heleya Wesfî”. Di nav zimanzanên kevnar de wesa daye xuyakirin ku wesfa rewşekê dike, berî ku nêrînên Austin bi cih bibin erkê hevokê, nemaze hevoka ragihandinê weha dabû naskirin, ji bo ravekirina rewşekê bi kar tê, van nêrînan bi tevahî di civakê de cihê xwe girtibû (Austin, 1975: 3). Ger em li van mînakên binêrin:

Heyva çardehşevî ye.

Hey hû, ‘Emê Gozê ye.

Hişyar bin, ew kojek e.

Li gorî zimanzanên kevnar, ev nêrîne hemû ji bo ravekirina rewşekê hatine bikaranîn, Austin van dîtinan wekî “Xeletîyên Danasînê” bi nav dike, ji ber ku hekvan mînakên bixine nava dewrober û jîngehê de û rewşan dîyar bikin. Li wî demî berevajî vê

yekê xwe yek ji van hevokan ji bo danasînê nayê bikaranîn, belku her yek ji van hevokan helgira peyamekê ye, bi vî awayî:

Pesin “Medih”.

Sivkatîpêkirin “Heqaretkirin”.

Hoşdarîkirin.

Ger em bi baldarî li mînakên jorîn binêrin her yek ji wan gelek wateyan dide. Lê wateya wan a eşkere ew e ku hemû hevokên ragihandinin û her yek ji wan bûyerekê vedibêje. Lê eger em behsa wateya wan a veşartî bikin, wê her yek ji wan di gelek rewşan de rola xwe bilîze. Ew jî bi hêz, şêwaz, melodî, derdor û jîngehê ve girêdayî ne.

Ger ew tiştên ku li jorî hatînin gotin li ser vê mînakê piraktîk bikin, dê mebesta Austin bi başî zelal bibe: Hetaveke xweş e.

Di vê hevoka ragihandinê de wesfa hetavê hatîye kirin, lê li gorî Austin tenê ji bo wesifkirinê nayê bikaranîn. Ev e ya ku jê re dibêjin “Xeletîya Wesfî”, çimkî guhdêr jî dizane ku ev wesfek e û tiştek veşartî tê de tune ye, lê gava ku vê hevokê têxine di nava derdorê de û li wateyên wê yên veşartî bigerin. Li wê demê tam dê bê dîtin ka mebesta Astin bi vê tewrîyê çî ye. Li dor vê yekê, ger em awaza hevoka jorîn biguherînin dê bibe hevoka pirsîyarî, anku her dema ku em peyva duyemîn dirêj bikin û biguvêşin ew dibe hevokek pirsîyarî: Hetaveke xweş e?

Herweha dibe bersiv ji bo pîrsekê, ger kesek rewşa hewayê bipirse, hûn dikarin bibêjin: Hetaveke xweş e.

Lê ger pile û asta kesekî bilind be û xwedan hêz be dikare vê hevokê bike hevokek feriz (Fermanî), Ev hemû formên hevokê ne.

Herweha dema ku vê hevokê bi rewşan re tevlihev bikin, hûn ê bibînin ku di gelek awayan de dikare were bikaranîn:

Dema ku zarok ji bavê xwe re dibêje “Hetaveke xweş e” ev wekî daxwaza çûna seyranê ye.

Herweha heke jinek ji mîrê xwe re bibêje ku “Hetaveke xweş e” dibe ku were pêşniyarkirin ku ew ji bo firavîne derkevin derve.

Ger kesek ji nexweşekê re bibêje ku “Hetaveke xweş e” tê şîretkirin ku derkeve derve, ku hewayê xwe biguherîne.

Herweha ger kesek deyindarê we be û bibêje ez ê havîne heqê we bidim. Ger havîne neda û hûn wî kesî bibînin, hûn dê bibêjin “Hetaveke xweş e” ew ji bo wateyên: hoşdarîkirin, tehdîdkirin, heqaret û silavkirinê jî tê bikaranîn, wekî ku li jorî hatî behiskirin. Ev hemû bi awaz û şewaza axaftinê ve girêdayî ye ka ji bo çi amancê ye, Herweha em dikarin wê di gelek rewşên din de bikar bînin.

Ger bi awayekî gelemperî behsa eva borî bikin, dê were dîtin ku her gotinek ne ji bo merema agahdarî û wesifkirinê ye. Belku dikarin wê bikine di şiklê pirs û fermanî de herweha ew di navxwe ya xwe de hilgira gelek kirde û kiryarên cûrbicûr e. Ev ew yek e ya ku Austin li ser xebitî û xwendekarê wî Searle û gelek zimanzanên din domandin û pêşde birin.

Austin bal kişand ser wê yekê ku her tiştê were gotin di navxweya xwe de bi sê kirdeyan xemilî ye:

1. Kirdeya Gotinê “Axaftinê”: Ev behsa wan tiştên ku tene gotin dike, anku wateya eşkere ye, ew jî wateya formî ya peyvan e.

2. Kirdeya Encamdanê “Kirinê”: Ev amaje bi nîyeta axêverê dike, anku ew kirdeya ku axêver divê ji guhdêrî re ragihîne ji bo ku guhdêr wê bike.

3. Kirdeya Karîgerîyê “Bandorê”: Ev kirde behsa wê rengvedana ku di guhdêran de çêdibe dike (Renkima, 2004: 22). Anku ev bi helwêstên guhdêran ve girêdayî ye. Ji ber vê yekê karîna axêver xuya dibe ka heta çi astê dikare bandorê li guhdêran bike, bi vê mînakê, ev sê kirdeyên jorîn dê zelal bibin:

Welat biparêze.

1. Kirdeya Gotinê “Axaftinê”: Di vê mînakê de behsa parastina welat dike.

2. Kirdeya Encamdanê “Kirinê”: Di vê mînakê de axêver radigihîne ku welat biparêzin, digel vê yekê jî daxwazê û fermanê li me dike ku em rabin welat biparêzin. Herweha vê mînakê kirdeyên hoşdarîkirin, amojgarîkirin û gefkirinê jî di hundurê xwe de parastine.

3. Kirdeya Karîgerîyê “Bandorê”: ev nîşan dide ku axaftin çiqasî bandor li guhdêran kirîye û çî karvedan di guhdêran de çêbûye.

Her guhertin an ramanek di tewrîya kirdeyên axaftinê de were dîtin, ger em lê vegerin em ê bibînin ku ew bi Austin dest pê kirîye, her di vî warî de Austin di tewrîya kirdeyên axaftinê de du cureyên karan ji hev veqetandin: Karê raperandin “rêveberî” û karê neraperandin “nerêveberî”.

1. Karê Raperandin: Ev hemû wan kiryarên ku axêver dibe sedem ku biqewimin dihevine, anku axaftin rasterast karekî dike (Tewfîq, 1995: 45), wekî van hevokan:

Ez sozê didim ku rastîyê bibêjim. “Kirdeya sozdanê”.

Ez sond dixwim ku li te biborim. “Kirdeya sondxwarinê”.

Ez spasîya te dikim. “Kirdeya spasîyê”.

Di van hevokan de li dema gotina wan rasterast karek dê bihête kirin.

Austin ji bo pêkanîna karê raperandinê çend şert danîn:

1. Divê lêker bibe kesê yekem, bi gelemperî yekem yekjimar.

2. Dema kirdeyê divê niha be, divê forma wê ya rêzimanî giştî be ne taybetî, herweha carinan jî dikarin forma wê ya rêzimanî ji dema neborî ji bo demeke din were guhertin, lê ji ber rewşa axaftinê yan jî têgeha giştî ya demê, hevok tê wateya niha:

Biryarê didim, êdî cixarê nakişînim.

Ev e min biryar da, êdî cixarê nakişînim.

Biryar be, êdî cixarê nakişînim.

Di van hevokan de sê formên rêzimanî yên ji hev cuda hene, lê têgeha wan ji ber rewşa hevokê dema niha nîşan dide.

3. Divê karekî raperandinê “rêvebirinê” jî hebe, divê ew bixwe rabe ji bo pêkanîna kirdeyekê, weke: Agahdarkirin, roxsetdan, fermanan... (‘Ebdula û Elî, 2011: 240-241).

Herweha li cem Austin karê raperandinê dibe du cur:

A. Karê Raperandîna Eşkere: Ji navê wê xuya ye, karekî raperandinê di hundirê wê de heye, wekî mînak:

Ez sond dixwim ku rastîyê bibêjim. “Karê Raperandinê, sondxwarin e”.

B. Karê Raperandîna Veşartî: Ji navê vê jî xuya ye, karekî raperandinê di hundirê wê de tune ye, belku bi rêya derdorê tê zanîn, wekî mînak:

Ajotina bi lez qedexe ye.

Di vê hevokê de karê raperandinê tune ye, lê bi rêya derdorê tê zanîn ku kirdeya agahdarkirinê ye.

2. Karê Neraperandin: Ev hemû karên din ji bilî karên raperandinê bi xwe ve digire, an jî her karê ku bi kêmanî mercê yekem ji karê raperandinê pêk nayîne, hemû karên raperandinê dibine karên raneperandinê, dema ku lêker an jî dema wê biguherin (Tewfîq, 1995: 46), wekî mînak:

Rêveberî biryar da sibe bêhinvedan e.

Di vê hevokê de karê raperandinê heye; ew jî “biryardan e” û karê hevokê dema neborî ye, anku şertên duyem û sêyem ji karê raperandinê di hundirê vê hevokê de hene, lê şertê yekem tune ye û lêker kesê yekem nîne kesê sêyem e, ji ber vê yekê ev hevok dibe hevoka neraperandinê.

1.1.1. Polînkirina Kirdeyên Axaftinê

Tewrîya kirdeyên axaftinê ji alîyê gelek zanayan ve gelek caran hatîye polînkirin. Yek ji wan polînkirinên berbelav, polînkirina sê alî ye:

1. Hevoka Ragihandin: Gotinên ku di hevokên ragihandinê de têne bikaranîn, ji bo reklam, daxuyanî, serlêdan, ragihandin û vegotina çîrokan têne bikaranîn.

2. Hevoka Pirsîyarî: Gotinên ku di hevokên pirsîyarî de têne bikaranîn, ji bo wê yekê ye ku axêver daxwaza bersivê ji guhdêrî bike, ku ew pirs li cem heye were bersivdan (Elî, 2004: 33). Dema ku axêver di hundirê gotara xwe de pirsan ji cemawerî dike, li benda bersivê namîne, Çimkî ji bo moralê wan bilind bike û di nav wan de bibe sedema karvedanê pirs pêşkêşî wan kir. Di dadgehê de jî dema pirsan pêşkêşî guhdêrî dike, li benda bersivê namîne. Çimkî ew van pirsan bi amanca înkâr û tesbîtîkirinê dipirse.

3. Hevoka Fermanî: Peyvên ku di hevokên fermanî de têne bikaranîn daxwaza axêverî ji bo kirina tiştêkî di pêşerojê de nîşan didin. Ev hevok dibe ji bo daxwazkirin û derkirina biryar û nêrînan be. Hevokên fermankirinê du cur in:

A. Fermankirina Eşkere: Ev ji bo kesê duyemê yek jimar û pir jimar tê bi karanîn, anku kesê beramberî te, wekî: Here, herin.

B. Fermankirina Veşartî: Ev ji bo hemû kesan tê bi karanîn (Elî, 2012: 88).

1.1.1.1. Polînkirina Austin ji bo Kirdeyên Axaftinê

Tewrîya Austin wê yekê pêşanî me dike, her gotineke hebe ji bo pêkanîna karekî tê pêşkeşkirin. Ev tewrî ye dibêje ziman xala tîkelîyê ye di nava civakê de û ev zimane di yek gotinê de, ku xwedan yek forme, kiryarên ji hev cuda pêk tîne. Her dema axêver axift gelek kiryanan pêk tîne. Austin pergalek ji bo kirdeya axaftinê durist kir û ev kirde dabeşî pênc koman kir (Tewfîq, 1995: 53).

Austin bi vî awayî kirde dabeş kirine:

1. Kirdeya Hikumdanê (Verdictive Act): Ew kirdeyên ku desthilatdarîyê pêşan didin. Ev kirde ji berhemê desthilatdarîya dadperweran xuya dibe. Kirdeyên vê polînê: Biryara dadgehê, cezadanî, helsengandin, pile danîn...hwd .

2. Kirdeya Biryardanê (Exercitives Act): Ew kiryarên ku biryardanê nîşan didin. Ev biryar ji alîyê desthilat, yasa û hêzekê ve têne derkirin. Kirdeyên vê polînê: Fermanan, dûrîkirin ji karî, bêpişkkirin, qewirandin, qedexekirin, bervanîkirin, hoşdarîkirin, destûrdan...hwd .

3. Duristkirina Peymanan (Commissives): Ew kiryarên ku peymandanê nîşan didin, ew kirdeyên taybet in, bi razîkirina kesekî, ku sozê bide wê rabe bi pêkanîna karekî digel kesê beramber. Kirdeyên vî curey: Jivan, sondxwarin, sozdan, girintî, gefkirin, hoşdarîkirin, lihevanîn, derkirin, danpêdan, peymandan, pesendkirin, qayîlbûn, agahdarkirin...hwd (Austin, 1962: 148-149).

4. Kirdeya Rewiştî (Behabitives Act): Ew kiryarên ku rewîştê xwezaya mirov nîşan didin. Ev kirde girêdayî ye bi rewîştê ve û têkelî heye bi reftara civakî, dab û nerît, tîtal û karvedanên me beramber kesên din, kirdeyên vê polînê: Lêborîn xwestin, pîrozbahîkirin, spasîkirin, silavdan, serexweşîkirin, seredankirin, şîn û tazî ...hwd .

5. Kirdeya Berçavkirinê (Expositive Act): Ew kiryarên ku zelalbûnê nîşan didin. Ev kirde radibin bi zelalkirina nêrînan û pêkanîna civînan, kirdeyên vê polînê: Nîqaş, dan û stendin, nîşandan, teslîmkirin, pêşnîyar, komkirin, derencam...hwd (‘ezîz, 2009: 325).

Ûstin kirdeyên axaftinê li ser pênc cureyan polîn kirine, di derheqê vê kirdeyê de gotîye: Ev kirde ji bo amanc û meremê tene pêkanîn, ji ber vê yekê hemû gotin xwedan bandor in û millet bê merem çî gotinan nabêjin.

1.1.1.2. Polînkirina Searle ji bo Kirdeyên Axaftinê

Bi nêrîna Searle dema ku axêver diaxive, ew bi rastî tişteke radigihîne, vêca çî ew biryarek, fermanek, sozek be yan her tiştekî din be. Ev tiştê ku tê axaftin ne hewce ye ku eşkere be, çimkî li ser asta têgehiştina wergir dimîne, ka heta çî astê karvedan li cem wergirî duristkirîye. Searle destnîşan dike ku her axaftineke bihête kirin, em bi serfirazî digihîjin ramana bingeîn a li pişt wê. Digel vê yekê jî têkilîya di navbera şiklê axaftinê, wate û amanca axaftinê de her dem ne eşkere ye, belku divê em vê axaftinê bi hawirdorê re tevlihev bikin da ku bigihîjin wateya veşartî (Searl, 1975: 72).

Di lêkolîna Searle de li ser tewrîya kirdeyên axaftinê ya taybet bi Austin ve, Austin digot her axaftineke ku bihête kirin sê kirdeyan di hundirê xwe de dihevine: Kirdeya axaftinê, kirdeya kirinê û kirdeya bandorkirinê, Searle kirdeya kirinê ya rasteqîn red kir û li şûna wê kirdeya pêşnîyarkirinê pêşnîyar kir, ev kirde naverok û peyama axaftinê dihevine, anku xuya dibe axêver sê kiryaran dike:

1. Kirdeya Gotinê (Utterance Act): Peyvan û hevokan bi kar tîne û guh nade wateya rasteqîn.

2. Kirdeya Pêşnîyar (Propositional Act): Bikaranîna zimanî ji bo amajedan bi pêşnîyaran, di sînore rewşan de.

3. Hêza Kirinê (Illocutionary Force): Merema axêverî ye ji bo kirina kirdeyekê, wekî kirdeya gefkirin, kirdeya fermankirin, kirdeya hoşdarîkirin...hwd (Silêman, 2021: 24-25).

Searle gelek xizmet bo pêşxistina vê tewrîyê kirîye. Ev xizmeta Sîrêlî dibe rastvekirin û zêdekirineka kesî li dor tewrîya kirdeyên axaftinê, herweha rabû bi zelalkirina cudahîyê di navbera kirdeya axaftinê ya rasterast û kirdeya axaftinê ya nerasterast de (Searle, 1974: 92). Bi gelemperî Sîrêlî kirdeyên axaftinê li ser pênc cureyan polîn kirin:

1. Kirdeya Sazkirinê (Assertive Act): Ev kirde guhdêrî mecbûr dike bi rastîya pêşnîyar û babetên hatîne pêşnîyar kirin, wekî van kirdeyan: Tekîdkirin, redkirin, agahdarkirin, şanazîkirin, neqayîlbûn, devjêberdan, pêşnîyarkirin, nêrîn, zelalkirin, rûdan...hwd .

2. Kirdeya Fermankirinê (Dilective Act): Ev kirde guhdêrî mecbûr dike kiryarekê ji bo berjewendîya axêverî pêk bîne, wekî van kirdeyan: Xwestin, pîrskirin, belavkirin, fermankirin, amojgarîkirin, şîretkirin, agahdarkirin, hêvî, lêbûrîn, te'îmatdan...hwd (Silêman, 2021: 26).

3. Kirdeya Pêgîrkinê (Commissive Act): Amanca vê kirdeyê ew e nabe were bînpêkirin anku divê bêne cîbicîkirin. Çimkî guhdêr mecbûr e di pêşerojê de tiştê bike, wekî van kirdeyan: Sozdan, sondxwarin, tirsandin, hoşdarîkirin, gefkirin, peymandan...hwd.

4. Kirdeya Hestderbirînê (Expressives Act): Ev kirde rewşek psîkolojîk a taybetî dîyar dike, ku şert û mercên dilsozîyê dihevwîne, wekî van kirdeyan: Spasîkirin, pîrozbahîkirin, pêşwazîkirin, lêbûrîn xwestin...hwd.

5. Kirdeya Ragihandinê (Declaratives): Ev kirde wan nêrînan di hewîne yê ku li dema gotina wan guherîn û bandorên mezin têne pêkanîn, li vir kirdeya serkeftî ewe ya fikir û dûrhêlê bi hev ve girê dide, wekî van kirdeyan: Agahdarkirin, sozdan, ragihandina şerî, marekirin heramkirin, berîkirin... hwd (‘Ebdula & ‘Elî, 2011: 243).

Gelek dabeşkirin û polînkirinên curbicur bo kirdeyên axaftinê hatine kirin, lê polînkirina Austin û Searle ji hemîyan berbelavtir û cihgirtir bûn, digel vê çendê jî polînkirina van her du zanayan kêmasî jî têda hebûn. Polînkirina kirdeyên axaftinê karekî bi zehmet e, çimkî kirdeyên axaftinê gelek berfireh in û têkelî hemû zanistan bûne û hemû axaftin di çine di bin van kirdeyan de. Ev polînkirine dema têne wergeran bo zimanên ji hev cuda wateya wan tê guherîn û ramana xwe ya timam nadin.

1.1.2. Cureyên Kirdeyên Axaftinê

Yek ji pîrsgirêkên tewrîya kirdeyên axaftinê cudakirin, naskirin û tesnîfkirina cureyên kirdeyan e. Eger hûn lîsteyek lêkerên ku xwedan wateyeke cuda ji wateya forma wan ya axaftinê çêkin, dê ji sed cureyên lêkeran zêdetir durist bin (Tewfîq, 1995, 53). Tewrîya kirdeyên axaftinê bi gelek formên ji hev cuda hatîne dabeşkirin, her yekî li gor nêrîn û zanîna xwe dabeş kirîye, lê bi gelemperî dibe du cur.

1. Kirdeya Axaftinê ya Rasterast

Di kirdeya axaftina rasterast de mebesta axêverî bi rêya forma hevokê bi zelalî tê xuyakirin, çimkî axêver formeke rêzimanî bi kar tîne û nîyeta axêver bi wê gotinê derdikeve holê (Me‘rûf, 2000: 83). Bi vê wateyê bi her awayekî hebe divê ramana van kirdeyan yan zelal be, wekî bikaranîna nîşaneke fermanî di hevokê fermanî de yan lêkerê di destpêka hevoka agehdarkirinê de divê bihête bikaranîn an peyva pirsîyarî di destpêka hevoka pirsîyarî de bikar bîne.

Di vî cureyî de nîyeta axêver eşkere ye û rasterast digihîje guhdêr, rengvedana wê li cem guhdêrî xuya dibe. Çimkî di hevoka ragihandinê de kirdeya ragihandinê tê bikaranîn. Di hevokên pirsîyarîyê de peyvên pirsê têne bikaranîn. Di hevokên fermanî de jî nîşanên fermanî têne bikaranîn, ev çende di hêla ku guhdêr rasterast nîyeta axêver fam bike, wekî mînakên jêrîn:

Serbest hat. Hevoka Ragihandinê.

Xwarinê bixwe. Hevoka Fermanî.

Kî serkeft? Hevoka Pirsê.

Di van hevokan de xuya dibe ku kirdeya rasterast a axaftinê ew e ku axaftin bi rengê bihê bikaranîn ku li gorî fonksiyona hevokê be.

2. Kirdeya Axaftinê ya Nerasterast

Di kirdeyên axaftina nerasterast de nîyeta axêver bi rêya formê axaftinê bi eşkere nayê xuyakirin. Çimkî axêver xwedîyê amanceke veşartî ye, mebista axêver bi rêya melodîyê. Anku awayê axaftinê û bi rêya hawirdorê xuya dibe, vêca çî ew hevok ragihandin be an pirsê be an fermanek be, wekî van mînakên li jêrîn:

Azad hê bê kar e. Hevoka Ragihandinê ye.

Ev mînak di koka xwe de ragihandin e, lê gelek wateyên din jî hene, wekî: Gazinde, nerazîbûn, hoşdarîkirin, gefkirin..., her dema melodîya gotinê hat guherîn an rewşê taybet di navbera axêver û guhdêr de hebe, wateya hevokê jî ragihandinê derbasî wateyeka din dibe.

Kengî Azad hat? Hevoka Pirsê ye.

Ev mînak jî di koka xwe de pirs e, lê wateyên: Sersorman, gefkirin, tirsandin..., di hundirê xwe de dihevwîne, dema tîkelî hawirdorê bû van wateyan jî eşkere dike.

Sêvê bixwe. Hevoka Fermanê ye.

Ev mînak jî di koka xwe de ferman e, lê wateyên: Sersorman, gefkirin, tirsandin, agahdarkirin, hoşdarîkirin, şîretkirin..., di hundirê xwe de dihevwîne, dema tîkelî hawirdorê bû van wateyan jî eşkere dike.

Di derbarê kirdeyên axaftinê yê nerasterast de em hemû dikarin bi rêya muzîk û hawirdorê, heman hevbendîyê jî bo gelek amancan bikar bînin, anku yek hevok gelek kiryanan radigihîne, wekî vê hevokê: Garey Sîpan girt.

Ev hevok di koka xwe de ragihandin e, lê gelek wateyên din jî hene, wekî: Gazinde, nerazîbûn, hoşdarîkirin, gefkirin, şîret, xweşgotin...hwd. Her dema melodîya gotinê hat guherîn, an rewşeke taybet di navbera axêver û guhdêrî de hebû, an vê hevokê têkelî hawirdorê bikin, dê wateya hevokê ji ragihandinê derbasî wateyên din bibe.

1.2. Kirdeya Hoşdarîkirinê

1.2.1. Zarava Hoşdarîkirinê di Ferhengan de

Di zimanê kurdî de peyva hoşdarîkirinê bi gelek awayan hatîye şirovekirin, her ferhengek li gorî nêrîn û peymanên civakî zarava hoşdarîkirinê rave dike. Di piranîya ferhengên kurdî de zaravê hoşdarîkirinê bi zaravaê hişyarkirinê re tevlihev kirine. Lê ger em ji nêz ve li vê yekê binêrin dîyar dibe ku yek ji erkên kirdeya hoşdarîkirinê hişyarkirin e. Ev yek jî delîl e ku piranîya kirdeyên axaftinê di nava kirdeya hoşdarîkirinê de hatine razandin, hin ji wan ferhengan wê li jêr werin nîqaşkirin:

A. Di *Ferhenga Xal* de peyva hoşdarîkirinê bi vî awayî hatîye şirovekirin, hoşdarîkirin: Ragihandin û eşkerekirina rastîyan e, herweha bi karê şîret û rênişandanê jî radibe, peyvên hişyarkirin, hişyarbûn û hişmend bûn bi kirdeya hoşdarîkirinê re tevlihev kirin e (Xal, 2017: 625). Li gorî *Ferhenga Xal* hoşdarîkirin ji bo rasterêkirina jîyana mirovan tê bikaranîn da ku hişmend bin û haya wan ji jîyanê hebe û nekevin di nava tengasîyan de.

B. Di *Ferhenga Kurdistan* de peyva hoşdarîkirinê bi vî awayî hatîye şirovekirin, hoşdarîkirin: Bîranîn, hişmendkirin, sererastkirin, ev peyve li hember peyva hoşdarîkirinê bi kar anîne (Mokrîyanî, 2017: 1336). Li gorî vê ferhengê hoşdarîkirin tê wateya hişyarkirin û şîretkirina mirovan û herweha bibîranîna xeletîyan û hoşdarîkirina mirovan ji bo berdewamkirina rêwîtiya jîyanê.

C. Di *Ferhenga Estêre Geşe* de peyva hoşdarîkirinê bi gelek wateyên cuda hatîye ramandin, hoşdarîkirin: Bi wateya ragihandin, hişyarkirin, handan, teşwîqkirin û arastekirinê hatîye xuyakirin, digel vê yekê jî peyvên hoşdarî, hişyarbûn, hişyarkirin û hişmendkirin anîne ziman, anku hevraman in ji bo hoşdarîkirinê (Nîzamedîn, 2003: 551).

Li gorî vê ferhengê têgeha hoşdarîkirinê hîn bêhtir hatîye dewlemendkirin û çarçoveya vê têgehê berfireh bûye û gelek fikrên giring di nav xwe de digire.

Têgeha hoşdarîkirinê gelek wateyên cude dihevine, ev yek jî dewlemendîya vê kirdeya axaftinê nîşan dide û ji ber dewlemendîya vê kirdeyê hîn jî guman heye û negihîştîye tu tu wateyek yekgirtî, wateya hoşdarîkirinê bi hawirdora ku lê diqewime ve girêdayî ye û ji hêla her wergirî ve bi rengekî cuda tê şirovekirin, hoşdarîkirin berhema çalakîyên wekî rêberî, razîbûn, şîret û girêdana wê bi komeka karên cuda û curbicur yên ku ji hêla amûrên civakî ve tene piştgirîkirin.

Hoşdarîkirin peyveke giştî ye û piranîya kirdeyên axaftinê tê de razayî ne û nêzîkî peyvên şîret, hişyarî, gef, îqnakirin û rênîşandanê ye, ev hemû bi hev re metirsîyek rast an potansîyel dîyar dîkin, di encama van gotinan de li ser vê kirdeyê ev peyvên jêrîn li dor vê kirdeyê derketin holê:

Hoşdarîkirin:	Têgeha giştî ya vê çalakîyê ye.
Hoşdarker:	Kesê ku vê çalakîyê pêşkêş dike.
Hoşdarkirî:	Kesê ku ev çalakî ji bo wî tê pêşkêşkirin.
Hoşdarî:	Peyama vê çalakîyê ye.

Di Zimanê Erebî de wekî hemû zimanên cihanê ji bo peyva hoşdarîkirinê gelek peyvên bikaranîn û gelek wate jî hene, lê peyva “tehzîr” ji aliyê form û wateyê ve li hember peyva hoşdarîkirinê tê. Gelek peyvên din jî hene ku di erebî de şûna peyva hoşdarîkirinê tê bikaranîn, wekî di van ferhengan de:

A. Di *Ferhenga Estêre Geşe* de li hember peyva hoşdarîkirinê tehzîr hatîye bikaranîn, digel vê yekê jî peyvên: Teyeqquz, intûbah, îqaz û tenbîye her ji bo vê ramanê tên (Nîzamedîn, 2003: 551). Ev gotin tev li dora yek amancê dizivirin, ew jî hoşdarîkirin û şîretkirina mirovan e da ku bûyerek çênebe.

B. Di *Ferhenga Qazî* de li hember peyva hoşdarîkirinê peyvên: Înzar û tehzîrê hatine bikaranîn (Qazî, 2005: 209).

C. Di *Ferhenga Sipîrêz* de peyvên: Tehzîr, hezir, hezirhim, mehzor û înzar li hember peyva hoşdarîkirinê hatine bikaranîn (Duskî, 2009: 455).

Di Zimanê Îngilîzî de peyva (Warning) li şûna peyva hoşdarîkirinê tê bikaranîn, ku bi eslê xwe ji peyva “Warn” hatiye wergirtin. Destpêka vê peyvê ji bo peyva îngilîzî ya kevin “Warnian” dizivire, ev tê wê wateyê dema ku rêberîyê ji bo mirovan dikin, eşkere ye ku kirdeya hoşdarîkirinê bi gelemperî ji bo karê baş tê bikaranîn.

1.2.2. Destpêkek ji bo Kirdeya Hoşdarîkirinê di Zimanî de

Hoşdarîkirin kirdeyeke axaftinê ye, wekî yek ji şêwazên zimanî û amanceke giring a pragmatîk tê dîtin. Axêver hewl dide ku guhdêrî li ser tiştên ku jê re hatine pêşkêşkirin hoşdar bike, axêver radibe bi arastekirina guhdêrî bi kirin an nekirina karekî. Hoşdarîkirin wekî şîreteke ye, ku heke mirov wê bike, dê bihêr parastin wekî din dê zîrê bibîne. Ev yek dimîne li gorî wê rewşa ku nameya hoşdarîkirinê tê de tê pêşkêşkirin, wekî van hevokên jêrîn:

Hişyar be otombêlê bi lez neajo.

Ez te hoşdar dikim, ku divê otombêlê bi lez neajoyî.

Ger ev her du hevok bi hawirdorê re werin tevlihev kirin û bi dengê rast werin gotin, ew ê were wê wateyê gava ku otomobêl bi lez were ajotin dê qezayek xirab çêbibe.

Hoşdarîkirin di hundirê xwe de wateyên daxwazî û fermanî hildigir e. Axêver daxwazek an jî fermanekê ji guhdêran re dike ku pêşî li kiryarên xirab bigirin, pêdivî ye ku hoşdarîkirinê naverokeka pêşnîyarkirî ya baş hebe da ku morala guhdêran zêde bike û bandorê li xebata wan ya paşerojê bike, wekî hevoka jêrîn:

Ez te hoşdar dikim ku dev ji cixare kişanê berdî.

Ji aliyê pragmatîkê ve ev hevok xwedî wateyeke pir xirab e. Nîşan dide ku kişandina cixareyê pir xirab e û ger neyê rawestandîna dê zîrê bide tenduristîya guhdêr û dê bibe metirsî li ser jîyana wî (Searle, 1975: 71; Parker & Rieley, 2005: 21). Li vir dîyar dibe ku piranîya kirdeyên axaftinê dibine erkên kirdeya hoşdarîkirinê û amanca wê ya sereke şîretkirin û rastkirina jîyanê ye, ji bo parastina guhdêran ji bûyer û belayan.

Bi nêrîna Rakman Save hoşdarîkirin şîretek e, ji bo kirin an nekirina tiştekî tê dayîn. Hişyarkirina guhdêrî ye li pêşîyê, li ser xetera kirina tiştekî nebaş dide, ku ev yek li dij xwestekên guhdêran be, da ku guhdêr ji van kiryanan dûr bisekine (Silêman, 2021: 75). Axêver dema ku bizane rewşa guhdêrî ne baş e, peyama xwe pêşkêşî guhdêran dike. Lewra ger guhdêr guh nede axêver, dê kêşeyên guhdêrî çêbibin, li vir em dikarin bibêjin ku amanca vê wekî gefkirinê ye, da ku guhdêrî bitirsînin, lê cudahiya wê ew e ku tehdîd di berjewendîya axêverî de ye û hoşdarîkirin di berjewendîya guhdêran de ye. Gelek çalakî hene ku dibe ku hoşdarîkirin yek an çend ji van çalakîyan di nav xwe de bihewînin, lê ne merc e ku hemûyan bihewîne, ew çalakî wek: Ragihandin, axaftin, şêwirmendî û her tiştê din bi vî rengî. Herweha Searle qebûl dike ku peyva hoşdarîkirinê ya nêzîke ji bo peyvên din ên wekî şîret, agahdarî, hişyarî...hwd, û dibêje hoşdarîkirin têgehek giştî ye, ku derbirinê ji xeterek rastîn an potansîyel îfade dike (Elî, 2020: 235).

Ji tiştê ku me berê niha behiskirî, ji me re eşkere bû ku hoşdarîkirin li gorî awayê pêşkêşkirin û dariştinê, herweha çawanî ya şirovekirina wê ji hêla hawirdorê ve dikare zêdetir ji yek rehendê watedar û bi bandor bi xwe ve bigire, wekî hevokên jêrîn:

Ez te hoşdar dikim xwe dûr bikî ji agir.

Ez te agahdar dikim ku agir xeternak e.

Axêver di van her du hevokan de hoşdarîyê dide guhdêran ku pirsgerêkek heye ku divê were çaraserkirin, lê bi rengekî din, di hevoka yekem de dibêje xwe ji agir dûr bigire û di hevoka duyemîn de jî bi eşkere dibêje ku agir xeternak e, digel vê yekê jî peyva agir bi wateya: Şer, fitne, nexweşî...tê zanîn.

1.2.3. Pênaseyên Kirdeya Hoşdarîkirinê

Zana û zimanzanan kirdeya hoşdarîkirinê bi çend awayên ji hev cuda pênase kirine, bi vî awayê li jêrîn:

1. Zimanzanê Amrîkî Hinkle derbarê hoşdarîkirinê de dibêje: Hoşdarîkirin ew prosesa ye ku tê de axêver peyamekê ji guhdêr re dişîne û hoşdarîyê dide ku tiştekî bike yan neke, çimkî ew di berjewendîya guhdêran de ye (Hinkle, 1997: 5).

2. Hoşdarîkirin radibe da ku guhdêrî bitirsîne, ji bo nekeve tengasîyê tê bikaranîn. Li vir ev tirsandin di berjewendîya guhdêran de ye, bi vî awayî kirdeya hoşdarîkirinê dibe rêberek civakî (Îbn Menzûr, 1999: 92). Li gorî vê pênaseyê, di kirdeya hoşdarîkirinê de axêver ji bo baştirkirina jîyana kesên derdora xwe dixebite.

3. Lito û Miler dibêjin: Hoşdarîkirin piştgirîyek êşkere ye ku hoşyarîyê dide bikarhêner ku amade be ji ber ku xeterek heye û ev xeterî hewce dike ku guhdêrî gelek zanîn li ser hebe (Elî & Koçer, 2021: 28).

4. Kirdeya hoşdarîkirinê wekî kirdeyeke rênîşanderîyê tê hesibandin, çimkî ew guhdêrî neçar dike ku guhdarîya tiştên ku tê kirin bike û bandora vê yekê li ser guhdêr xuya dike û tiştê ku jê tê xwestin dike, ev yek jî piştgermê zanyarîyên pragmatîkê ye (‘Ezîz, 2014: 58).

5. Pispor di kirdeya hoşdarîkirinê de li şûna ravekirinên dirêj û bêwate yên rewşekê, nameyên kurt û watedar bikar tînin, amanc ew e ku guhdêr rabe bi kirina tiştê ku ji alîyê axêver ve tê pêşkêşkirin (Pambudai, 2017: 22).

6. Solomon dibêje: Hoşdarîya rast û bi bandor ew e ku kurt û watedar be û du wate nebe, yek wate û yek peyamek jî kurtirîn ferman bide (Solomon, 1995: 9). Di vê wateyê de dema ku axêver bi karê hoşdarîkirinê re mijûl dibe, hewl dide ku axaftina xwe pir kurt bike û peyama xwe bi awayekî herî kurt pêşkêş bike.

Hemû van pênaseyan nîşanî me da ku kirdeya hoşdarîkirinê giringtirîn kirdeya pragmatîkê ye û formek zimanî ya giring e, hoşdarîkirin axaftinek bi amanc e ku peyamek hildigire, axêver hewl dide ku vê peyamê kurt û bi bandor bike, ji ber ku ger guhdêr vê peyamê wernegire û nekeve bin bandora vê peyamê dê bikeve nav pirsgerêk û aloziyan, ev ne tenê di ziman de di jîyana rojane de jî giringî û nirxa xwe heye.

1.2.4. Zimanê Hoşdarîkirinê

Hoşdarîkirin bîyaveke zimanî ye û amanceke giring a pragmatîk e. Axêver hewl dide ku guhdêran hişmend bike, ku ji her bûyer û pirsgerêkê re amade be. Ev pêvajoya di berjewendîya guhdêran de ye. Axêver bi rola çavdêr û rênîşanderî radibe, ji ber vê yekê

ziman û rêbaza pêşkêşkirina kirdeya hoşdarîkirinê pir giring e, ger bi zanistî neyê arestekirin, peyama hoşdarîyê ya rast nagihîje guhdêran.

Axêver berî ku peyama xwe ji guhdêran re bişîne, divê li ser awayê bikaranîna ziman bifikire, çimkî zimanê ku di kirdeya hoşdarîkirinê de tê bikaranîn pir giring e. Em dikarin bibêjin ku giringîya ziman li hember naveroka wê peyama di hundirê nameya hoşdarîyê de tê pêşkêşkirin. Guhdêr berî bikeve di bin bandora peyama hoşdarîkirinê de dikeve bin şewaz û zimanê ku di nameya hoşdarîkirinê de tê bikaranîn. Derbarê zimanê hoşdarîkirinê da divê axêver ji bo gihandina peyamê bi zimanê xwe haydar bin. Çimkî kesê ku bi îngilîzî diaxive nikare peyamên hoşdarîkirinê yên bi zimanê Almanî bixwîne û fam bike, ji ber vê yekê divê di peyamên hoşdarîkirinê de, ji yek zimanî zêdetir were bikaranîn, Galter û Lionerdu me li ser pirsgerêka pîrzimanîyê hişyar dikin. Yek ji çaraserîyên pirsgerêka pîrzimanî, karanîna dîzayna pilêtan, ku dê li gorî rêjeya niştacîyan were dabeşkirin, heke 70% Îngilîzî, 15% Spanî û 15% mayî zimanên curbicur in, li wê demê pişka şêr wê bi Îngilîzî be, tê wateya ku pîranîya nameya hoşdarîkirinê divê bi Îngilîzî be û paşê bi zimanê spanî pilanê nîşan bide (Elî & Koçer, 2021: 25).

Rêyek din a giring a fêmkirina peyamên hoşdarîyê bikaranîna wêneyan e, divê ew wêneyê were bikaranîn hilgirê hizra gelemperî be. Peyamên hoşdarîya taybet asta razîbûn û têgihîştina xetereyê berhemtîne, gava ku peyama wan bandorê li temaşvanan bike dê bigihîje amanca xwe. Ji bo ku guhdêr ji nameya hoşdarîkirinê bandor bibe, divê peyam zelal û taybetî be. Ji ber vê yekê peyamên taybetî astek bilindtir bawerîya hoşdarîkirinê derdixîne û xetereyên ku têne dîtin, ji ber vê yekê xetereya kesane bi bawerîya bi hoşdarîyê ve girêdayî ye, heke wesa be dê amanca hoşdarîyê bigihîje û dê bandorê li guhdêran bike (Thomas, 2012: 74). Ger name kurt be û wateya wê zelal be, anku name hilgira aborîyê be, wê demê encam wê baş be û bandorê li guhdêran bike. Ger nameyên hoşdarîkirinê ne zelal bin û xwedî wateyek veşartî bin, wergir dê xwe bi xetereyê nebîne û dê bifikire ku name ji wî re nehatîye şandin û ew ji xetereyê derketîye (Perry, 1981: 153).

Li gor van tiştên li jor em dikarin ji bo zimanê hoşdarîkirinê hin taybetmendîyan dîyar bikin:

1. Zimanê hoşdarîkirinê aborîkirinê dihewîne, anku di nava xwe de kurtbirîyê bi kar tîne.

2. Zimanê hoşdarîkirinê zelal e.

3. Zimanê hoşdarîkirinê gelemperî ye, anku pirzimanî ye.

4. Zimanê hoşdarîkirinê yek hizrê hildigire.

5. Zimanê hoşdarîkirinê amancdar e.

6. Zimanê hoşdarîkirinê arastedar e.

1.2.5. Qadên Kirdeya Hoşdarîkirinê

Hoşdarîkirin di ziman de bi giştî karekî berfireh e û di jîyana civakî de xwedî roleke taybet e, ji bo rêvekirina pêvajoya jîyanê tê bikaranîn da ku tu pirsgerêk û zehmetî dernekevin. Ji ber vê sînore berfireh ev kirde xwedî qadeke taybet e, ev qad ji çar beşan ku vê çalakîyê çêdikin pêk tê.

1. Axêver “Hoşdarker”: Ev kes bi şandina nameyên hoşdarîkirinê ji komek mirovan re an jî ji civakekê re radibe, ku haya wan jê hebe û nekevîne tengasîyê de axêver ji hêla hejmarê ve yek e, lê nameya hoşdarîkirinê dibe ku hilgirê fikir û ramanên komek mirovan be. Di kirdeya hoşdarîkirinê de kesê ku nameyên hoşdarîkirinê pêşkêş dike, divê xwedî ezmûn be û bizane ku meriv çawa bi hişê mirovan re mijûl dibe.

2. Guhdêr “Hoşdarkirî”: Kirdeya hoşdarîkirinê xwedî cihekî giring e û di gelek waran de xizmeta mirovahîyê kirîye. Ji ber vê yekê dema ku axêver nameyeke hoşdarîyê pêşkêşî kesekî an komek kesan dike, kesên ku ev name ji wan re tê pêşkêşkirin dibêjine guhdêr, guhdêr ew kese yê axêver rênîşanderîyê ji bo dike, da di jîyana xwe de ji her xeletî û pirsgerêkan dûr bikevin, dibe ku guhdêr yek an jî çend kes bin.

3. Mijar “Hoşdarî”: Mijara an jî têkilîya di navbera axêver û guhdêran de bi nameyên hoşdarîyê an jî hoşdarî tê navkirin. Ev mijar ramanên axêverî ne, ev mijar bi xwe re gelek peyamên ji hev cuda li xwe digirin, hemû ji bo xizmeta guhdêran tene bikaranîn da ku ew ji hemû nexweşî û belayan werin parastin.

4. Jîngeh “Hawirdor”: Axêver di derbarê civak û hawirdora guhdêran de xwedî agahdarî ye. Lewra dema ku nameyeke hoşdarîyê pêşkêş dike, ji bilî ramana rasterast di vê nameyê de gelek mijar û ramanên din jî hene, ku guhdêr wateya rast a nameya hoşdarîkirinê fam bike û bigihe zanîna nîyeta axêver divê ew bi hawirdorê re tevlihev bike, ku nîyeta axêverê fam fam bike, jîngeh ew jîngeh e ku hemû tiştên nezimanî di hundirê wê de hene, lê di kirdeya hoşdarîkirinê de li ser hawirdora di navbera axêver û guhdêran de diaxivin.

1.2.6. Kar û Karvedan di Kirdeya Hoşdarîkirinê de

Derbarê bandorkirina li ser guhdêr yek ji amancên herî mezin ên kirdeya hoşdarîkirinê ye. Ji ber vê yekê ew hewl dide bi hemû rê û rêbazan wergir fêr bike, ku nameyên hoşdarîyê bi zanebûn pêşkêş bike. Ji ber vê yekê kirdeya hoşdarîkirinê di sê qonaxên sereke re derbas dibe, hemû jî dixebitin da ku bandorê li guhdêran bikin.

1. Qonaxa Pêşkêşkirinê: Zimanê hoşdarîkirinê xwedî amanceke kêrhatî ye, çalakîyeke radibe bi rênişandanê, ji bo pêkanîna vê kiryarê axêver hewl dide bandorê li guhdêran bike, ev qonax di xwe de du karên sereke dihevwîne, agahdarkirin û razîkirin, amanc bilindkirina hişmendîya kesane, dema nameyek tê şandin, divê axêver di bandorkirina li ser wergir de jêhatî be û bi aqilmendî peyamê bigihîne guhdêran.

2. Qonaxa Pêşwazîkirinê: Ev qonax piştî pêşkêşkirina hoşdarîkirinê tê û wekî qonaxa biryardanê tê naskirin. Ev qonax du karên sereke hene, ew jî razîbûn û nerazîbûn e. Amanca vê qonaxê ew e ku guhdêrî qaniq bike, da ku bi aqilmendî guh bide vê peyamê, ku ew nekeve di nav bela û nexweşîyan de. Di vê qonaxê de divê axêver bi aqilane bixebite, da ku bandorê li guhdêran bike.

3. Qonaxa Karvedanê: Ev qonaxa dawîn a hoşdarîkirinê ye. Di vê qonaxê de tiştên ku axêver pêşkêşî guhdêran kirîye û ya ku guhdêrî wergirtî, geştiye encaman û jîyana guhdêran bi rêve dibe. Anku guherîn li wî kirîye, çimkî ev çalakî hemû ji bo berjewendîya guhdêran tê kirin.

1.2.7. Giringî û Feydeyên Hoşdarîkirinê

Ziman bi giştî di jîyana mirovan de pir giring e. Çimkî bi ziman re têkilî di navbera mirov û civakan de çêdibe, yanî bi ziman gel û civak bi hev re dikevin têkilîyê û kar û barên xwe arasteyî hev dikin, ev jî ji bo mirovahîyê sûdmend e. Kirdeya hoşdarîkirinê di pragmatîkê de roleke giring dilîze û xwedîyê amanceke zimanî ya eşkere ye. Ev kirde di hemû warên jîyanê de giring û bikêr e, çî di warê perwerdeyê, civakî, hiqûqê, olî, bazirganî û di hemû warên din de di vî warî de hoşdarîkirinê di hemû qadên jîyana me ya rojane de giring e. Hoşdarîkirin di esasê xwe de ji bo ku jîyana mirovan xweştir bibe û rê li wan bigire ku nekevin tengasîyê.

Hoşdarîkirin karê şewirdariyê ye û peyama wê gelek amanc û kirdeyên bikêrhatî hildigire, wek: Şîret, hişyarî, rênîşandan, pêşniyar, qedexe, gilî...hwd, em dikarin bibêjin ku giringîya hoşdarîkirinê di wê yekê de ye, ew kes an alîyê ku dest bi kirdeya hoşdarîkirinê dike, tu feydeya wê tune ye, lê her tişt di berjewendîya wan kesan de ye, ku ev kirde ji bo wan tê pêşkêşkirin. Ger em li hoşdarîkirinê di warê malbatê de binêrin, dê û bav hoşdarîyê didin zarokên xwe ku nekevin pîrsgirêkan, ger zarok guh bidin dê û bavên xwe dê pêşerojek geş hebe. Herweha ger mirov li qada perwerdeyê binêrin, her hoşdarîyeke hikûmet û rêveberîya perwerdeyê ya ji bo xwendekaran pêşkêş dike, di berjewendîya xwendekaran de ye û dê jê sûd wergirin. Ji ber wê jî di hemû waran de hoşdarîkirinê giringî û feydeyên xwe hene. Herweha her tiştê ku em di jîyana xwe ya rojane de ji bo kar û barên xwe yên rojane bikar tînin yan kerestên xwarinê û heta dawîyê, hemûyan bi rêya nameyek an peyamekê zanyarî li ser van tiştan pêşkêşî me kirine, herweha em li ser çawanîya bikaranîna van tiştan tene agahdarkirin.

Giringî û feydeyên hoşdarîkirinê di çend xalan de:

1. Serederîkirina rast nîşanî mirovan dide û wan hişyard ike ku meriv çawa serederîya mirovan an tiştan bikin.
2. Ji bo ku mirov nekevin tengasîyê şewirmendek e.
3. Ji bo ku mirov hişmend be û bibin pispor zanînê dide mirovan.

4. Encama hoşdarîkirinê baş û bikêrhatî ye, ji ber ku di berjewendîya guhdêran de ye.

5. Hoşdarîkirin di hemû qadên jîyanê de cih digire û derbarê van qadan de agahîyan dide civakê.

6. Hoşdarîkirin her tim bo belavkirina qencîyê kar dike, ger nikari be qencîyê belav bike, hewl dide hevsengîyê biparêze, anku bi tu awayî xirabîyê naxwaze.

7. Hoşdarîkirin her tim navgînek an sedemek e ji bo pêşgirtina li xirabî, nakokî û têkçûna têkilîyan.

1.2.8. Hoşdarîkirin wekî Kirdeyeka Axaftinê

Hoşdarîkirin kirdeya axaftinê ya herî giring e, axêver guhdêrî hoşdar dike ku tiştekî bike yan neke, peyamekê ji kesekî re dişîne ku tiştekî bike, di vê peyamê de şîret û pêşnîyar hene. Eger mirov vê yekê bike dê bê parastin, ger neke dê zîrarê bibîne, wekî van hevokan:

Hoşdar be li dîlanê gulan bernede.

Ez te hoşdar dikim li dîlanê gule nehêne berdan.

Ev hevok bi awazeke wisa hatine gotin ku eger hûn guleyan bavêjin dê tiştekî xirab çêbibe. Di hevoka yekem de tê wateya hoşdarîkirinê. Lê di hevoka duyem de awaz dijiwartir e û hoşdarîkirin bi wateya daxwazî û fermanî hatîye. Axêver dibêje eger gule werin avêtin tiştên pir xirab diqewimin. Naveroka hoşdarîkirinê wekî kirdeyeka axaftinê gelek amanc û kirdeyan pêk tînin; wek: Agahdarî, hoşdarî, şîret, gef, ferman, daxwaz, îqnakirin, rênîşandan û gelek babetên din, divê ev yek bandorê li guhdêran bike û jîyana wan rast bike.

Di derbarê hoşdarîkirinê de wekî kirdeya axaftinê çend nêrîn hene:

Bi nêrîna Muflin hoşdarîkirin gotinek e, ji bo hoşdarîkirin û agahdarkirina kesê li hember tê bikaranîn (Silêman, 2020: 47). Kirdeya hoşdarîkirinê nêzîkî hemû kirdeyan e, ji ber vê yekê di pragmatîkê de rolek baş dilîze.

Axêver dema nameyên hoşdarîyê dişîne, di axaftinê de jî ekonomî dike û peyama xwe bi awayekî herî kurt pêşkêş dike (Selîm, 2016: 76). Di vê wateyê de hoşdarîkirin bi kiryara ekonomîkirin û arastekirinê radibe.

Hoşdarîkirin li cem Austin bi kirdeya danîna peymanan e. Austin vê kirdeyê wekî ravekirinekê pênase dike, li ser dîtî û xwesteka axêverî ji bo kirina tişteki, wek: Soz, gef, sond, hişyarî (Austin, 1962: 151). Herweha li cem Searle kirdeya hoşdarîkirinê girêdayî ye bi kirdeya pêgîrîkirinê, mil bi milê sondxwarin, gefxwarin, sozdanê ye, Searle nîşan dide ku kirdeyên pêgîrîkirinê guhdêran razî dike ku di pêşerojê de tişteki bike (Searle, 1969: 17-18). Li gor eva jorîn hoşdarîkirin peyvek gelemperî ye ku xetereyan îfade dike.

Hoşdarîkirin kirdeyeka axaftinê ye, hewla razîkirina guhdêran ji bo kirin yan nekirina tişteki ye, van amanc û kirdeyan dihevine: Sozdan, agahdarkirin, pêşnîyarkirin, qedexekirin, şîretkirin, tehdîdkirin, hişyarkirin, gilîkirin...hwd.

Pencer derizîye.

Ev hevok ji bo mebestên hoşdarkirinê tê bikaranîn, hoşdarîya guhdêran dike ku hay ji pencerê hebe nekeve an jî li rex pencerê re derbas nebe û ku zîrarê nebîne.

Di dawîyê de di encama van çavdêrîyan de tê gotin ku hoşdarîkirin kirdeyeka axaftinê ye. Hewldanek ji bo baştirkirina jîyana mirovan e, her peyameke hoşdarîyê ku tê pêşkêşkirin, xwedan amancek bikêrhatî ye û pêdivî bi kirina karekî heye.

1.2.9. Cureyên Kirdeya Hoşdarîkirinê

Zimanzanan kirdeya hoşdarîkirinê bi çend awayan dabeş kirine, her yek li gorî nêrîn û zanîna xwe. Lê çimkî hoşdarî di bingeh de ji bo xizmetkirina mirovan tê bikaranîn, lewra divê cureyên hoşdarîkirinê zêde û eşkere û dûrî nezelalîyê bin. Ji ber vê yekê em hoşdarîkirinê bi vî awayî dabeş dikin: Du cureyên hoşdarîkirina rast hene, hin zimanzan li ser Hoşdarîkirina Hîpotetîk “Girîmaneyî” û “Hoşdarîkirina Xurt” li hev dikin, hinên din li ser “Hoşdarîkirina Rasterast” û “Hoşdarîkirina Nerasterast” li hev dikin.

Hoşdarîkirina Hîpotetîk “Girîmaneyî”: Bi awayekî ku erkên daxwazî pêk tîne, tê îfadekirin, faktorên sereke yê wê cureyê sedem û encam in, her çend prensîbên sedem û encamê veşartî bin jî, wekî wê hevokê:

Karên mîletî bimeşînin, an rewîş dê nexweş be.

Ev hevok bi gelemperî wekî xwestin tê gotin, axêver dibêje ku divê kar û barên mîletî bîn cîbicîkirin. Ev jî hoşdarîyeke taybet e û mebesta wê gefkirin e, herweha vê cureyê di warê ferman û agahdarîyê de jî amanc hene (Tiersma, 2002: 363).

Hoşdarîkirina Xurt ya Bêşert: Ev hoşdarî rasterast e û guman jê tune ye, bi giştî bikêrhatî ye çimkî dema axêver di axive, peyvên hîpotetîk nayên bikaranîn, lê encam yekser tê hêvîkirin, wekî vê hevokê:

Axir car dibêjim, karên mîletî zû bike.

Ev hevok wekî fermanekê ye da ku kar û barên mîlet nekevin ser hev, ji ber ku axêver dizane, eger bêhna mîlet teng bibe, rewîş wê gelek nexweş bibe.

Carinan di navbera van cureyan de tevlihevî çêdibe, Vander Veken tekeza vê yekê dike, ku kirdeyên axaftinê yên hoşdarîkirinê, kirdeyên veşartî û nezelal in ku birêkûpêk nehatine dabeşkirin, çimkî gava ji hêla mîlet ve têne şirovekirin, her yek li gorî nêrîna xwe şirove dike. Ji ber vê yekê, rêbazên agahdarî, hîpotetîk, xurt û mecbûrî hemû tevlihev in (Veken, 1990: 174).

Li vir em dê li ser du cureyên din yên hoşdarîkirinê bisekinin, ev cure bêtir belav û cihgir in:

1. Hoşdarîkirina Rasterast.

Ev cureyê hoşdarîkirinê tê wê wateyê ku her tim têkilîyeke rasterast di navbera şiklê hevokê; çi ragihandin, pirs an fermanî be û erkên wan ên peywendîkirinê de; heye: Ragihandin, pirs, daxwazî (Elî, 2020: 236). Wekî van hevokan:

Xelkê Duhokê li dor xizmetgozarîyan hoşdarîyê dide hikometê.

Duhokî hoşdarîyê didin ji dubare girtina çalakvanan.

Di hevokên jorîn de hoşdarîkirina rasterast tê dîtin, ev yek jî bikaranîna peyva hoşdarî di her du hevokan de tê bikaranîn.

Di vê wateyê de her gotinek ku tê de peyvek peyameke hoşdarîkirinê hildigire an jî xwedîyê wateyek rasterast e, ku ne hewce pragmatîk an jî ji derdorê were şirovekirin, dibe hoşdarîkirina rasterast.

2. Hoşdarîkirina Nerasterast

Dema ku di pêkhateya hevokê de formên hoşdarîkirinê nebin, lê bi rêya awaz û hawirdora di navbera axêver û guhdêran de dîyar dibe, ku hevok peyameke hoşdarîkirinê hildigire, wekî vê hevokê:

Xelik berpirse li hember dînê xwe û li hember jîyana xwe (Elî, 2020: 236).

Di vê hevokê de hoşdarîkirineke nerasterast heye. Çimkî bi rêya derdorê hatîye dîyarkirin û di vê hevokê de tu peyv û formên hoşdarîyê nînin. Di vê cure hoşdarîkirinê de pragmatîk û jîngeh di şirovekirina peyama hoşdarîyê de rola xwe dilîzin, çimkî di vê cureyê de peyvên hoşdarîkirinê nayên bikaranîn.

1.2.10. Taybetmendîyên Kirdeya Hoşdarîkirinê

Kirdeyên axaftinê sînoren berfireh ên pragmatîkê digirin. Ji ber vê yekê ku em li vê kirdeya giring xwedî derkevin, divê em taybetmendîyên van kirdeyan baş bizanin.

Kirdeya hoşdarîkirinê mîna her tevgerek din ya axaftinê, çend taybetmendîyên xwe hene:

1. Xwendin: Taybetmendîyeke giring a hoşdarîkirinê ye, ji bo guhdêr ji nameya hoşdarîkirinê fam bike, divê bikaribe nameyê bixwîne û wergire, lewma divê ev name pirzimanî be, anku li gorî hejmara rûniştvanan were çêkirin. Ev name li ser gelek şiklan tene pêşkêşkirin, wekî resim, hêma û nivîsa merivên nabîna. Herweha berê bi bang û bangkirinê hoşdarî dihatin belavkirin, lê dîsa jî vê serdemê li gelek cihên giştî bi bangkirinê tê gotin da ku qerebalixî neçêbe, lê berê ji ber ku piranîya mirovan nexwendewar bûn. Ev yek ji bo piştrastkirina wê yekê bû ku name gihîştîye û dikare were wergirtin û xwendin.

2. Têgihiştin: Axêver divê di warê nameyên hoşdarîkirinê de baş zani be, divê di têgihiştina peyama nameyê de kêmasî nebin, çimkî hemû sembol û peyv ji alîyê her wergirekî ve nayên zanîn û famkirin.

3. Zelalîya Têgihiştinê: Bi giştî divê peyama hoşdarîyê zelal û eşkere be û amancên veşartî û nepenî tê de nebe. Çimkî mebest ji zelalîya têgihiştinê ew e ku her kes bixwîne û têbigihe.

4. Pragtikî: Divê nameya hoşdarîyê hilgira peyamek normal be da ku ji alîyê civakê ve bi hêsanî were pragtîkkirin. Çimkî mebesta nameyê başkirina jîyana mirovan e. Eger kes wateya nameyê fam neke wê demê nirxa hoşdarîkirinê lawaz dibe.

5. Bandor: Nameyên hoşdarîkirinê divê peyamên hoşdarîyê yên xurt hebin, di hemû waran de; wekî naverok nameyê, pêşkêşkirin, sêwirandin û heta şêwaz û awaza axaftinê jî giring e. Çimkî yek ji giringtirîn amancên hoşdarîyê ew e ku bandorê li guhdêran bike (Wogalter, 2006: 3).

6. Pêşdebirina Reftaran: Nameyên hoşdarîkirinê xwedî mebestên bibandor û bawerîkirî ne, bi van amancan reftara mirovan tê guhertin û başkirin.

7. Guncandin: Nameyên hoşdarîkirinê encamên baş û bikêrhatî hene û li her derê peyam û mebestek heye. Çimkî divê peyam û gotarên wan li gorî bawerî, reftar û çanda wan gunca bin û rewşa wan digel hev, li hev be da ku peyamên hoşdarîyê bigihîjin encaman û bandorên baş hebin.

8. Eşkerayî: Hoşdarîkirinê naverokek zelal û eşker e heye, ev naverok bawerîyeke baş ji guhdêran re çêdike. çimkî peyama wê zelal e, radibe bilindkirina moralê li cem guhdêran û gelek taybetmendîyên din jî hene.

9- Berxwedan: Kirdeya hoşdarîkirinê bergirî ji merivan kirîye, li dor her bûyerek xwezayî û nexwezayî pêşnîyar û hêsanîkarî di peyama xwe de hilgirtine, ji bo her bûyerekê rabûye bi agahdarkirin û belavkirina zanyarîyan bi ser xelkê li dûr her pêşhatekê (Lehto & Salvendy, 1995: 2159).

10. Şareza: Kesên ku bi karê hoşdarîkirinê radibin xwedî tecrube ne û ji bo her bûyerekê şîretan li miletî dikin, digel vê yekê jî amûrên hoşdarîkirinê çî cihazên dîtinê bin yan yên bihîstinê, her ku xeterek hebe bi zanistî û serkeftî kar dikin.

11. Hêzdar: Nameyên hoşdarîkirinê gotarên aqilmend û daneyên rast li ser bûyer û dîyardeyan pêşkêş dikin. Ev yek ji bo kesê ku bi karê hoşdarîkirinê radibe nîşana jîr û zanîne ye û mebest ji vê yekê ew e ku bandorê li hestên guhdêran li hember van bûyeran bike.

12. Nîşandana Metirsîyê: Nameyên hoşdarîyê ji bo eşkerekirina metirsîyê û balkêşîyê, metirsîyan ji bo guhdêran nîşan dide, heke ev name bi şiklê wêne an reklaman be peyvên xetereyê bi rengên cuda û bi ronî tene nivîsandin û heke hoşdarî bi dengî were pêşkêşkirin, ew peyvên xeternak bi melodîyeke cuda û balkêş tene gotin (Lehto & Salvendy, 1995: 2161).

13. Cih: Nameyên hoşdarîkirinê li cihên giring tene danin û pêşkêşkirin, divê nameyên hoşdarîyê li her derê neyên danin, tenê li wan cihên ku pir kes jê sûd werdigirin û her kes dikare wan bixwîne û jê fam bike tene danin.

14. Nûbûn: Ziman bi berdewamî diguhere, çimkî kirdeya hoşdarîkirinê amancek zimanî ya giring e, ji ber vê yekê her pêşkeftineke hebe hoşdarîkirin di hundirê xwe de dihevine û ji bo bandorkirina mirovan bikar tîne, wek: wêneyên livok, peyamên dengî, rengên cuda û gelek guhertinên din.

15. Hemecurî: Nameyên hoşdarîkirinê ji hev cuda ne û her yek ji bo amancekê tene bikaranîn, her yek xwedî amanc û karên cuda ye, dema hoşdarîyek tê pêşkêşkirin, cur û amanca wê zelal û eşkere ye (Roger, 2016: 68).

1.2.11. Erkên Hoşdarîkirinê

Kirdeya hoşdarîkirinê gelek erkan encam dide, yên herî giring di jêr de wê werin nîqaşkirin:

1. Razîkirin: Ev kar radibe bi handana mirovan ji bo kirina tiştekî yan wergirtina fikrekê, çî bi rêya şîret an vegotina serhatîyekê, yan jî bi rêya xwestinekê ji guhdêrî û carinan jî razîkirin bi rêya fermanê tê kirin (Musa & Ehmed, 2014: 22). Razîkirin karê

herî giring ê hoşdarîkirinê ye, çimkî mebesta axêver ji hoşdarîkirinê ew e ku guhdêran di hemû warên jîyanê de wek: civakî, siyasî, hiqûqî, medyayî, tenduristî...hwd, qani bike, mebest ew e ku tiştê di berjewendîya wî de ye bike û xwe ji çalakîyên xeternak dûr bixin.

Di dema ajotina otombêlê de lez neke.

Di vê hevokê de erkê sereke ew e ku ajokar qanîh bike ku lez neke û bi serê xwe be, ji ber ku kirina vê yekê di berjewendîya ajovan de ye û dê wî biparêze û zirarê nede hawirdora xwe.

2. Tesdîqkirina Guhdêrî: Kirdeya hoşdarîkirinê di koka xwe de peyamên bikêrhatî hildigire, gava ku axêver nameyek hoşdarîyê pêşkêşî guhdêran dike, di nava vê nameyê de sedem û encam ji bo guhdêran têne gotin, wekî hevokên jêrîn:

Sînor kareb e, xwe nêzîk nekin.

Çem zêde bûye, hûn dê bifetisin.

Di hevoka yekem de axêver hoşdarîyê dide guhdêr ger hewl bide sînor derbas bike bê şik dê bi elektrîkê bimire û di hevoka duyem de jî axêver hoşdarîyê dide guhdêr da ku ji çem derbas nebe, çimkî dê bifetise û bimire.

3. Qedexekirin: Kirdeya hoşdarîkirinê peyam û erkên bikêr hildigire û ev erk li gorî rewşa guhdêr dimîne, heger guhdêr guh nede axêver, axêver dikare bi erkê qedexekirinê rabe û guhdêrî ceza bike, ev yek jî di berjewendîya guhdêran de ye (Stubbs, 1983: 156), wekî van hevokên jêrîn:

Li nexweşxaneyê kişandina cixareyê qedexe ye.

Otombêla xwe li ser peyarê nesekinîne.

Di van her du hevokan de divê guhdêr bizane ku her kesê li nexweşxaneyê cixareyê bikişîne an jî li ser peyarê bisekine, dê li gorî cezayên ku ji hêla sektora tenduristî û hatinûçûnê ve têne dayîn bihêne cezakirin.

4. Agahdarkirin: Kirdeya hoşdarîkirinê bi erkê ragihandinê radibe û guhdêrî li dor her bûyerekê agahdar dike, bi rêya hoşdarîyê dê guhdêr amade û xwedan zanyarî be li ser her bûyer û dîyardeyê ku biqewime (Wogalter, 2006: 3), wekî van hevokan:

Hişyar be dîwar derizîye.

Dûr neçin, lehî dê were.

Di van hevokan de axêver hoşdarîyê dide guhdêr, ku xwe nêzî dîwarê derizî neke, ger agahîya guhdêran li ser dîwarê derizî nebûya, dibe ku dîwar bi ser wî de were xwar û birîndar bibe, di hevoka duyemîn de jî hoşdarîyê dide, ku neçe dûr ji ber ku heke lehî rabe dê zirarek mezin bide.

5. Zanyarîdan: Kirdeya hoşdarîkirinê xwe wekî xizmetekarek ji mirovan re dihesibîne, her dema ku kesek dest bi karekî nerast bike an jî ber bi cihekî xelet ve çû, axêver dê wî hişyar bike û zanyarîyan bide guhdêr da ku berê wî bide rastîyê, ger guhdêr li pey agahdarîya ku ji hêla axêver ve hatî dayîn biçe guhdêr wê ewle be (Wogalter, 2006: 3).

Cixare sedema sereke ya nexewşîya giran e.

Di vê hevokê de axêver guhdêrî bi zirarên cixareyê agahdar kirîye û eger guhdêr cixareyê bidomîne dê zirareke mezin bide tenduristîya wî.

6. Nîşandana Metirsîyê: Ev karê hoşdarîkirinê gelekî giring e û bi hemû karên hoşdarîkirinê re hatîye tevlihevîkirin, lê cudahîya vî karî ew e ku axêver radibe bi destnîşankirina metirsîyê û di derbarê bûyer û dîyardeyan de zanyarîyên zêdetir dide me, digel vê yekê jî metirsîyê pêşanî guhdêrî dike û hoşdar dike ku ger ji wî karî dûr nekeve yê axêverî pêşkêşkirî ew dê zererê bibîne, wekî van hevokên jêrîn:

Eger ji pêlên avê rizgar nebî, tu dê bixeniqî.

Eger hûn ji ajawegîrîyê dûr nekevin hûn dê werin girtin.

Di hevoka yekem de axêver guhdêr hişyar dike, eger ew bisekine û ji bo xilasbûnê hewl nede, ew ê bifetise û di hevoka duyemîn de axêver dibêje ger hûn dev ji propagandayên derew bernedin dê zirarên mezin bibînin û dê bikevin girtîgehê.

7. Erkê Guherîna Arasteyan: Kirdeya hoşdarîkirinê ji bo guhertina arasteyan tê bikaranîn, hoşdarîkirin di rêvekirina rêwîtiya jîyanê de rolek giring dilîze, dema ku mirov

tişteki nerast bike yan ji ji rêya rast derkeve, wê bi rêya hoşdarîkirinê bihête rasterêkirin, cimkî hoşdarîkirin radibe bi pêşkêşkirina delîlan li dor karên çewt.

Heger hûn berdewam bin li ser rîbayê, hûn naçin cenetê.

Di vê hevokê de axêver hoşdarîyê dide guhdêr ku arasteya xwe biguherîne, çimkî ger guhdêr li ser xwarina rîbayê bidome, di dawîyê da dê biçe dojahê, ev faîz zirarê dide hemû civakê ji ber vê yekê ji bo me hoşdar bike û di vê mijarê de zanyarîyan bide me xwe li vê pirsê kirîye xwedan.

8. Erkê Hoşdarîkirinê: Kirdeya hoşdarîkirinê peyama hoşdarîyê di hundirê xwe de hildigire, ji bo ku mirov ji rewş, dîyarde, kar, kiryar û pirsgerêkên civakê haydar be tê bikaranîn, ev çende ji bo wê yekê tê gotin da ku nameya hoşdarîyê bi cidî bigire, ji ber ku heke cidî negire dê bi pirsgerêkan re rû bi rû bibe (Wogalter, 2006: 4), wekî vê hevokê:

Hişyar bin şofêr li birahênan de ye.

Di vê hevokê de guhdêr hoşdarîyê dide ku şofêr hînî ajotinê dibe, ku haya we jê tune be yan ji jê dûr nekevin hûn dê bikevin tengasîyê û dê qezayên trafîkê çêbibin.

9. Erkê Pêgîrbûnê: Kirdeya hoşdarîkirinê giringîyek mezin dide erkê pêgîrbûnê, cimkî ev erk ji bo birêvebirina jîyana mirovan gelek giring e, her erkekê ku ji bo jîyana mirovan giring be, hoşdarîkirinê xwe li wî erkî kirîye xwedan, cimkî xizmetkirin û rênişandana gel yek ji amancên hoşdarîkirinê ye, ev erk kesên asta wan wek hev nikarin encam bidin, lewma divê asta axêver ji asta guhdêr bilindtir be, vêca çi mamosta ji xwendekaran tişteki bixwaze yan ji rêveber erkekê bide karmendan, bê şik erkê Pêgîrbûnê ji wekî hemû erkên din di berjewendîya guhdêran û mirovatîyê de ye, wekî vê hevokê:

Ez we hoşdar dikim ku kar di 8ê sibehê de dest pê dike.

Di vê hevokê de rêveber hoşdarîyê dide karmendan ku demjimêr 08.00an li midûrîyetê amade bin da ku kar û barên xelkê birêve bibin û zêde qerebalixî di mudurîyetê de çênebe, lêbelê em dikarin bibêjin ku hoşdarîkirin di vê hevokê de hoşdarîyê dide mirovan ku berî demjimêr heştan neyên rêveberîyê, ev kar bi tevayî di xizmeta guhdêran de ye da ku karê wan bi hêsanî û di demeke kin de pêk were.

10. Erkê Handanê: Kirdeyên hoşdarîkirinê xwe wekî erkê handanê nîşan didin, ji bo bilindkirina morala guhdêran tîbî bikaranîn da ku guhdêr rabin bi pêkanîna wî karê ku di nav nameya hoşdarîyê de hatîye xemilandin, di vî erkî de divê axêver xwedî zanînekî baş be ku meriv çawa morala guhdêran bilind dike, da guhdêr rabin vî karî encam bidin, ev yek jî di berjewendîya guhdêran de ye, wekî vê hevokê:

Welat dayik e, lê bibin xwedan.

Ev hevok hoşdarîyê dide ku mirov li welatê xwe xwedan derkeve û ji bo xizmeta welatê xwe bixebitin, welat wekî dayik hatîye binavkirin, ku bandorê li dil û mejîyê guhdêran bike, ev hevok jî tê wê maneyê ku eger welat tune be em nînin

11. Erkê Peymandanê: Di nameyên hoşdarîkirinê de jî peymanek heye û eşkere dike, ger guhdêr tiştê ku axêver jê dixwaze bike, dê encam baş be û heke neke dê zirarê bibîne. Li vir em dikarin bibêjin di kirdeyên hoşdarîkirinê de axêver bi guhdêran re li hev dike û ev peyman di berjewendîya guhdêran de ye, wekî vê hevokê:

Ger ezmûnê bixwînî, ez ê we derbas bikim.

Ev hevok hoşdarîyê dide guhdêrî ger guhdêr bixwîne dê ser bikeve û qonaxeke din derbas bike, ger nexwîne dê bimîne û derbasî çî qonaxên din nabe, li vir peyman li ser xwendinê ye.

12. Erkê Fermananê: Karê hoşdarîkirinê li gor rewîş û baredoxê guhdêrî nameyên xwe araste dike, ger axêver bibîne ku guhdêr sînoran derbas dike û guh nade kesî, axêver wê erkê fermananê bikar bîne û dê guhdêrî li sînorên wî bisekinîne, dema ku asta têgihîştina guhdêr kêm be axêver erkê fermananê bikar tîne (Leech & Svartvik, 1994: 170), wekî vê hevokê:

Hişyar be xwe nêzîkî avê neke.

Di vê hevokê de axêver fermanê dide guhdêr ku nêzîkî avê nebe, herweha awaz û şêwazê gotina vê mînakê tund e, wesa xuya dike ku axêver hêrs bûye.

Ji bilî van erkên hoşdarîkirinê gelek erkên din jî hene, lê eger em bi dirêjî li ser erkên hoşdarîkirinê bisekinin, wê tevlihev bin, ji ber vê yekê her erkekê bi şîretkirin, rênîşandan û xizmetkirina mirovan rabe diçe di bin sîbera erkên hoşdarîkirinê de.



2. ZIMANÊ GOTINÊN MEZINAN Û KIRDEYA HOŞDARÎKIRINÊ

2.1. Kirdeya Hoşdarîkirinê û Tewrîya Rêzgirtinê

Tewrîya Rêzgirtinê taybetmendîyek zimanî ye. Ji bo ku axêver û guhdêr û kesên ku jê re tê gotin pir giring e, ev tewrî bi piranî di axaftinê de tê bikaranîn, wekî dîyardeyeke zimanî li cem hemû neteweyan heye. Lê ji çandekê bo çandeka din diguhere, çimkî her komek ji mirovan xwedî çand û rewşenbîrîya xwe ya taybet in. Reftarên ziman çalakîyek girêdayî çandê ye (Laynz, 1987: 240). Bi vê wateyê rêzgirtin roleke baş di tevgerên reftarê de dilîze û her miletek xwedî çanda xwe ya reftaran ya taybet e û ev yek bi eşkere di ziman de xuya dibe. Rêzgirtin wekî pirseke zimanî ya pragmatîkî û zimanvanîya civakî hate hebûnê, ji bo ku nexweşî û nakokî di navbera axêver û guhdêrî de dernekeve. Çimkî giringî û erka rêzgirtinê ew e ku peywendîyên di navbera kumelên mirovan de biparêzin û xurt bikin, rêzgirtin tevgerê di zimên de ye û ev reftar di nav mirovan de tê hîskirin û amanca wê ew e ku mirov di têkilîyên xwe de dilxweş û rehet bin digel hev (Me‘rûf, 2013: 35). Anku rêzgirtin hêsanîkirin e di bazaran de û destveanîna mafên guhdêrî ye.

Tewrîya rêzgirtinê gelek waran vedihewîne, bi taybetî pragmatîk, metodolojî, ziman bi giştî, zimanvanîya civakî, şirovekirina gotarê û kirdeyên peywendîkirinê (Elî & Koçer, 2021: 91). Divê were zanîn ku rêzgirtin heta niha di warê pênas û sînoren xwe de hîn jî cihê nîqaşê ye. Hinek dibêjin rêzgirtin dikeve bin pragmatîkê, hinek jî vê yekê wekî dîyardeyeke civakî ya ziman dihesibînin. Rêzgirtin taybetmendîyeke zimanî ye, giringîyek taybet bi lêkolînên sîfat û şêwazên cuda yên tevgerên civakî didin, wekî serederîya baş, razîbûn, rêzgirtin û xweşgotinê... (Crystal, 2003: 358), ku mirov bi nav û deng bibe, divê xwe bi urf û adetên civakî re biguncîne.

Eşkere ye ku li ser pênasê rêzgirtinê û sînoren wê, her yek li gorî zanîna xwe pênasê dike, weha hatîye nîqaşkirin: Rêzgirtin xwestekeke rastîn e ku meriv ligel mirovan bi qîmet be an jî motîvasyonek sereke ye ji bo reftara zimanî ya kesî, herweha rêyek sereke ye ku axêver bi rêya vê tewrîyê bandorê li guhdêran bike (Elî & Koçer, 2021: 92). Rêzgirtin rêyek giring e ji bo axêver ku serederîyê bi temaşvanan re bike, çimkî bi vî rengî têkilîya mirovî yekser e. Tewrîya rêzgirtinê komek rêbaz û stratejîyên duristkirin û

guherîna têkilîyan di navbera mirovan de têne bikaranîn (Green, 1996: 147) Ev stratejî ji bo kêfxweşkirin û peydakirina aramîyê ye, ji bo kesê beramber, ji ber vê yekê divê meriv şêwazekê zimanî yê xweş û tevgerek gunca bikar bîne. Bi nêrîna Holmsî: Rêzgirtin ew e tu ji alîyê zimanî ve xwedan rêzbî bî û bi awayekê gunca bi mirovan re biaxive, ku di çarçoveya pêwendîyê de pêk tê, anku girêdayî asta têkilîya civakî ya di navbera hevalbendên axiftinê de ye (Holmes, 2001: 268). Bi vê wateyê rêzgirtin kiryareke yekser e ji axêverî bo guhdêran, lewra divê axêver rêzdar be û bi zimanekî xweş biaxive da ku rêzgirtinê di navbera wan de durist bibe. Mirovan li her demê û li her derê hevî heye ku baş bin û ew xwe dispêrin amûran wekhev, ev du pêdivîyên civakî yên giring bi xwe ve digire: Ne rexne û ne destwerdan, mirov dixwaze ku mirov bi wan bawer bike û tiştekî li ser wan ferz neke, li gorî vê yekê rewşenbîrên civakê hewl didin ku meriv neyên rexnekirin, ger rexne girtin jî bila rexna çêker be, lê naxwaze destwerdanê di jîyana mirovan de bike, ku azadîya wan ji nav neçe, vê nêrînê di tewrîya rêzgirtinê de rola xwe baş dîtîye û wekî serederîya baş tê naskirin.

Rêzgirtin pêk tê ji nîşandana giringî û qîmetê ji kesê hember re û ev yek bi rêya rû “serûçavan” tê îfadekirin. Rêzgirtin ji wan hoşdarî û agahîyan pêk tê ewên ku meriv bi rêya rûyê xwe pêşkêşî derdora xwe dikin (Huang, 2008: 96). Bi nêrîna Gufman rû (face) pêk tê ji nirxa civakî ya erênî, ya ku meriv ji xwe re daxwaz dike, ev jî bi awayekî bandorkirî bi rêya ewê rola ku meriv di pêvajoya ragihandinê de li ser hev ferz dikin. Rû nexşeya Xwedê ye, bi rêya sîmayên civakî hatîye spartin û her bi vê rêyê hatîye destnîşankirin (Elî & Koçer, 2021: 94). Bi nêrîna Brown û Levinson rû bi sozdarîyê tê afirandin, di şûn de dikare bihête wendakirin, nûjenkirin an jî were başkirin, di pêwendîyê de divê tim bala xwe bidinê û bi dîtina wî rû ji du alîyên bi hev ve girêdayî pêk tê, ew jî ev in:

1. Rûyê Erênî: Ev ji van xwestekan pêk tê: Razîbûnê, rêzgirtinê, hewcedarîyên têkilî û pêwendîyan, anku ew xwestekin yên ku bi kêmî ve li cem hin kesan xweştirîvî bî.

2. Rûyê Nerênî: Ev daxwaza azadîya serederîkirinê û azadbûna ji amancê dike, yanî xwesteka hin tiştan di mirov de hebin, ku tu asteng ji alîyê kesên din ve dernakeve pêşîya wî (Elî & Koçer, 2021: 95). Divê were zanîn ku hoşdarîkirin bi rûyê erênî ve

girêdayî ye. Çimkî dema ku axêver di axaftina xwe de kesekî hoşdar dike, dê hewl bide ku bala wî bo xwe bikişîne û wî ji xeterek çaverêkirî dûr bixe.

Hişyar bin, daristan xeternak e.

Ev hevok tê maneya hoşdarîkirinê, axêver guhdêrî hişyar dike ku daristan xeternak e, ger bikeve daristanê dê zîrarê bibîne, ev çende hezîkirina axêverî li cem guhdêrî zêde dike, çimkî di berjewendîya guhdêrî de ye. Ev ji bo wê yekê dizivire ku axêver rûyê xwe yê erênî nîşan daye, lewma hoşdarîkirinê bi rûyê erênî ve girêdayî ye.

Kirdeya hoşdarîkirinê sînorek berfireh e di nava ziman de bi gelemperî û di pragmatîkê de bi taybetî heye. Bi vê yekê re dikarin bibêjin rêzgirtin yek ji taybetmendiyên hoşdarîkirinê ye, li vir hewl nadin ku asta tewrîya rêzgirtinê kêmkirin, çimkî tewrîya rêzgirtinê di zimannasîya civakî de pir girîng e û ji gelek alîyan ve mîna kirdeya hoşdarîkirinê ye û ji hinek alîyan ve ji hev cuda ye, ger bi zanistî tev bigerin, xuya ye ku kirdeya hoşdarîkirinê ji aliyê zimanî ve ji tewrîya rêzgirtinê pir berfirehtir e, herweha kirdeya hoşdarîkirinê her tim di berjewendîya guhdêran de ye. Lê tewrîya rêzgirtinê pir caran di berjewendîya axêver de ye. Hêjayî gotinê ye ku hin zimannas vê dawîyê amaje bi wê yekê kirine ku hoşdarîkirina nerênî di berjewendîya axêver de ye, lê ev yek tenê di gotarên sîyasî de xuya dibe û dikeve bin erkê handanê.

Tewrîya rêzgirtinê dibe çend curek û xwedî erk û binemayên xwe ye, ku di warê wekhevî û cudahiye de bi kirdeya hoşdarîkirinê re dê hête hevberkirin, rêzgirtin bi gelek awayan tê dabêşkirin, lê du cureyên wê yên sereke hene:

1. Rêzgirtina Rasterast: Di vê cureyê rêzgirtinê de axaftin û peyama rêzgirtinê rasterast ji guhdêr re tê pêşkêşkirin, di vê cureyê de rola axêver pir girîng e û divê bi hostayî peyama xwe bigihîne guhdêr. Çimkî ev yek di berjewendîya axêver de ye (Brown & Levinson, 1987: 95).

Destxweş, xwarineke xweş amade bike.

Di vê hevokê de peyva destxweş bi awayekî rasterast tê bikaranîn, ev jî di berjewendîya axêver de ye, lê dema ku axêver nameyên rêzgirtinê pêşkêş dike, ji bo bilindkirina morala guhdêran gelek nasnav têne bikaranîn, wekî van nasnavan:

Civakî: Şêx, Axa, Mîr, Beg...

Xizmayetî: Kak, Mam, Xal, Bira, Xwişk...

Pîşe: Mamoste, Doktor, Hosta, Kaptin...

Eger em vê yekê bi kirdeya hoşdarîkirinê re bidin ber hev, diyar dibe ku berevajî vê yekê ye, çimkî di kirdeya hoşdarîkirina rasterast de her peyam an her nameyeke hebe di berjewendîya guhdêran de ye, lê di nameyên hoşdarîkirinê de gelek peyv û destewaj hene bi zelalî tîne dîtin, ku ev peyv derbarê hoşdarîkirina rasterast in, ev çende wekî tewrîya rêzgirtinê ye.

2. Rêzgirtina Nerasterast: Di vê cureyê rêzgirtinê de axêver radibe bikaranîna nameyên rêzgirtinê yên nerasterast, anku hilgirê peyamên gelemperî ne, ku guhdêr wateya rast fam fam bike, divê peyama xwe bi pragmatîkê re tevlihev bike, ev rêzgirtin pîranîya caran di berjewendîya axêver de ye, bi vê yekê jî re rêberî û şîretan dide temaşvanan (Brown & Levinson, 1987: 211).

Xwarinê naxwî?

Ev hevok di rastî de ne pirsek e, daxwazek e, lê axêver bi awayekî pirs û bi merema rêzgirtinê tîne bîra guhdêran. Kirdeya hoşdarîkirina nerasterast mîna rêzgirtina nerasterast e, yanî peyv û peyamên eşkere nînin, lê divê guhdêr bi rêya pragmatîkê wan fam bike, lê hoşdarîkirina nerasterast jî di berjewendîya guhdêran de ye.

Tewrîya rêzgirtinê di ziman de rolek baş dilîze û çend erkên giring pêk tîne, yên herî giring ev in:

1. Tewrîya rêzgirtinê ji nexweşî û zîrarê re sînorek datîne.

2. Rêzgirtin alîkarîya rêxistina jîyana civakê dike û rewşeke hevseng di navbera axêver û guhdêran de çêdike.

3. Rêzgirtin ji bo axêveran jîngeheke xweş û rehet çêdike û pêşî li nexweşî û têkcûnan digire (el-Şerîfî, 2011: 49). Ev erk bi hev re dixebitin da ku jîngeheke xweş û aram biafirînin, da karûbar hemû birêkûpêk bimeşin. Dema ku axêver nameyek rêzgirtinê bi rasterast ji guhdêr re dişîne, du mebestên vê nameyê hene: Yek ku karên axêver baş

bimeşînin. Du dema axêver hurmetê dide guhdêran, guhdêr li hember şerm dike û bêtir hurmetê dide axêver, ev nîşana wê yekê ye ku di rêzgirtinê de cudahîyên civakî, temenî û pîşeyî hene. Ev çende hemû di berjewendîya axêver de ye, ev erk tev di nava kirdeya hoşdarîkirinê de jî hene, lê cudahîya wan ew e ku di hoşdarîkirinê de amanc û merem gohdêr e û kar hemû di berjewendîya wî de ye, ev jî hoşdarîkirinê ji rêzgirtinê cuda dike.

Tewrîya rêzgirtinê di zimannasîya civakî û çandî de pir giring e û di gelek warên wê de tê bikaranîn, lê ji bo ku rêzgirtin bigihîje encaman û bi serkeftî bixebite, divê di nav xwe de çend taybetmendî hebin:

1. Nameyên rêzgirtinê nabe hilgira peyama xwe ferzîkirinê be, divê xwe ji zorîyê dûr bixe.

Hewl bidin da ku bi ser kevin.

2. Nameyên rêzgirtinê hilbijart û encaman hildigire, anku dema ku peyam tê pêşkêşkirin, guhdêr bi hêbetî dimîne, da ku biqedîne çimkî ev peyam tijî xweşî û hêsanî ye.

Cîyek baş bo te heye, bi hêvîya zû xwendina xwe temam bikî.

3. Nameyên rêzgirtinê bi vîyan û qencîyê hatine xemilandin, lewra guhdêr bi dilxweşî û hezkirinê dihesê û hevokên ku rêz, qîmet û hevaltîyê îfade dikin derdixe.

Ji kerema xwe li dersê guhdarî bikin (Xetam, 2016: 107-108).

Sînorê kirdeya hoşdarîkirinê pir berfireh e, di nava xwe de gelek tiştên bikêrhatî dihewîne, ji ber vê firehîyê hemû tiştên jorîn di kirdeya hoşdarîkirinê de têne dîtin, lê hemû tiştên di kirdeya hoşdarîkirinê de di nav tewrîya rêzgirtinê de nînin.

2.2. Kirdeya Hoşdarîkirinê û Derdor “Hawirdor”

Derdor di zimannasîyê de bi gelemprî û di pragmatîk û kirdeya hoşdarîkirinê de bi taybetî xwedî nirxek mezin e, ger em ji hawirdorê sîd wernegirin, em nikarin birêkûpêk bikevin nava pragmatîk û hoşdarîkirinê de. Derdorî roleke giring di ravekirina nameyên hoşdarîkirinê de dilîze, çimkî bêyî ku li hawirdorê binêrin, gelek wate û mebestên veşartî li pişt nameyên hoşdarîkirinê dimînin û nayên şirovekirin. Derdor giringîyeke mezin dide

peyvê û ev giringî di wateya peyvê de xuya dibe, cîmkî hawirdor alîkarîya şirovekirina wateyan dike û di nameyên ku tên şandin de tu tu alozîyan nahêle (el-Ferec, 2009:116). Bi vê wateyê peyv xwe di çerçoveya derdora xwe de dibîne, cîmkî derdor ji bo ravekirina wateya peyvên tê bikaranîn, giringîya derdorê ji bo kirdeya hoşdarîkirinê di wê yekê de ye ku derdor ji bo dîyarkirina wate û arastekirina wateyê tê bikaranîn, ji ber ku gelek peyvên di nameyên hoşdarîkirinê de çend wateyên din bi xwe ve digirin, ji bilî wateya ferhengî. Peyvê di ferhengê de tu tu wateyên taybetî nînin, lê xwedî wateyeke giştî ye, peyv dema ku bi peyvên din re di nav hevokek an metnek taybetî de were bikaranîn, li wê demê dibe xwedîyê wateya rastîn û taybetî, ev tê wê wateyê ku ne merc e, peyvek di du hevokan de heman wate hebe, belku dikare çend wateyên cuda bide, li gorî hawirdora zîmanê ku peyv tê de tê bikaranîn, her wekî Firth û piştgirên wî tekez dikin, dibêjin: piranîya yekeyên wateyî dikevin rex û dorên yekeyên din, yanî wateya yekeyê nayê zanîn û pênasakirin bêyî berçavgirtina wateya yekeyên din ên ku dikevin rex û dorên wê yekeyê (Omer, 1982: 68-69), wekî van hevokan:

Ev xwarin xweş e.

Ev xanî xweş e.

Ev ezmûn xweş e.

Ev geşt xweş e.

Di hevokên jorîn de wateya peyva “xweş” ji hevokekê ji bo hevokeke din diguhere û li gorî derdora ku tê de tê bikaranîn tê zanîn, di hevoka yekem de peyva xweş tê maneya tahmê, di hevoka duyem de birêkûpêk, di hevoka sêyem de tê wateya hêsanîyê û di hevoka çarem de jî tê maneya aramî û şahîyê (Elî, 2011: 46-47). Wateya peyvekê nayê zanîn û eşkerekirin heta ku em wê bi derdora wê re têkel nekin. Derdor hemû agahîyên berê û niha yê girêdayî çand, şaristanîyet, dem, cih, rewş, şewaz û zanyariyên ku girêdayî bi pîsporîya hevkarên axaftinê ve vedihewîne (Elî, 2011: 106). Axêver van wateyan bi rêya nameyên hoşdarîkirinê pêşkêşî guhdêr dike û guhdêr jî bi rêya van agahîyan nîyeta axêver fam dike.

Şiroveyên zimanî bi gelemperî li ser derdorê û her tiştê ku bi hawirdorê ve têkildar e, ji pêwendî, rewş, hal û barên girêdayî bi demêa gotinê ne dibestit, ew jî ev in:

1. Kesayetîya axêver û guhdêrî û rewşenbîrîya wan, ew kesên beşdarî axaftinê dibin û rola wan kesan jî.

2. Faktor, dîyardeyên civakî û peywendîya wan bi reftarên ziman re di dema axaftinê de.

3. Bandora axaftinê li ser guhdêr û beşdaran, wekî razîkirin û ne razîkirin, gihandina xweşîyê yan jî gihandina nexweşîyê (Elî, 2014: 40). Li gorî eva li jêr her ku gotinek tê kirin dibe milkê jîngehê, yanî wateya wê li ser peyvên berî û yên piştî wê dimîne, eger ev peyv di ferheng û mejîyê mirovan de xwedî wateyeke cihgîr be, wê wateyê nade ku wê heman hebe, ji ber ku hawirdora peyvê arasteya wateya peyvê diguhere û ev peyv dibe milkê hawirdorê û guhdêr dê li gorî zanîna xwe wateyekê bide peyvan.

Derdor di zimannasîyê de mijareke giring e, ji ber vê giringîyê her zimanzanek li gorî dîtîna xwe ev mijar şirove kirîye û pênase kirîye.

Fnderis derdorê weha pênase dike: Derdor ew e ku qîmeta peyvekê dîyar dike, herweha ew nîrx bi peyvên berî û yên piştî wê ve girêdayî ye, ji bilî wan wateyên curbicirên ku peyv dikare li gor zanyarîyên guhêrî yên ku ew peyv dikare hilgire, derdor peyvê ji ramanên borî rizgar dike û nîrxêke layiq pêşkêşî wê dike (Reşad, 2019: 82). Bi vê wateyê hawirdor wateya rastîn a peyvê nîşanî me dide. Derdor şanoya zimanî ye ku tê de peyv têne bikaranîn (Kemaluddîn, 2007: 16). Di vê pênasê de jîngeh wekî şano tê pênasekirin, dîyar e şano cihê anîn û birina bûyeran e, ji bilî dîtina çareyan ji van bûyeran re, heman amanc li ser derdorê tê kirin, ji ber ku karê derdorê guhertina wateyên peyvan li gorî cihê ku tê de têne bikaranîn. Derdor rêya yekane ye ku wateya ferhengî û wateya amanckirî rave dike, ev pênase tê wê wateyê ku em bi rêya derdorê wateya ferhengî ya peyvê û wateya amanckirî ya ku di hawirdorek cuda de tê bikaranîn dizanin. Her yek ji van pênasan derdor bi rêyeka cuda şirove kirîye, lê belê yek tiştê wan a hevpar heye: Amanca derdorî rewş û bûyer in.

Zimanzanan li ser cureyên derdorê xwedî nêrînê cuda ne, her yek li gor zanîna xwe dabeş kirîye, li vir em dê li ser çend cureyên giring bisekinin:

1. Derdora Zimanî: Behsa hawirdorê di nav nameyên hoşdarîkirinê de dike, ku pêwendîya peyv, hevok û paragrafan e, anku di vê cureyê de pêwendîya asoyî rola xwe dilîze. Bi gotineke din, hawirdora zimanî bi rêya peyvên rex û dor ve wateya peyvê tê îfadekirina, ku nîşan dide ku wateyek gelemperî ya peyvê heye û bi peyvên berî û piştî ve tê îfadekirin. Wekî wateya peyva “serspî”, di van hevokên jêrîn de:

Serspî şeva din li mala zava bû. “Bi wateya şîretkara bûkê tê”

Xem û kovanan ser spî kir. “Bi wateya rengê pirçê tê” (Elî, 2015: 302).

2. Derdora Sozdarî: Bikaranîna peyvê di nav xwe de digire û cudahîya wateya gelemperî ya peyvê û wateya girêdayî xwezaya mirov dîyar dike, bi vê re jî hawirdora sozdarî asta hêz û lawazîyê di karvedanê de dîyar dike, ev yek ji bo piştrastîyê an jî dadmendîyê (Reşad, 2019: 91-92). Ev gotin bi ramana tesdîqkirin an zêdekirinê ye, mînak peyva xuşewîstî di zimanê kurdî de ne peyva dildarî ye, lê ev her du peyv di kurdî de xwedî heman maneyê ne û wateya hezîkirinê didin.

3. Derdora Helwestî: Ev hawirdor bi gelek navan tê naskirin, wek: hawirdora ne zimanî, anku hawirdora rewşê, hawirdora şanoya zimanî, hawirdora derve ya metnê, hawirdora gelemperî yan hawirdora civakî, ji van hemû navan merema hawirdora helwestî ew e ku behsa rewşa cihê ku peyv jê tê, an bi gotineke din lêkolîna axaftinê di wê çarçoveya ku axaftin dikeve tê de (Reşad, 2019: 93). Bi kurtî, hawirdora rewş an jî helwestê pêk tê liberçavgirtina dem, cih, cureyê ragihandinê, qad, rewşa metin û name tê de hatî nivîsîn, mînak: Dema ku kesek dipişke, yê din dibêje: Xwedê rehma xwe li te bike “Yerhemuke Ellah”, û dema yek dimire dibêje: Xwedê rehma xwe lê bike “Yerhemuhu Ellah”, Peyva rehmê di mînaka yekem de ji bo zindîyan tê, lê di mînaka duyemîn de ji bo mirîyan tê bikaranîn.

4. Derdora Çandî “Keltûrî”: Ev cure derdor bi peyvê re wisa dixebite ku rewîştê çandî û civakî yên peyvê tê zanîn, di heman demê de behsa rewşenbîrî, reftar, adat, tîtal û dîtînen komek mirovan dike ku hin taybetmendîyan de hevpar in, mînak, di civata kurdan

de peyvên “hevjin” û “jin” her yek ji aliyê çîneke cuda ve tê bikaranîn, çîna jor peyva hevjin û çîna jêrîn peyva jin bi kar tînin (Elî, 2015: 303). Bi vê wateyê her komek mirovan an her çîneke mirovan hin peyv û gotinên taybetmend ên girêdayî bi rewîştê xwe hene û ev peyv û gotin di nava çîneke din de nayêne bikaranîn.

Di kirdeya hoşdarîkirinê de derdor roleke giring dilîze, ji bo ku bi duristî bizanin ka nameya hoşdarîkirinê çi cure peyamê hildigire, divê em vê yekê bi rêya hawirdorê şirove bikin da ku bigihîjin hoşdarîkirina rast, bi vê re jî hawirdor di kirdeya hoşdarîkirinê de bi du awayan giring e:

1. Derdor di dîyarkirina wateya hoşdarîkirinê de rolek giring dilîze, nemaze di hoşdarîkirina nerasterast de, çimkî bîyê berçavgirtina hawirdorê em nikarin wateya vê cureyê dîyar bikin, mînak:

Hûn nikarin bi peyatî vî çemî derbas bikin.

Heke di navbera hevkarên danûstendinê de hawirdorek gunca hebe, ev hevok dê wekî hoşdarîkirin were hesibandin, anku axêver ev name ji bo metirsîyê yan jî tirsandinê ji guhdêr re şandîye, gava av zêde dibe, axêver ditirse ku guhdêr bixeniqe.

2. Derdor dibe xaleke vebir di navbera kirdeya hoşdarîkirinê û kirdeya gefkirinê “tehdîdê” de ji hêla hawirdorê ve ji hev tînin veqetandin, ger name di berjewendîya guhdêran de be, ew ê bibe hoşdarîkirin, ger di berjewendîya axêver de be, ew ê bibe gefkirin, ev yek wê bi hawirdora di navbera axêver û guhdêran de were zanîn (Elî & Koçer, 2021: 97-98). Mînak:

Ger hûn li vir genim biçînin hûn dê poşman bibin.

Derdora di navbera danûstendinê de wê bibêje ka hevok hoşdarî ye an jî gef e, heger di berjewendîya guhdêran de be da ku zîrarê nebîne, ew ê bibe hoşdarîkirin, lê heke ji bo tirsandina guhdêran be û destûrê nede wan genim biçînin, ew ê bibe gefkirin.

2.3. Kirdeya Hoşdarîkirinê û Çand “Keltûr”

Çand mijareke berferê e û xezîneyek giranbiha ye, çimkî destpêka jîyanê bi vê mijarê dest pê kirîye û her vê mijarê qanûnên rêvebirinê pêşkêşî millet kirîye ku bibe rêbera

jîyana wan, çand peyveke gelemperî ye, civak û netewe bi van cudahîyên di nava çandê de tên naskirin. Her miletek xwedî çanda xwe ye, ev dewlemendîyeke kevneşopî û amûrên ku ji bav û kalên me, ji bo me mane çand ne tenê bermahîyên kevnar in, belku rewşenbîrîya miletekî ye, her ji bîr û baweran, ol, ziman, wêje, raman û kerestên madî di hewîne, yanî çand zanist û bingeha netewan e, çand xwedî qadeke berfireh e û gelek mijarên din jî dikevin bin vê qadê, ew jî her şînewareke muzexane û pirtûkxane bi hewîne, çimkî ew beşek ji şaristanîya mirovî ne, bi vê wateyê bermahîyên madî û manewî yên wekî tiştên bi destan hatinen çêkirin û bîr û bawerîyên hatine nivîsîn jî di hewîne, bi wateyeke din her tiştê ku ji bav û kalên me maye, dibe çand.

Çand hemû destkeft û îcadên madî û manewî ye, ku di rêvebirina jîyana gelan de rola xwe dilîze (Mîran, 2009: 58). Li gorî vê gotinê, çand ji du beşên sereke pêk tê:

1. Çanda Madî: Tiştên berçav ên ku bi destan hatine çêkirin, wek: Alavên çandinîyê, veguhestin, aletên nêçîrê, nexşe, resim, çek, tiştên malê û xwarin, ev hemû hewcedarîyên madî di her miletekî de xwedî taybetmendîyên xwe ne û milkê wî miletî ne.

2. Çanda Manewî: Ev cure hewcedarîyên manewî yên neteweyê hildigire, yên rojane bikar tînin, wekî ol, kevneşopî, folklor û ziman di hewîne, bi vê re jî çand şertê hebûna neteweyan, nasnameya gele û di jîyana wan a rojane de gelekî giring e.

Çand, mîrateya bav û kalên me ye. Em dikarin bibêjin ku ev mîras wekî emanet ji me re hatine hiştin, ew jî ev in:

1. Kar û kiryar.

2. Kevneşopî.

3. Tevger û Exlaq.

- 4- Gotinên mezinan, mijar, rûdanên gelemperî û taybet ên jîyanê di hewîne.

5. Rêyên pêwendîya di navbera kes û komên civakî de (Bedîr, 2003: 15), ji ber vê dewlemendîya çandî heta niha nekarîne sînorên çandî ên rast dîyar bikin.

Têgeha çandê wekî zaraveke gelemperî ji ber mezinahîya wê ne hêsan e, ku zana û keltûrnas çandê dîyar bikin û pênasayekê ji bo wê bidanin, ev yek ji wan sedeman e, ku

heta niha negihiştine pênaseyeke yekgirtî. Keltûr di edebîyata cihanê de yek ji peyvên herî dijar e, pênasikirina çandê ne hêsan e, çimkî çand her dem diguhere û li tu dem û cihekî nasekine (Meriç, 2018: 31). Bi vê wateyê çand nêzî zimannasîyê ye, çimkî wateya vê gotinê ew e ku çand her dem diguhere, her ku dinya pêşkeftin û şaristanîyê dibîne, çand jî diguhere û bi pêş dikeve, ji bo mirovatîyê bibe qanûn û rêber. Çand ew kevneşopî, serpêhatî, pisporî, huner û zanistên ku ji miletekî mane û bi derbasbûna demê re hatîye veguhestin, çand bi xwe parçeyeke civakê ye û alîyên mirovî, sîyasî, dîrokî û nejadî dihewîne (Abuzeyid, 2021: 30). Ger meriv bi awayekî vekirî li vê pênasîyê binêre, xuya dibe ku her tiştê ku mirov dike an bikar tîne ji çandê tê, ger mirov li neteweyên pêşketî binêre, wê bibîne ku wan çanda xwe bi zanistî bi rê ve birîye û jê sûd wergirtiye, vê yekê jî hişt ku ew çanda xwe kom bikin û lê bibin xwedî. Keltûr peyveke wergêrayî ya pir kevn e, ji bo hemû bermayîyên madî û manewî yên kevnar ên li şûn kes û neteweyan de mane (Abuzeyid, 2021: 29), çand ne tenê bermayîyên civakan e, her tiştê ku aîdî miletekî ye û ne ya miletekî din e, dikeve çarçoveya çandê. Çand resenîya neteweyan e, stranên folklorî, jîyan, dîrok, wêne, urf û edetên gel parastîye (Hemed, 2012: 25). Baldarîya neteweyan li ser çandê karekî giring e, çimkî çanda her neteweyekê ji berhevkirina zanyarîyên di warên sîyasî, aborî, edebî, felsefî û hemû zanistên din de pêk tê ku di jîyana xwe de bi dest xistine, vejandina çandê di nav keltûrnasan de ne tenê ji bo parastinê ye, di heman demê de ji bo îlhama girtinê ye da ku lêkolîner ji nû ve dîroka milletê xwe pê binivîsin. Bi wateyeka din, çand ne belgeyek e, ku ji şûn bav û kalên me maye û kesek dîyarkirî sûd jê werdigire, belku gencîneyeke bav û kalên me sûd jê wergirtiye, wê di paşerojê de jî bi kêrî milletê me were, ev tiştê we dike ku em bibin xwedîyê vê gencîneya giranbiha, ku rêberîya me bike û jîyana me bi rêve bibe.

Çand xwedî wateyek berfireh e, ev wateye kevneşopî û nîrxên civakî dihewîne û ev yek nîşanî me dide ka em çawa nameyên hoşdarîkirinê bixwînin û şirove bikin. Ya giring ev e ku em bizanin ka em çawa û bi kîjan amûran dikarin nîşanên hoşdarîkirinê dîyar bikin, ji ber ku her tiştê girêdayî çandê tijî agahdarî ye û ev agahdarî hemû hoşdarîkirin e, di civakên kevnar de kirdeya hoşdarîkirinê xwedî stratejîyên taybetî bû, bi van stratejîyan nameyên hoşdarîkirinê hatin şandin, wekî: Tevgera hin heywanan an bûyerên xwezayî, ev hemû li ser bingeha bawerîyên olî bûn, lê niha nameyên hoşdarîyê

hatine guhertin çimkî civak pêş ketîye, ev name jî hatine guhertin û bi teknolojîyê têne pêşkêşkirin, lê nameyên hoşdarîyê yên her miletî hin taybetmendîyên xwe hene û ev taybetî yê wî miletî ne, ev nirx ji çandê têne girtin û çand her tim diguhere.

Piştî cihangerî û pêşketinên teknolojîk heta radeyekê baş li gorî civak û çandê hatine adaptekirin, lê gelek cudahî hene ku destnîşan dikin ku ji bo serkeftin an têkçûna kirdeya hoşdarîkirinê hin şertên destpêkî hene, bi taybetî civak li ser têgehên çandî û civakî yên têgihîştina xetereyê, tevgerên xeternak û berxwedana xetereyê xwedî nêrînên cuda xuya dikin, ger mirov di demên xeternak de difikirin ku sînordarkirina xetereyan û berhevkirina agahdarîya berdest ne giring e, an heke ew ji xetereyên eşkere kemtîrxem bin û qonaxa nirxandina metirsîyê, bi hemû hêmanên hoşdarîyê ku dê çarenivîsa wan xirab be û encam dê neserkeftî bin (Elî & Koçer, 2021: 100), Bi vê wateyê çand bi gelemperî hoşdarîyan hildigire, ji ber ku her tiştê ku me ji bav û kalên xwe mîras girtîye, berhema hizrên wan an jî berhema bûyer û trajedîyan e, anku çi bûyer û karasatên ku hatine serê wan bi kurtî ji me re gotine. Ger em behsa gotinên mezinan wekî bermayîyek çandî yên hêja bikin, em ê bibînin ku her gotinek bêtir ji peyamek hoşdarîyê hildigire, bi vê wateyê em dikarin bibêjin ku çand bi gelemperî peyamên hoşdarîyê yên nerasterast hildigire, çimkî wateya wan veşartî ye, heta bigihîjin ramana rast, divê sûdê ji derdorê wergrin, ev derdor her çand û wêjeya qedîm a neteweyê ne, ku berhemeke çandî ye ku di hiş û ramanên millet de cih girtîye.

Çand û kirdeya hoşdarîkirinê gelek têkilî hev in û her du jî amanc dikin ku xizmeta mirovan bikin da ku wan ji karasat û bûyeran biparêzin. Çand bingeha parastina kesayetî, şaristanî û nasnameya neteweyekê ye û wan ji êrîşên fikrî yên dagirkeran diparêze û di heman demê de ji neteweya xwe daxwaz dike ku xaka xwe biparêze (Reşad, 2012: 26). Ev tê wê wateyê ku kirdeya hoşdarîkirinê jî vê peywîrê bi cih tîne û nameyên hoşdarîyê her gav peyamên bikêrhatî digirin û mirovan agahdar dikin da ku hişyar bin û welatê xwe ji hizir û êrîşên dagirkeran biparêzin, ji ber vê yekê ev peyamên çandî bi her awayî bin, ew dikare bi gotinek an stranek an çîrokek an wêneyek an jî lîstîkek vê yekê ragihîne. Çand asteke baş a bextewarî û aramîyê dide dil û hişê mirovan, pêwîst dizane ku kesên din jî hay ji êşên milletê xwe hebin û bi wan re parve bikin. Çand jî wesîleya kêmkirina

derd û nexweşîyên jîyanê ye û rêyek e ji bo lihevkomkirina gel, vêca çi bi rêya şîn, şahîyan, cejin, kûr an jî mêvandarî be (Reşad, 2012: 27). Ev hemû giringî di nameyên hoşdarîkirinê de têne dîtin, amanca kirdeya hoşdarîkirinê û çandê yek e, ji bo xizmeta mirovan dixebitin da ku wan ji nexweşî û karasatan biparêzin.

2.4. Kirdeya Hoşdarîkirinê û Pragmatîk

Di vê serdemê de pragmatîk wekî asteke nû ya ziman tê hesibandin, lê dîroka vê peyvê vedigere serdemên pir kevin, peyva pragmatîk ji peyva “Pragma” ya Yewnanî hatîye, bi ramana karkirin an pratîkê tê û gelek wateyên din hene, her tiştê ku bi karkirin û pêkanînê ve girêdayî ye. Di vê astê de lêkolîna sembolên zimanî bi kesî ve, digel berçavgirtina dem, cih û dîyardeyên curbicur ên ku bi van sembolan ve girêdayî ne tê hesibandin, di pragmatîkê de sembolên ne zimanî jî di derbirîna wateyê de roleke giring dilîzin, vêca ev sembolên ne zimanî çi, resim, nîşane û amaje bin, destûr e ku meriv wan bi tena serê xwe yan bi sembolên zimanî re bikar bîne, wekî têkilîya çavniqandin an lêvgivaştin di dema axaftinê (Elî, 2014: 9), wekî vê hevokê: To ya mezin bûy.

Heke çavniqandin bi vê mînakê re hebe, wê demê wateya wê berevajî dibe.

Pragmatîk di warê erkî de li ser ziman lêkolîn dike û pêkolê dike li gorî faktorên nezimanî ravekirina zimên bimeşîne, ev yek pragmatîkê ji zimannasîya derûnî û kozimannasîyê cuda nake, cîmkî her du zanist jî bala xwe didin alîyê erkî di zimên de (Elî, 2011: 64). Bi vê wateyê pragmatîk bi gelek zanistan ve girêdayî ye, wekî felsefe, piskolojîya zanînê, zanista ragihandinê û zimannasîyê...hwd, ev yek famkirina pragmatîkê zehmet dike, cîmkî gelek têkilî bi zanistên din re hene, ji ber vê yekê ji bo têgihîştina wateya pragmatîkê, divê mirov bi her du zanistan re jî bizane. Ji alîyê din ve ji bo ku em wate û mebesta pragmatîkê fam bikin, divê me agahî li ser amanca navbera hevkarên axaftinê de hebe, ev amanc bi kevneşopî û rewşa di navbera wan de girêdayî ye, ji ber vê yekê têgihîştina pragmatîkê hewldanek bêtir hewce dike.

Pragmatîk asteke giring a ziman û qadeke berfireh e, dibe gelek cur: Pragmatîka zimanzanan, Pragmatîka zanayên rewanbêjîyê, Pragmatîka zanayên lojîkî, Pragmatîka feylesofan...hwd, ji ber vê yekê pragmatîk ne hêsan e were sînordarkirin (Meqbol, 2006:

263). Bi vê ramanê pragmatîk tevî vê berfirehbûnê her dem diguhere û roj bi roj zêdetir pêş dikeve. Ji ber ku bi hawirdor û her tiştê bi derdorê ve girêdayî ye û ev jî her tim pêş diçin. Dema ku em dibêjin hawirdor, anku her peyamek watedar, ya wateya wê ya veşartî be, pragmatîkê jî heman amanc heye, ji ber vê yekê gelek zanistên zimannasî û nezimanî beşdarî şirovekirina pragmatîkê dibin, wek:

1. Watesazî

2- Rêbaza Zanistî

3. Zimannasîya Civakî

4. Zimannasîya Derûnnasî

5- Zimannasîya Gotarê (Yaqot, 1997: 182-183).

Pragmatîk yek ji giringtirîn astên zimên e, ku li gelek waran lêkolîn dike; wek: Kirdeyên axaftinê, girîmanên pêşîn, metafor...hwd, van û gelek warên din bandorek mezin li zimanzanan kirine û bi çavekê giring li vê asta zimên mêze dikin, belgeya vê yekê jî ew e, ku ev ast ji aliyê çend zimanzanan ve bi berfirehî hatîye pênasêkirin û şirovekirin û her yek ji wan li gorî dîtînan xwe li vê astê mêze kirîye. el-Xemaş di pênasêya xwe ya pragmatîk de weha dibêje: Pragmatîk ew zanist e ku bala xwe dide wateya ku axêver dixwaze ji axaftina xwe di hawirdorek diyarkirî de diyar bike, êşkere ye ku sê cureyên hevokan di kirdeyên axaftinê de tene bikaranîn: Ragihandin, pirs û ferman, ji ber vê yekê wergir dikare bi hêsanî nîyeta axêver bi rêya hawirdorê fam bike (Elî, 2011: 67), wek: Te ew kor çawa berda?

Ev hevok bi awayê pirsîyarîyê tê gotin, lê li vir axêver bi awayekî veşartî gazindên xwe ji guhdaran dike, ew ji wî re dibêje çima te berda, ger komê kes bi wî re hebin, ew dê vê yekê bi awayê ragihandin ragihîne, ku bizanin ku wî ew kor berda ye, herweha tê wateya fermanandê eger ferman bike û jê re bibêje bêtî haya min te çawa ew berda.

Her axaftinek an nameyeke pragmatîkî hebe, ger hewce be ku derdor wateya wê rave bike û ew peyam di berjewendîya guhdêran de be, bê şik wê ev gotin bibe nameyek hoşdarîkirinê. Em nikarin têkilîya di navbera pragmatîk û kirdeya hoşdarîkirinê de rave bikin, ji ber ku kirdeyên axaftinê bi gelemperî qadek giring a pragmatîkê ne û kirdeya

hoşdarîkirinê kirdeyeke axaftinê ya herî giring û berfireh e. Ji ber vê yekê kirdeya hoşdarîkirinê her dem pragmatîk e, lê pragmatîk tenê dema ku peyamên bi bandor û bikêr ji bo guhdêran hildigirin dibe hoşdarîkirin. Pragmatîk wan têkilîyan lêkolîn dike yên ku di navbera ziman û hawirdora wî de ji ber ku têkilîyên sereke yên têgihîştina ziman in, wateya vê gotinê ku ziman rast were famkirin, divê ev peyv û hevok bi hawirdorek taybetî re têkildar bin (Elî, 2014: 16). Pragmatîk xwe xwedîyê ziman dihesibîne û têkilîyên zimanî yên ku wateya wan nayê zanîn lêkolîn dike, anku ji bo ku bigihîje wateyeke rast pêwîstî bi hawirdorekê heye, bi vê wateyê hawirdorê em têkilî civakê kirin û peyama rast a pragmatîk ji guhdêran re da xuyakirin. Pragmatîk li ser wateya ku axêver dixwaze ji guhdêran re ragihîne lêkolîn dike (Yule, 2000: 3). Bi vê wateyê pragmatîkê divê nîyeta axêver ji guhdêran re vebêje û ev yek dema ku em axaftinê bi hawirdorê re têkel bikin pêk tê. Di encama van pênasan de em dikarin bibêjin pragmatîk ew zanist e ku ziman lêkolîn dike, lê ne rasterast, anku ziman bi hawirdorê re têkil dike, vêca çi derdora civakî be, çi hunerî be, çi rewşenbîrî û çi derûnî be. Pragmatîk bi tu awayî ji hawirdora xwe nayê veqetandin, her cure pragmatîk li gorî hawirdora ku tê de tê bikaranîn wate û amanca xwe dide.

Kirdeya hoşdarîkirinê kirdeya herî berfireh û giring a axaftinê ye û ev jî yek ji qad û rêyên herî giring a pragmatîkê ye. Kirdeyên axaftinê bi giştî û hoşdarîkirin bi taybetî yek ji amancên herî giring ên zanista pragmatîkê ne. Ev mebest bi mebestên din re zanista pragmatîkê pêk tînin û her yek ji van amancan tiştek dike. Lêgerîna li ser kirdeyên axaftinê bi serê xwe wekî lêkolînek pragmatîk tê hesibandin. Çimkî pragmatîk di destpêka derketina xwe de bi kirdeyên axaftinê re hevware bû (Elî, 2014: 196). Wekî ku hatîye gotin, du cureyên hoşdarîkirinê hene, dema ku em dibînin ku hoşdarîkirina me nerasterast e û hawirdorê hewce dike, wê demê em dikarin bibêjin ku ev peyama pragmatîk amanca hoşdarîyê hildigire, ji ber ku kirdeyên axaftinê bi gelemperî qadek giring a pragmatîk in, ji ber vê yekê em nikarin di navbera pragmatîk û kirdeyên hoşdarîkirinê de cudahî û wekhevîyê bikin, lewma em ê sedemên peydabûna pragmatîk û giringîya pragmatîkê nîqaş bikin.

Pragmatîk asteke giring a ziman e, ji bo serhildana vê astê gelek sedem hene:

1. Di zimannasîyê de gelek pîrsgirêk derketin ku rasterast nedihatîn çaraserkirin, lewra ev pîrsgirêk bi hawirdorê re tevlihev kirin heta ku çaraser bûn û ji vê yekê re pragmatîk hate gotin.

Xwe fêrî avjenîyê bikin.

Ger em vê hevokê bi derdora xwe re tevlihev bikin dê gelek wateyan bide me, wekî ku hûn avjenîyê nakin, avjenî ji bo tenduristîya we giring e, li devera we av heye divê hûn fêrî avjenîyê bibin, ev wate bi rêya pragmatîkê derketine holê, semantîk nikare vê yekê bike.

2. Hebûna valahîyekê di navbera tewrîyên ziman de ji alîyekî ve û lêkolînên ragihandina ziman ji alîyê din ve, egerek bû ku bala xwe bidin pragmatîkê, cîmkî valahî sebeb bû ku dengnasî, hevokasî û semantîk nikaribin bi dîyardeyên giring ên zimannasî re rû bi rû bimînin.

3. Pragmatîk bi hawirdorê ve girêdayî ye, ji ber vê yekê serhildana pragmatîkê bertekek bû li hember dîtina Chomsky, cîmkî Chomsky wekî amûrekî tazî yan jî amûrekî rasterast li ziman mêze dikir, anku ziman ji hawirdora wî dûr dixist, bi dîtina Chomsky hevoka “derî bigire”, divê em guh nedin ka ev hevok ji kê re û di kîjan dem, cih û derdorê de gotîye, cîmkî ev hevok bi gelek awayan, wekî ferman, hoşdarî, gef û nerazîbûn dikare were şirovekirin.

4. Pragmatîkê zanî ku di edebîyatê de hin dîyardeyên ku di esasê xwe de zimanî ne hene, wekî metafor, dirke, telmî‘..., ji ber ku ziman rola xwe ya rast neleyîstîye, wêjezan ji edebîyatê re kirine milk, lê ger em li van dîyardeyan binêrin, xuya ye ku ji edebîyatê zêdetir di ziman de tîne bikaranîn, wekî vê hevokê:

Dilê wî merivî hesin e.

Di vê hevokê de peyva hesin metafor e û wateya vê peyvê bêyî hawirdor nayê eşkerekirin, çîmkî dilên hesinî tune ne, tenê derdor dikare vê rave bike.

5. Pragmatîkê zanî ku arastekirina ziman bêtir navxweyî ye û guh nade hawirdorê û ev yek nirxa ziman temam nake, loma jî pragmatîk hate hebûnê û bi tevahî bala xwe da derdorê, wekî vê hevokê.

Rûvîyê deştê.

Ger meriv rasterast li vê hevokê binêre rûvî heywanek e û deşt jî cihek rastîn e, lê ger hûn bi nêrînek pragmatîk li vê hevokê binêrin, hûn ê bibînin ku ev ji bo wan kesên ku xapandinê eşkere dikin tê gotin (Elî, 2014: 18-20). Ev sedem hemû jî ji bo xizmetkirina guhdêran e ku ew bi zelalî peyama axêveran fam bike û jê sûd wergire, ev yek di derbarê kiryara hoşdarîkirinê de jî wisa ye, ji ber ku mebesta hoşdarîkirinê jî ew e ku guhdêr wateya rast fam fam bike û ji her peyamek ku jê re tê pêşkêşkirin sûd wergire.

Pragmatîk di ziman de xwedî cihekî berfireh e, ji ber vê yekê pir giring e. Li vir em ê li ser giringîya ku di kirdeya hoşdarîkirinê de xuya dibe, nîqaş bikin:

1. Pragmatîk bi rêya pêkhênên xwe beşdarî pêşkeftina lêkolînê dibe û ji bo şirovekirina metnê bûye asteke giring da ku guhdêr bi hêsanî bixwîne û jê fam bike, kirdeya hoşdarîkirinê jî ev yek kir da ku guhdêr bigihîje encamek baş û lêkolîna ziman pêş bikeve.

2. Axêverî û hawirdorê bi awayekî xurt bi hev ve girê dide da ku di derbarê hawirdora guhdarîkirinê de xwedîyê agahîyan bin û nîyeta axêver di axaftinê de bi rehetî were dîyarkirin, hoşdarîkirin jî vê çendê dike.

3. Pragmatîk pirsgirêkên ku di ziman de mane hilawîstî û ji bo axêver û guhdêran pirsgirêkan çêdikin çaraser dike da ku peyama bi hêsanî bigihîje guhdêr.

4. Pragmatîk aborîyê li ber çav digire û hewl dide ku peyama xwe bi awayekî herî kurt pêşkêş bike.

5. Pragmatîk ziman ji tarîfîyê paqij dike û tiştekî veşartî nahêle, gava ku tiştek tevlihev derkeve, ew ê wî tiştî tevî derdora xwe bike da ku pêşî li vê tevlihevîyê bigire.

Ev xal û ravekirinên di derbarê pragmatîkê de hemû di kirdeya hoşdarîkirinê de têne dîtin, ji ber ku hoşdarî jî dikeve nav sînoren pragmatîkê, cudahî li vir ev e ku hoşdarîkirina rasterast hewcedarîya hawirdorê nake, ji ber ku peyama rasterast digihîje guhdêran, kengê ku pragmatîk di berjewendîya guhdêran de bixebite, ew ê bibe kirdeya hoşdarîkirinê û dê ji bo guhdêran peyamek bikêrhatî hilgire.

2.5. Kirdeya Hoşdarîkirinê û Kirdeyên Têkildarî wê

Kirdeya hoşdarîkirinê roleke baş di kirdeyên arastekirinê de dilîze. Ji ber vê yekê kirdeyên axaftinê bi gelemperî û ew kirdeyên ku dikevin çarçoveya kirdeyên arastekirinê de ger bi hawirdorê re bihêne tevlihev kirin û bi zanistî were lêkolînkirin dê dîyar bibe ku hemû pêwendîyek baş bi hev re heye. Kirdeya hoşdarîkirinê di zimannasî û jîyana civakî de pir tê bikaranîn, ger em piranîya kirdeyên axaftinê yên din bi baldarî lêkolîn bikin, em ê bibînin ku ew hemû di nameyên hoşdarîyê de hene, bi vê wateyê ew dê bibin erkên hoşdarîyê yan jî amancên hoşdarîyê, ger nameyên hoşdarîyê bi hawirdorê re tevlihev bibin xwedî wateyên cuda ne, lê eger em wan ji hawirdorê derxînin, dê di navbera wateyên wan de wekhevî hebin, lewma ew peyam gotinek be an jî hevokek be.

Nêzîkî çem nebin.

Gelo ev hevok hoşdarîkirin, agahdarkirin, daxwazek, fermanek an axaftinek e? Ger em wê bi hawirdorê re tevlihev nekin, zehmet e ku meriv cureyê wê bibêje, lê gava ku hûn bikin hin hawirdoran, bi hêsanî cureyê kirdeya axaftinê dê were naskirin, wekî jêrîn:

1. Eger ji tirsaxeniqînê û ketina çem be, dê bibe hoşdarîkirin.
2. Eger ji bo parastin û serkeftina guhdêr be û ev axaftin wekî şewirê be dê bibe şîretkirin.
3. Ger ji bo cezakirina guhdêrî be, ev hevok dê bibe gefkirin.

Em dikarin vê hevokê bo gelek amancên din bikar bînin, ev hevok di eslê xwe de hevokeke hoşdarîkirinê ye, dema ku bi hawirdorê re têkel dibe gelek wateyên din jî dihewîne û dibe hilgirê peyamên hoşdarî, şîret, gef... .

2.5.1. Kirdeya Hoşdarîkirin û Kirdeya Şîretkirinê

Berî ku em van her du kirdeyan bidin ber hev, em dê kirdeya şîretkirinê bidin dîyarkirin. Şîretkirin yek ji kirdeyên axaftinê yên herî giring e û di pragmatîk û zimannasîya civakî de rolek baş dilîze û bo avakirina têkilîyên civakî pir giring e. Şîretkirin bi hemû hurgulîyên xwe ve giring e û di hemû qadên jîyanê û hemû asta wêjeyê de cih girtîye. Hherweha şîretkirin di zimanê de karekî giring e ragihandinê ye, mirov di

destpêka jîyanê de pêwîstî şîretan heye, pêwîstî piştî ku mirov bi hebûna valahîyê hîs dike çêdibe, di jîyanê de çi ev valahî seretayî an duyemîn be, mirov hewl dide vê valahîyê dagire. cimkî mirov di esas de xwezayek civakî ye, her ku pirsgerêkek an nexweşîyek derûnî çêdibe, ew li mirovên li dora xwe gerîyaye da ku jîyana xwe aram bike.

Şîret pêdivîyeke jîyana civakî ye, têkilîyên wê di her warî de hene, çi di jîyana kesan de çi di malbatê de çi di kar de çi di rêveberî û dezgehên giştî de û çi desthilatî û dewletê de...hwd (el-Nihewî, 1998: 67). Di çaraserkirina pirsgerêkên civakî û rûbirûbûna jîyan û astengîyên wê de şîret roleke giring dilîze. Ev jî rê li ber jîyaneke hêsanîr û bextewar vedike. Şîretkirin ew e ku yekser zanyarî ji wergir re peyda bike (el-Şenawî, 1996: 13). Bi vê wateyê şîret divê zelal be û rasterast ji kesê din re were pêşkêşkirin, ji ber ku wergîrek heye ku di hin awayan de vala ye, divê ev şîret bi baldarî were dayîn. Di kirdeya hoşdarîkirinê de axêver ji guhdêran daxwaz dike ku di pêşerojê de hin çalakîyan pêk bîne, ji ber dizane ku ev yek ji bo guhdêran baş e û di berjewendîya wî de ye, loma ew dike, anku axêver guhdêrî araste dike ku beşdarî çalakîyek paşerojê ya taybetî bibe, ji ber vê yekê ew hestên guhdêrî diazirîne, yanî gava ku xebardar şîretan li kesê din dike ku tiştêkî bike, çimkî ew ji bo guhdêran baş e (Se'îd, 2021: 161-162). Netemambûna pêzanînan cewherê mirov e, mirov hev temam dîkin, şêwirmend bi hêsanî agahdarî û rêya rast bo mirov peyda dîkin (Omer, 2011: 26). Bi vê wateyê li dinyayê mirovên kamil nînin, her kes hewcedarê hev in, ji ber vê yekê şêwirmend ne şert e ku kesek navdar, zana an xwendevan be, di civakê de hemû kes dikarin şîretan bidin, bêyî ku bi temen bin, kesê ku bi sîngê fireh şîretan werdigire û pê tev digere, nîşana jîr û zîrekîyê ye.

Mijar çi be bila bibe ger were xwendin û lêkolînkirin, çend pirs derdikevin holê, divê ew li bersiva van pirsan bigerin da ku kêmasî û başîyên vê mijarê nas bikin. Kirdeya şîretkirinê mijareke berfireh e, li jorîn bi kurtî hatîye ravekirin û bersiva hin pirsan hatîye dayîn, ji bilî ya jorî pirseke din jî balê dikişîne: Stûnên şîretê çi ne? Ev û gelek pirsên din ên balkêş me mecbûr dîkin ku bi hûrtir nêzîkî mijarê bibin da ku giringî û giranîya mijarê fam bikin. Pîranîya zimanzanan hemfikir in ku şîretkirin li ser sê stûnan hatîye avakirin:

1. Şîretkar: Kesê ku şîretan dike.

2- Şîretlêkirî: Kesê ku şîretkar şîretan lê dike.

3. Mijara şîretê: Name yan peyama ku şîretkar pêşkêşî şîretlêkirî dike (Omer, 2011: 25) Ev nêrîna pîranîya zimanzanan e, lê heke hûn ji nêz ve li stûnên kirdeya şîretkirinê binêrin, dîyar dibe ku pêdivî ye ku stûnek din were zêdekirin, ew jî rengvedan (refleks) e, ji ber ku dema şîret tê kirin, amancek şêwirmend heye û şêwirmend li benda encamê ye, erê guhdêr çawa wergire û dê bandorek çawa li ser guhdêran bike? bi vê wateyê kirdeya şîretkirinê dikeve bin kirdeyên pêkanînê de.

Hoşdarîkirin û şîretkirinê têkilîyeke xurt bi hev re heye, ji ber ku her du jî ji bo berjewendîya guhdêran dixebitin, lê ferqa di navbera wan de ew e ku nameyên hoşdarîkirinê peyama rastîyê vedigirin, ta radeya ku gelek caran xetereya xebatê, anku alîyê neyênî yê guhdêran nîşan didin, lê nameyên şîretkirinê bi gelemperî peyamên erênî digirin, wekî van hevokan:

Destê xwe nede agir, wê bişewite. “Hoşdarîkirin”

Xwendin pašeroja mirov xweş dike. “Şîretkirin”

Hoşdarîkirin û şîretkirinê yek meqsed heye, guhdêrî razî bike ku tiştêkî bikêrhatî bike, nameyên van her du kirdeyan van peyam û mebestan digirin: Hoşdarî, şîret, agahdarî, soz, pêşnîyar, qedexe, gilî..., ev çende dîyar dike ku ev her du kirde di çarçoveya kirdeyên arastekirin, encamdan-pêkanînê û nîyetê de ne. Êstin dibêje: Kirdeya Hoşdarîkirin û şîretkirinê têkilîyên baş hene, carinan nêzîkî hev in û carinan jî ji hev dûr dibin, her du jî wekî pêkhateyên kirdeyên pêkanînê tene destnîşankirin (Elî, 2022: 37). Şîret di jîyana rojane ya mirovan de karekî giring e, pir kes vê yekê wekî dibistanekê dibînin, ku bi rêya wê karûbarên mirovî çêtir tene kirin. Gava ku kesek agahdarî dide, ew derfetek e ku meriv li ser jîyanê bêtir fêr bibe, cîmkî şîret ew e ku meriv li ser tiştê ku divê ji meriv re bihête kirin, dê ramanekê bide meriv, an jî di rewşek taybetî de meriv çawa karekî taybetî bi rê ve dibe (Farnia, 2014: 426), wekî van hevokan:

Bi serê xwe tu biryaran nedin. “Hoşdarîkirin”

Guh bidin biryarên mamoste. “Şîretkirin”

Ev her du hevok hilgirên peyamên hoşdarîkirinê ne. Di hevoka yekem de axêver dixwaze guhdêran hişyar bike, ger hûn ji mezinan nepirsin, tu qeraran nedin, çîmkî hûn

dê bikevin tengasîyê û zirarê bikin. Di hevoka duyem de axêver divê nîşanê guhdêran bide ku mamoste pispor û zane ne, çêtir e ku meriv şîretan ji wan bigire û şîretên wan bişopîne da ku serketî bin. Austin dibêje: Şîret kirdeyek bimebest e, pejirandin an redkirina şîretan kirdeyek bibandor e, ji ber ku bi vî awayî bandora kirdeya ziman li ser guhdarîkirinê tê xuyakirin, ev nêrîn îşaret bi du xalan dike:

1. Rola şîretan di zimên de: Di vir de şîret yek ji giringtirîn kirdeyên axaftinê tê hesibandin.

2. Amajekirin bi bandora şîretan: Anku li cem guhdêran karvedanekê çêdike, ku pejirandin an jî redkirin e (‘Ebdula, 2016: 7-8), bi vê wateyê kirdeya şîretkirinê wekî hoşdarîkirinê bandorê li ser guhdêran dike. Dema ku axêver şîretan pêşkêş dike, guhdêr wan şîretan bilind dinirxîne, lê carinan berevajî vê yekê rast e; mînak:

Destê xwe nede destê wî, çimkî ew xapînok e.

Di vê hevokê de axêver şîretan li guhdêr dike ku hay ji xwe hebe û ji wî kesî bawer neke, ji ber ku ew ne mirovekî baş e, belku mirovekî xirab e. Du karvedan hene, ya yekem ger derkeve holê ku ew kes xapînok û xirab e, guhdêr wê spasîya şêwirmendê xwe bike, ya duyem heger xuya bike ku ew mirovekî baş e, guhdêr dê gilî ji şîretkar bike (Elî, 2022: 10-11). Ev ji bo kirdeya hoşdarîkirinê jî rast e, di hoşdarîkirinê de vê yekê bi asta zanîn û têgihîştina guhdêran ve girê didin. Ev nîşan dide ka çi qas agahdarîya wî li ser guhdêr heye, ji ber vê yekê pêdivî ye ku axêver di derheqê hawirdora guhdêrî de xwedan zanînek baş be, divê asta têgihîştina guhdêr bizanin û li gorî wê peyamên xwe pêşkêş bikin. Di jîyana civakî de kirdeyên axaftinê bi gelemperî her tim pir giring bûne, lê piştî hatina olan ev yek zêdetir ketîye nav bîr, bawerî, jîn û jîyara mirovan de wekî ku Pêxember (Sxl) gotîye: “el-Dîn en-nesîhe”, yanî dîn şîret e, van raman, tewsiye û şîretên olî hemû qadên jîyanê û civakê digire nava xwe û civakê ber bi jîyanek çêtir û asoyên geştir ve dibit (Omer, 2011: 23), Bi vê wateyê ol ronahîya jîyanê ye. Hinkle dibêje: şîret kirdeyeka axaftinê ya tevlihev e, divê bi hişmendî were sepandin, axêver divê piştrast be ku guhdêr wê tiştê ku tê şîretkirin bike, ji ber vê yekê divê nameya şîretê sivik be, herweha divê şîret ne ewqas tund be ku guhdêr bifikire ku tiştê ku tê pirsîn di berjewendîya axêver de ye (Elî, 2022: 12-13). Ev çenda li jor hatî gotin hemû li ser esasê hoşdarîkirinê tê pêkanîn. Lîç dibêje:

Kirdeyên hoşdarîyê û şîretê hevwater ne, ji hêla rêzimanî ve diçin nava zêdetir ji cureyekê de, yan ew kirdeyên pêkanînê ne, an jî kirdeyên arastekirinê ne (Elî, 2022: 37). Tiştê ku me di derbarê şîretan de gotîye di hoşdarîyê de jî tê dîtin û di nava piranîya kirdeyên axaftinê de hene, ji ber ku hemû kirdeyên axaftinê nêzîkî û dûrî di navbera wan de heye.

Berî ku vê kirdeyê biqedînin, mijarek giring dimîne, ew jî “Cureyên kirdeya şîretkirinê” ne. Gelek aliman behsa cureyên şîretkirinê kirine û her yekî li gorî nêrîna xwe ew li ser çend cureyan dabeş kirine, lê heke em wekî kirdeyeke zimanî şîretkirinê bidin xuyakirin, dabeşkirina ji hemûyan baştir ew e ku em dabeşî du cureyan bikin:

1. Şîreta Rasterast: Ev cure şîret bi rêya forma hevokê wekî şîret tê zanîn, ew gava ku form di hevokekê de yan di nameyeke şîretkirinê de xuya dibe ku şîretan îfade dike.

Şîreta min tu li vir nemîn.

2. Şîreta Nerasterast: Ev şîret di hevokê de bi rêya formî dernakeve, lê pêwîst bi hawirdorê heye da ku bigihîje amana xwe ya veşartî. Anku divê hevok an name bi derdorê re tevlihev bikin da ku em wateya wê bibînin, bi gelemperî du cureyên kirdeyên şîretkirinê hene. Di encama tiştên ku di derbarê van her du kirdeyan de hatine nîqaşkirin, em dikarin bigihîjin wê encamê ku hoşdarîkirin û şîretkirin du kirdeyên cuda ne, lê di wate û erkan de yek in, yanî du laş in di heman qalibê de.

2.5.2. Kirdeya Hoşdarîkirin û Kirdeyên Arastekirinê

Kirdeyên arastekirinê wekî beşek giring a tewrîya kirdeyên axaftinê tê naskirin, ev nav ji alîyê Sîrêlî ve lê hatîye kirin, Searle kirdeya arastekirinê wekî bikaranîna hêz û bandora pileyan daye xuyakirin, ev hewldanên axêverî ne ku guhdêran razî bikin ku di pêşerojê de çalakîyek pêk bînin. Kirdeyên axaftinê yên arastekirinê hewldaneka axêveran e, ku hêzekê bikar tîne, da ku guhdêr tiştê bike, anku guhdêran han dide ku karekî dîyarkirî bike û pirî caran jî ev kirde taybet bi axêverî ye (Mey, 1993: 164). Axêver xwedî hizrek e û dê bi awayekî gelek baş arasteyî guhdêran bike, amanc ew e ku guhdêr tiştê bike û naveroka vê hizrê dê biryarê bide, ka ev tişt hatî pêşkêşkirin dikeve bin kîjan kirdeya arastekirinê.

Kirdeyên axaftinê yên arastekirinê ew in ku tê de axêver hewl dide ku guhdêrî araste bike, da di pêşerojê de pêkanîna çalakîyekê bike û şertê bingeînê ê kirina vê çalakîyê rastgoyî û dilsozî ye (Elî, 2022: 27), Bi vê wateyê dema ku axêver peyamekê dide guhdêr, divê di peyamê de hin taybetmendîyên baş hebin, da ku morala guhdêr bilind bike, ji bo kirina vê yekê, kirdeyên arastekirinê tê wê maneyê ku axêver peyamekê arasteyî guhdêran dike, di vê peyamê de dibe ku mijarek hebe, dibe ku daxwazek, ferman an hoşdarîyek be, her yek ji van kirdeyan dikare hinek ji vê peyamê bigihîne guhdêr, çi bi hoşdarîkirin, şîretkirin, nîqaşkirin an jî pêşnîyarkirin. Li gorî van kirdeyan dê biryar bê dayîn ku ev yek bi çi mebestê û di berjewendîya axêver an guhdêran de ye, bi vê re jî her du kirdeyên nîyetê û pêkanîna di hundirê kirdeya arastekirinê de tene dîtîna û rola xwe dilîze. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku kirdeyên axaftinê mîna zincîrekê ne, ku hevdu temam dikin û her yek li gorî hewcedarîyê ya din temam dike.

Kirdeyên arastekirinê ne tenê kirdeyê zimanî ne, di heman demê de yek ji erkên zimanî ye jî. Ew ji bo peywendîya di navbera axêver û guhdêran de tê bikaranîn û ev e ku têkilîyên civakî çêdike, yek ji awayên sereke yên gerdûnî yên bikaranîna ziman bi kirdeyên arastekirinê ne, ku naverokê dihewîne û guhdêrî arast e dike ku tiştê bike. Kirdeya arastekirinê jî arastekirina peyvê ber bi peyveke guncay ve dihewîne. Di mijara arastekirinê de berpirsîyarîya pêkanîna rast dikeve ser milê guhdêran, anku dema axêver peyveke arastekirinê hildibijêre, divê bizane ku arastey guhdêrî dike. Anku ev çalakî ji bo guhdêrî tê pêşkêşkirin. Ji ber vê yekê axêver divê di hildibijartina kirdeya arastekirinê de baldar be, çimkî hin kirdeyên arastekirinê bêtir bandorê dikin. Bi wateyek din hin ji wan rasterast bi arastekirinê ve girêdayî ne, wekî kirdeya fermankirinê, hinek nerasterast bi arastekirinê ve girêdayî ne, wekî kirdeyên qedexekirin, hoşdarîkirin, şîretkirin (Elî & Xelîl, 2019: 451-452). Amanca kirdeya arastekirinê ew e ku axêver hewl dide ku guhdêr tiştê bike yan jî bandorê li guhdêr bike ku tiştê bike. Ji ber vê yekê ev rênîşandan dikare wekî pêşnîyarek nerm an jî wekî fermanek hişk be (Elî & Xelîl, 2019: 452). Amanca vê yekê îsbatkirina gotinan bi kirinan e. Kirdeyên arastekirinê pir giring in û piranîya kirdeyên din jî di nav xwe de digirin, kirdeya arastekirinê ji destpêka tewrîya axaftinê ve tê nîqaşkirin, lê zimanzanan guh nedaye vê pratîkê û hîna jî rola wê bi tevahî nehatîye famkirin.

Searle van kirdeyên arastekirinê bi nav dike, ew dibêje hêza sepandina van kirdeyan bi rastî bi axêveran ve girêdayî ye, axêver hewl dide ku guhdêrê araste bike ku tişteki bike. Gelek kirde di bin çarçoveya kirdeyên arastekirinê de ne, hin ji wan ev in: Pirs dike (ask), fermanê dike (order), rêberîyê dike (command), daxwaz dike (request), hêvî dike (bey), îfade dan (plead), mêvan dike (invite), şîret dike (advice), parparê dike (entreat) (Searle, 1979: 13-14). Austin kirdeyên arastekirinê bi biryardanê (Exercitives) nav dike û dibêje ku her yek ji van kirdeyan biryarek ji bo berjewendî yan li dij tevgerêk taybetî dide, Austin lîsteyek ji kirdeyên arastekirinê re danîye, ku 42 kirde ne. Hin ji wan: Fermanê dike (order), lava dike (pray), hewl dide (urgve)...hwd (Austin, 1962: 155). Ji bilî van her du zimanzanan gelek zimanzanên din jî kirdeyên ku dikevin çarçoveya kirdeyên arastekirinê de dabeş kirine, her yekî ji wan hin kirde destnîşan kirine, ev dabeşkirin li gor dîtinên kesane ne, anku bi awayekî standart nehatine dabeşkirin.

Axêver divê li ser hawirdora guhdêrî xwedan zanînek baş be, heta ku peyamên li dor kirdeyên arastekirinê werin pêşkêş kirin. Divê peyam kurt û zelal be, ne tevlihev be, herweha divê vê peyamê bi hin ramanên ku dê morala guhdêran bilind bike bixe nav xwe, ji bo ku axêver çî bixwaze were kirin. Ji ber ku guhdêr navenda vê kiryarê ye, dema ku axêver peyama xwe pêşkêşî guhdêran dike, divê guhdêr van tiştan bike:

1. Divê guhdêr kirdeya axaftinê pêk bîne.
2. Di netîceya desthilatdariya axêver de li ser guhdêrî, kirde bi cidî têne kirin, wekî: qedexekirin û kêfgirtin.
3. Divê guhdêr bigihîje asta bawerîyê ji bo pêkanîna çalakîyê, wek: Lêborîn xwestin an destûrdan.
4. Divê guhdêr mejîyê xwe bi kar bîne û van kirdeyan bike, wek: Şîretkirin û hoşdarîkirin (Elî & Xelîl, 2019: 454). Di encama tiştên ku di derbarê kirdeyên arastekirinê de hatine nîqaşkirin, dîyar dibe ku kirdeyên arastekirinê ew kirde ne ku têne kirin, bi arastekirina kiryarekê ji guhdêr re, ku berhema daxwaz û ramanên axêverî ye û ev jî nîşan dide ku asta jîyana guhdêrî ya axaftvan bilindtir e, çî di warê rêz, temen, civakî, zanistî de ji ber vê yekê ji guhdêr dixwaze, dema ku ew kirde pêk tê guhdêr hewceyê agahdarî û

rêberîyê ye, ji bo ku ev yek bigihîje amanca xwe, bi kirdeyê dê were dîyarkirin ka di berjewendîya axêver de ye yan di berjewendîya guhdêr de ye.

Kirdeya arastekirinê bi gelek awayan tê dabeşkirin, lê ya çêtirîn ev e ku ew du cure ne:

1. Kirdeyên Arastekirina Rasterast: Ev kirde yekser bi nav û naxê arastekirinê ve girêdayî ye, anku bi naveroka kirdeyê re, wekî kirdeyên daxwazkirin, fermankirin, agahdarkirin, hoşdarîkirin, pêwendîya wê ya teqez heye, wekî van hevokan:

Dixwazim ev kar were kirin. “Daxwazkirin”

Ferman dikim, xanî were avakirin. “Fermankirin”

Hişyar be, şofêr xwe hînî ajotinê dike. “Hoşdarîkirin”

Agahdar be, çejin nêzîk bû. “Agahdarkirin”

Ger em li van hevokên li jor binêrin, dîyar dibe ku rasterast bi naveroka hevokê re têkilîyek heye, çimkî di van hevokan de lêkerên ferman, daxwaz, hişyarî û agahîyê hene.

2. Kirdeyên Arastekirina Nerasterast: Ev cure kirde rasterast nakeve nav tevgera arastekirinê, lê ew bi arastekirinê ve girêdayî ye, wekî kirdeyên qedexekirin, şîretkirin, pîrskirin..., wekî van hevokan:

Çixare vexwarin nabe. “Qedexekirin”

Siba zû rabî baş e. “Şîretkirin”

Çima kurd ne yek in? “Pîrskirin”

Ev hevok rasterast maneya arastekirinê nakin, lê hemû hilgirê amanca ne û ramanên veşartî hene (Elî & Xelîl, 2019: 457-458), Bi gelemperî û zanistî, du cure kirdeyên arastekirinê hene, ger pîrsek derkeve holê, çima hin zimanzan wê dikin deh cure û yên din dikin şeş? Dema ku em li van her du cureyên sereke dinêrin, me behsa hemû cureyên din ên zimanzanan kirîye, yên wekî: Arastekirina ferzskirinê, arastekirina daxwazskirinê, arastekirina derûnnasî, arastekirina fermanî, arastekirina pêşkêşskirinê...,

ew di hundurê her du cureyên serekî de têne dîtin, ji ber vê yekê divê em ji xwendvanan re hêsan bikin da ku zimanî pêşve bibin.

Kirdeya hoşdarîkirinê di nava kirdeyên axaftinê de pir giring e, wekî kirdeyeke xwedan bandor e di nava kirdeyên arastekirinê de, çimkî çarçoveya kirdeya hoşdarîkirinê berfireh e û piranîya kirdeyên din xwe di nav kirdeya hoşdarîkirinê de dibînin. Bac û Harîş du zimanzanên mezin in, dibêjin ku hoşdarîkirin beşek ji kirdeya arastekirinê ye (Elî, 2022: 37). Çimkî hoşdarîkirin ji bo pêşkêşkirina nameyên hoşdarîyê ji guhdêran re tê bikaranîn, ku ew di derbarê mijarek giring de agahdarî bide. Kirdeya hoşdarîkirinê wekî kirdeyeka arastekirinê tê hesibandin, çimkî ew guhdêr mecbûr dike ku guhdarîya tiştên ku jê re têne pêşkêşkirin bike, ev yek xwe dispêre agahîyên pragmatîkê (Silêman, 2021: 74). Kirdeya hoşdarîkirinê wekî kirdeya arastekirinê dibe du cureyên sereke. Lîç dibêje: Kirdeya hoşdarîkirinê beşek giring a kirdeyên arastekirin, îsrarkirin û pêkanînê ye (Leech, 1983: 208) Ev nîşan dide ku hoşdarîkirin kirdeyek giring e û ev jî nîşan dide ku her nameyeka hebe du kirdeyên giring pêk tîne, gava ku axêver nameya hoşdarîkirinê pêşkêşî guhdêran dike, ew li ser guhdêran tekez dike, ku tiştê jê tê xwestin bike, amanca vê yekê ew e bi nameyên arastekirinê re kirdeyên îsrarkirinê û pêkanînê jî bi hev re tên kirin, di vê hevêşeyê de axêver kirdeya arastekirinê û îsrarkirinê dike, lê kirdeya pêkanînê guhdêr dike. Hoşdarîkirin gotinek amandardar e ku ji kesê din re tê gotin ku hişyar be, ev wekî şîret an hoşdarî yan jî pêşnîyar tê arastekirin, wekî vê hevokê:

Hişyar be, qala milletê min neke, nexwe ezê te bikujim.

Ew hevok peyamek e ji guhdêr re û îsrar dike ku ew behsa milletê me neke û wî hişyar dike ku guhdarî bike, heger tiştê jê re tê gotin neke, wê guhdêr bikuje.

2.5.3. Kirdeya Hoşdarîkirinê û Kirdeya Têkçûna Rû

Kirdeya têkçûna rû ji tewrîya rêzgirtinê ya her du aliman Brown û Levinson di sala 1978an de hatiye dariştin û ji hingê ve bi berfirehî hatiye pêşxistin. Peyva rû (face) bi têgeha rêzgirtinê ve girêdayî ye, bi vê wateyê rû peyvek teknîkî ye û amaje bi wêneya kesayetîya axêverê dike, ew hestên kesane yên sozdarî û civakî yên ku her kes heye vedibêje û tê hêvîkirin ku yên din jî fam fam bikin (Elî, 2020: 221), Bi vê wateyê rû

nasnameyeke şexsî ye û bi îşaretan tê îfadekirin, anku ne hewceyê gotinê ye. Bi dîtina Gofmanî, rû nirxa erênî ya civakî ye ku em ji derdora xwe distînin, mirov vê nîrxê bi awayekî aktîf dixwaze (Watts, 2003: 124). Kontrolkirina vê nîrxê di destê mirov de ye, yanî berpirsîyarê rûyê xwe ye, hûn çawa nîşanî mirovan bidin hûn dê bi wî rengî werin naskirin. Rû wêneyê ku em dixwazin mirov wekî beşek ji nasnameya me nas bikin (Dharma, 2016: 33), tiştê ku hatî gotin li dûr rû bû, ji ber ku eger rû neyê naskirin, kirdeya têkçûna rû wê şêlî be, anku wateya wê dernakeve holê.

Kirdeya têkçûna rû ew kirde ku bi awayekî bingeşîn û sereke bandorê li rûyê axêver û guhdêran dike, ew di çarçoveya tevgerên li dij daxwazên kesên din de pêk tê, piranîya kirdeyên têkçûna rû bi devkî tene dîyarkirin û di çarçoveya taybetmendîyên axaftinê yê wekî rîtim, dûrketin û cudahîyên vegotinê de tene veguhestin, carinan bi kirdeyên nedevkî jî tene îfadekirin (Cemîl & Elî, 2021: 95-96). Têkçûna rû dema ku tevger li dij xwestina axêver û guhdêrî be çêdibe, ev xwestek wê li rûyê wan xuya bibe û ev nîşana wê yekê ye ku ev gotin ne li gorî ramanên wan e, rûyê wan dê têk biçe, lewra ev têkçûn yan jî bo bextewarîyê ye yan jî ji bo nexweşîyê ye. Kirdeya têkçûna rû ji ber du sedeman çêdibin:

1. Parastin: Ev ji bo parastina ava rûyê kesan dixebite.

2. Pêşîlêgirtin: Ev ji bo parastina ava rûyê kesên din dixebite (Elî, 2020: 221). Mebesta van her du sedeman ew e ku rûyê mirov dê her dem li hember her tevgerekê bertek nîşan bide, li vir em bi gelemperî behsa axêver û guhdêrî dikin, wekî vê hevokê:

Hişyar be, ev kar dubare nebe.

Wekî ku di vê hevokê de dema ku axêver vê gotinê pêşkêşî guhdêr dike, heke guhdêrî tiştek xelet kiribe, têkçûna rû ya neyênî wê di guhdêr de dîyar be û têkçûna rû ya erênî dê di axêver de dîyar bibe, ji ber ku wî nameya hoşdarîyê pêşkêşî kesê rast kirîye, eger berevajî be, anku guhdêrî ev kar nekiribe, wê xwe biparêze, yanî di axêver de têkçûna rû ya nerênî dê çêbibe û di guhdêr de jî têkçûna rû ya erênî dê çêbibe, çimkî guhdêr bêguneh e û wî tu tiştek xirab nekirîye.

Kirdeya têkçûna rû xwe dispêre sê cureyên têkçûnên rû, ew jî ev in:

1. Têkçûnên rûyên bi merem û meqsetdar: Di vê cureyê de nîyeta dijminatî û êrîşkarîyê heye, wek:

Ez dê te ceza bikim, ger tu karê xwe nekî.

Axêverî bi merem gotîye guhdêrî “ez dê te ceza bikim” da ku rûyê wî tîk biçe.

2. Têkçûnên rûyên ji nişka ve çêdibin: Di vê tîkçûnê de plana êrîşê nehatîye çêkirin, lê tîkçûna rû ji encama kirdeyên nedîyar çêdibe, wek:

Ger herî cem wî, tu dê poşman bibî.

Di vê hevokê de tîkçûnên rûyê guhdêr bi merem nebûn, anku ew ji nişka ve xuya bûn.

3. Têkçûnên rûyên bê mebest: Axêver bêguneh xuya dike, sûc û êrîşên wî bê mebest bûne, wek:

A. Ez êdî bi te re napeyivim.

B. Tu şaş î.

Di bersiva B ji bo A de tîkçûneke nexwestî heye, her çend ne ji bo wê amancê jî be, lê formê hevokê ji yek ravekirinê zêdetir heye, ev yek dibe sedema tîkçûnê, ew ravekirin jî ev in: “Tu şaşî, bila dilê te bimîne”, “hûn xelet in, lewra min kir” (Norî, 2021: 63).

Kirdeya tîkçûna rû wekî hemû zanist û kirdeyên din bi gelek awayan hatîye dabeşkirin, lê ya rast ev kirde jî dibe du cure, bi vî awayî:

1. Tîkçûna rûyî ya erênî: Rûyê erênî wel guhdêrî dike da ku hest bi başî û xweşîyê bike. Gava ku axêver piştgirîya xwe pêşkêşî guhdêrî dike, ev yek ji ber rêza axêverî durist dibe û ewî li cem guhdêrî hezkirî û hêja dike, çimkî di vir de axêver tişteki berevajî daxwaz û dîtînen guhdêr nabêje, ji alîyê din ve jî, eger guhdêr rêzê li peyama axêverî bigire û bi cih bîne, wê demê dê axêver xwedîyê rûyekî erênî be (Norî, 2021: 64).

2. Tîkçûna rûyî ya neyênî: Rûyê nerênî guhdêrî mecbûr dike ku hest bi hêrsbûn, reşbînî, bêhurmetî û diltengîyê bike. Ev jî bi rêya guhnedana wî, an jî wî ji kirina tiştan

bihêle an lêborînê jê nexwaze yan jî ji bo xebata wan spasîya wan nekin an zextê li wan bikin ku tiştekî ku li dij ramanên guhdêran bikin û wan bişkînin, yanî rûyê nerênî destwerdana nav kar û barên xelkê dike û zimanekî ne guncaw bi kar tîne (Elî, 2020: 222), Bi vê wateyê rengvedana rû di civakê de îfadeya kesayetî ye û bi awayê axaftinê ve girêdayî ye, ka ev rû dê erênî be yan nerênî be.

Ya jor kurteyek giring a kirdeya têkçûna rû ye, li vir em ê li ser têkilîya van her du cureyan nîqaş bikin. Kirdeya hoşdarîkirinê bi her du cureyên kirdeyên têkçûna rûyê ve girêdayî ye, anku dema ku kirdeya hoşdarîkirinê tê pêşkêşkirin, her du cureyên rû di encama vê kirdeyê de xuya dibin, ev yek bi şewaz û rîtma axêverî û herweha bi çawanîya wergirtina vê yekê ji alîyê guhdêr ve girêdayî ye, bi vî awayî:

1. Eger axêver nameya xwe bi awayekî xweş û bi rêz pêşkêş bike, dema ku guhdêr vê nameyê distîne, dîyar dibe ku nîyeta axêver baş e û ev yek ji bo berjewendîya guhdêr kirîye, ev dê ji bo axêver û guhdêr rûyekî erênî çêbike, wekî vê hevokê:

Hişyar be, bê çek dernekevin

Di vê hevokê de mebesta axêver ew e ku xwe biparêze ji ber ku dizane ku rewş xirab e û dê guhdêr hewceyê çekê be, ev diqewime dema ku nameya hoşdarîkirinê peyamên şîret, rawêj, bîranîn, hişyarî... dihevine.

2. Heger axêver bi awayekî ne xweş û cuda ji nêrînên guhdêr nameya xwe ya hoşdarîkirinê ji guhdêr re şand, dê bertekek xirab li ser rûyê guhdêr derkeve, wê ji guhdêr re dîyar bibe ku axêver bi dilxirabî nameya xwe bi vî awayî pêşkêş kirîye, di encamê de rûyekî nerênî dê li ser rûyê guhdêr derkeve, wekî vê hevokê:

Hişyar be çekî bi te re nebînim.

Di vê hevokê de axêver guhdêrî hoşdar dike, ger carek din çekî pê re bibîne, ew dê guhdêrî ceza bike, ji ber vê yekê rûyê guhdêr nerênî bûye, ev yek çêdibe dema ku di nameyên hoşdarîkirinê de peyamên fermanbaran, daxwaz, tehdîd, tirsandin tînin kirin, bi vê wateyê mirov dikare bibêje kirdeya têkçûna rû ji encama arastekirina nameyên hoşdarîkirinê peyda dibin.

Kirdeya axaftinê ji bilî rola wan a zimanî di civakê de jî pir giring in. Her kirdeyek bi awayekî tê pêşkêşkirin, kirdeya hoşdarîkirinê bi awayên devkî û ne devkî, wekî wêne û lafiteyan tê nîşandan, lê kirdeya têkçûna rû tenê bi rêya ne devkî ye, anku şiklê ku li ser rûyê mirov tê dîtin araste dike. Kirdeya hoşdarîkirinê her tim bi merem tene pêşkêşkirin, yanî her nameyek hoşdarîyê ji bo amancekê tê şandin, lê kirdeya têkçûna rû her gav amancek xwe nîne, ji ber ku pir caran bê amanc xuya dike. Kirdeya hoşdarîkirinê her tim di berjewendîya guhdêran de ye, lê kirdeya têkçûna rû bi nîyeta axêver ve girêdayî ye, çimkî hin caran di berjewendîya axêver de ye û carinan jî di berjewendîya guhdêr de ye.

Her du kirdeyên hoşdarîkirinê û têkçûna rû ji encama têkilîyên dualî derdikevin, anku ji bo ku ev her du kirde bîn kirin divê axêver û guhdêr hebin. Kirdeya hoşdarîkirinê ne hewce ne ku rasterast bîne encam dan, çimkî hin hoşdarî tînin dayîn, lê ji bo bicihanîna wan demeke dirêj lazim e, an jî hoşdarîyên ku bi wêne û reklaman tene pêşkêşkirin pir caran encamên wan nayên zanîn, lê kirdeya têkçûna rûyê rasterast tê bicihanîn, yanî her ku xeber bigihije guhdêran, dê têkçûna rû çêbibe. Kirdeya hoşdarîkirinê ji hemû alîyan ve, çi di nava ziman de yan jî di nava wêjeyê de ji alîyê sînor û giringîyê ve ji kirdeya têkçûna rûyê berfirehtir e. Zimanzanan pir giringî bi kirdeya hoşdarîkirinê daye, lê zimanzanên cîhanê bi gelemperî û zimanzanên kurd bi taybetî giringî bi kirdeya têkçûna rû nedane.

2.5.4. Kirdeya Hoşdarîkirinê û Kirdeya Gefkirinê (Tehdîtîkirin)

Gefkirin kirdeyeka axaftinê ya berbelav e û di piranîya zanistên zimannasî û nezimanî de cih digire. Ji ber vê yekê kirdeya gefkirinê bi awayên ne zimanî jî tê pêşkêşkirin, mîna bi awirên rû yan her tevgerek din a ne devkî, wekî hilgirtina çekan ji bo kesê din. Gefkirin kirdeyeka bi mebest e, ji alîyê axêver ve ji guhdêr re tê pêşkêşkirin da ku bandorê li guhdêran bike, çimkî divê guhdêr karekî pêk bîne, çimkî ev kirde biêş e, pîrsgirêk û xetereyan ji bo guhdêr çêdike, guhdêr jî mecbûr e ku vê kirdeyê ji bo axêverî pêk bîne (Brauch, 2011: 62), Bi vê wateyê gefkirin kirdeyeka amandardar e û li benda encaman e, ev bi zorê tê kirin, ji ber ku guhdêr bi îradeya xwe nake. Di kirdeya gefkirinê de axêver xwedan hêz û baladest e û vê yekê li ser guhdêran ferz dike, herweha hewl dide ku guhdêr guh bide daxwaz û nîyetên wî, şertê serketinê di kirdeya gefkirinê de bi rastî

pêkanîna peyama arastekirî ye (Silêman, 2021: 33), Bi vê wateyê di gefkirinê de axêver xwedî hêz û asteke bilind e, ji ber vê yekê tiştê ku bixwaze guhdêr ji bo wî dike.

Gefkirin kirdeyeka axaftinê ye û mebest ji vê kirdeyê jî gihandina xisar û xirabîyê ye ji guhdêr re (Elî, 2020: 217). Nameyên gefkirinê di berjewendîya axêveran de têne şandin, yanî guhdêr ji bo xizmeta axêveran kar dike. Kirdeya gefkirinê ji cihbicihkirina emrên axêver pêk tê, ji bo ku di guhdêran de tirs û gumanê çêbike, da ji bo xizmeta wê kar bike. Ji ber vê çendê axêver xala lawaz a guhdêr nas dike û desthilatdarîya xwe li ser ferz dike. Gefkirin ji kirdeyên din ên axaftinê tondtir e û bi awazeka pir bilind tê vegotin (Silêman, 2021: 33). Gefkirin bi awayê fermanî ji bo guhdêr tê pêşkêşkirin, guhdêr ditirse ku vê yekê neke, ji ber ku tu çareyek jê re nehiştîye, neçar dimîne vê bike. Tehdîd ew e ku mirovekî hişyar bike ku ew dê were cezakirin, ger ew karek an kirdeyek dîyarkirî pêk neyîne (Wierzbicka, 1987: 187). Di gefkirinê de guhdêr dizane ku eger ew tiştê ku jê tê xwestin neke dê were cezakirin, çimkî di destpêkê de cezakirinê nîşan dide. Tehdîd wekî ferzkirina tiştêkî li ser mirovî ye, nekirina tiştêkî ji bo berjewendiyên mirovî ye (Searle, 1969: 58). Di encama eva li jor de li dor gefkirinê xuya dibe, dema ku nameya gefkirinê tê pêşkêşkirin, peyamek xurt vedigire, heger guhdêr pêşnîyarê wernegire ew guhdêr hoşdar dike ku ew dê were cezakirin û axêver dê jîyanê ji bo wî nexweş bike.

Ezê we bikujin.

Bila navê min neyê, ewê xwe bibîne.

Wekî hemû kirdeyên zimanî, gefkirin jî bi gelek awayan hatîye dabeşkirin, lê bi gelemperî du cureyên wê hene:

1. Gefkirina Rasterast: Di vê cureyê gefkirinê de axêver bi eşkereyî gefê li guhdêrî dike, form û peyvên gefkirinê hene, wek: Aha, êhê, de bila, wey, kuştin, şewitandinn, birîn... , ev jî ji alîyê axêver ve ji bo guhdêran têne pêşkêşkirin (Elî, 2020: 220), wekî vê hevokê:

Hê lawo, ger ev yek carek din biqewime, ez dê çavên te derxim.

Di vê hevokê de rasterast tehdîd heye, ji ber ku peyvên “Hê lawo û çavên te derxim”, ew ji hêla axêver ve bi eşkere hatine pêşkêşkirin.

2. Gefkirina Nerasterast: Di vê cureyê tehdîdê de axêver bi awayekî nerasterast bi guhdêran re radigihîne, di vê gefkirinê de tu form û peyvên gefê nayên bikaranîn, lê derdor di wate û amanca wê de rola xwe dilîze, anku di hawirdora hevpar a di navbera axêver û guhdêran de mebestên weha rave dikin (Elî, 2020: 220), wekî vê hevokê:

Kesên ku dixwazin çîya nehêlin, divê li dîrokê vegerin.

Di vê hevokê de axêver bi awayekî nerasterast dijminê welatê xwe tehdîd dike, dibêje: Kes nikare me ji nav bibe û ji cihê me derxîne, ger ev nîyeta wan heye bila vegerin dîrokê em kî ne û ew kî ne. Gelek cureyên din ên gefkirinê hatine gotin, lê ew hemû diçin bin van her du cureyên sereke de wekî “Cezakirina laşî, cezakirina derûnî, sînardakirina tevgerê, gefên vala, gefên giran...”. Bi awayekî serekî kirdeya hoşdarîkirinê û kirdeya gefkirinê dibin du cureyên sereke, lê name û peyamên wan ji hev cuda ne. Nameyên gefkirinê xurt in û di berjewendîya axêver de ne, lê nameyên hoşdarîkirinê di sivik û bikêr in û di berjewendîya guhdêr de ne.

Di ziman de çend erkên kirdeya gefkirinê hene, wekî:

1. Tirsandin: Ev kirde di guhdêran de tirsandinê çêdike.

2. Peymandan: Gefkirin li ser axêverî peyman e, ji ber ku axêver soz dide ku ger guhdêr tiştê ku tê pêşkêşkirin neke, dê were cezakirin.

3. Ferman dan: Gefkirin li ser guhdêrî ferman dan e, ji ber ku bi zorê guhdêr tiştêkî dike yan nake.

4- Zirargihandin: Gefkirin bi xwe ji bo guhdêrî zirar e, vêca çi zirara laşî be yan jî ya derûnî be.

5. Desthilat: Kesê ku bi gefkirinê radibe di destê wî de hêz û desthilat heye û desthilatdarîya xwe li ser guhdêran ferz dike (Silêman, 2021: 45). Di derbarê erkên hoşdarîkirinê de her wekî erkên gefkirinê ne, lê di kirdeya gefkirinê de ew hemû bi hev re dixebitin da ku peyamên tehdîdkirinê xurt û zirardar bikin ku guhdêr guh bidin wan, cîmkî gefkirin giringî bi guhdêrî nake û her tim di berjewendîya axêver de dixebite, ev berevajî hoşdarîkirinê ye, cîmkî hoşdarî bi tevahî dixebite, ji bo hoşdarîkirinê hêsantir û alîkartir

bike, bi vê wateyê hoşdarî ji bo rênîşandana guhdêrî, lê gefkirin ji bo astengkirina guhdêrî tê bikaranîn.

Lêkolîna kirdeya axaftinê ya gefkirinê bi gelemperî di pragmatîka zimanê de tê kirin. Piraîya lêkolîneran gefkirinê bi kirdeya qedexe “Tabo” dihesibînin, wekî tevgerêke bi merem ya wêranker (Artis, 2018: 208). Her nêrîna li dor gefkirinê hebe, ger hûn lêkolîn bikin, hûn dê bibînin ku hin wekhevî û cudahî hene, wekî vê gotina li jor, ew bi kirdeya hoşdarîkirinê ve girêdayî ye, ji ber ku hoşdarî jî dikeve nav lêkolîna pragmatîka zimanê, cudahî ew e ku hoşdarî ne kirdeyeka qedexe ye û nîyeta wêranker tune ye, belê ew kirdeyeka sûdmend û destûrdar e ku xweş tev digere û encamên baş û rehet li pey xwe dihêle.

Gefkirin mîna hoşdarîkirinê bi kirdeyên arastekirinê tê pêkanîn, lê di gefkirinê de kirdeya fermanî jî tê têkelkirin, wekî vê hevokê:

Karê xwe biqedînin an ez heqê we nadim.

Li vir bi awayê fermananî gefkirina nerasterast hatîye kirin, lê ger em peyvên fermanê ji vê hevokê derxin, ew ê hoşdarîkirinek be û şirovekirina wê bi derdora wê re dimîne. Nêrînek heye, dibêjit: Kirdeyên wekî jivandan û hoşdarîkirinê ji bo pêkanîna gefkirinê tene bikaranîn û ev jî nîşan daye ku kirdeya tehdîdê bi amanca tehdîdê neyê bikaranîn, wekî din kirdeyên hoşdarîkirinê û jivandanê dikarin ji bo îfadekirina gefkirinê yan ragihandina gefkirinê werin bikaranîn (Silêman, 2021: 37), wekî van hevokan:

Ez soz didim, we tune bikim. “Sozdan wekî kirdeya gefkirinê”

Ger tu li vir xanî çêbikî, ez dê te bikujim. “Hoşdarîkirin wekî kirdeya gefkirinê”

Ger ev nêrîn were rastkirin, dê zêlê bibê ku sînoren hoşdarîkirinê di ziman de ji sînoren gefkirinê pir firehtir in, Ji ber vê yekê hoşdarîkirinê dê çawa were bikaranîn ji bo pêkanîna gefan? Ya rast ku meriv bibêje nameyên hoşdarîkirinê peyamên tehdîdê hildigirin, bi vî rengî gefkirin jî tê pêşkêşkirin, delîlên vê yekê dema ku guhdêrî karvedan hebe û bersiva van her du hevokan bi gefkirinê were dan, dê bibêje:

Min tehdît neke.

Ûstin kirdeya gefkirinê di kirdeyên peymanê de vedihewîne, lê Sîrêl kirdeya gefkirinê di kirdeya mecbûrîkirinê de vedigire (Silêman, 2021: 37). Kirdeya hoşdarîkirinê jî bi van her du kirdeyan re tê tevlihevîkirin, lê amanca hoşdarîkirinê û gefkirinê ji hev cuda ye, gefkirin mîna hoşdarîkirinê bi rêya zimanê û nezimanê jî tê pêşkêşîkirin, anku ne hewce ye ku kirdeyek devkî be, lê bi sembolên ne zimanê jî dikare were pêşkêşîkirin, wek: Posteran, livandina rû, îşaretan, bilindîkirin an hejandina destan û nîşandana çekan.

Kirdeya gefkirinê du xalan îfade dike, anku di kirdeyên gefkirinê de du wate hene:

1. Fermanan: Gefkirin peyamên fermanê hildigire, ji ber vê yekê çî ew eşkere be çî jî veşartî be, mebesta vê yekê guhdêr tiştêkî pêk bîne.

2. Sozdana bi cezakirinê: Gefkirin ji aliyê axêver ve dibe sozek ji guhdêr, çî eşkere be çî jî bi dizî, dê guhdar bê cezakirin (Elî, 2020: 219), wekî vê hevokê:

Ger tu nimêj nekî, ez dê te ji malê derxim.

Di vê hevokê de gefkirin ji bo nimêjê ferman e, herweha di vê hevokê de jî sozek heye, eger nimêj neke dê ji malê bê derxistin, ev yek di nameyên hoşdarîkirinê de jî dîyar dibe, lê bi awayekî zelal û siviktir. Bi vî awayî: Nameyên hoşdarîkirinê fermanê li guhdêrî dikin, ger ew tiştê ku jê tê xwestin bike, ew dê di pêşerojê de sûd wergire, sozdan bi encameke baş, hoşdarî ji aliyê axêver ve dibe soz, ger ew tiştê ku jê tê xwestin bike, ew dê xelata xwe bistîne, hoşdarîkirinê her tim encamên baş hene, wekî vê hevokê:

Ger hûn nimêjan bikin, hûn dê herin cenetê.

Ferman bi awayê sedem û encamê ne, ger nimêj bike netîce dê cennet be, bi vî awayî vê hevokê xwe ji erka fermanê rizgar kirîye, herweha soz dide ku eger hûn nimêja rast bikin, hûn dê biçin cenetê, li vir soz ji bo xelatkirina guhdêrî tê bikaranîn, lê di gefkirinê de soz, guhdêran ceza dike.

Hoşdarîkirin û gefkirin ji aliyê amanc, taybetmendî û encaman ve du kirdeyên ji hev cuda ne, lê ji ber ku ev her du kirdeyên axaftinê ne û bi nameyên hevdu re têkel in, ji ber vê yekê wekhevî û cudahî normal in. Watson dibêje: Kirdeya axaftinê ya gefkirinê û kirdeya hoşdarîkirinê, têkilîyeke wan a xurt bi hev re heye, di şirovekirina Watson a kirdeyên tehdîtîkirin û hoşdarîkirinê de tenê guh nadin awayê axaftinê, ew ji bo amanca

pêşkêşkirina gefê tên bikaranîn, lê di heman demê de bal tê kişandin ser alîyên pragmatîk ên hawirdora axaftinê (Watson, 2000: 127), Bi vê wateyê bi rêya hawirdorê kirdeyên hoşdarîkirinê û tehdîtkirinê ji hev cuda dibin, wekî vê hevokê:

Ger hûn bihên vir, hûn dê werin kuştin.

Di vê hevokê de li gor derdorê navbera axêver û guhdêran de heyî, wateya hevokê dê diyar bibe ka ew hoşdarî ye yan gef e, ger di berjewendîya guhdêr de be, ew dê bibe hoşdarîkirin, lê eger di berjewendîya axêver de be û bi awayê tehdîd û cezakirinê be, ew dê bibe tehdîdkirin.

Kirdeyên axaftinê bi gelemperî bi rêya derdorî ji hev tene cuda kirin, wekî hevokên jêrîn:

Ger hûn nexebitin, hûn li vir namînin.

Lingên xwe bixin nav cilên xwe.

Xwepêşandanan bikin an nanê we dê were birîn.

Ev her sê hevok wateya wan li gor wê hawirdora di navbera axêver û guhdêr de dimîne, ji ber ku dema ku em van hevokan li hawirdorê bi cih dikin, dikevin bin qanûnên hoşdarîkirinê û bin qanûnên gefkirinê jî, ev hevok ger di berjewendîya axêver de bin, dê bibine gefkirin, lê eger ew di berjewendîya guhdêr de bin, dê bibin hoşdarîkirin, bi van her du kirdeyan re jî, ev hevok dikevin bin qanûnên kirdeyên din, wek: Daxwazî, fermanî, arastekirin, şîret... .

2.6. Gotinên Mezinan

Gotinên mezinan di folklorê gelan de wekî beşeke giring tê dîtin, herweha yek ji amûrên herî bi nirx ên derbirinê û neynika zelal a şaristanîya gelan e, ev xezîneyek mezin a serpêhatîyên mirovan e, ku hemû kevneşopîyên neteweyan dihewîne. Ji ber vê yekê miletan her tim giringîyeke mezin dane wê, gelek nirxên exlaqî, civakî, siyasî û olî di xwe de dihewîne, anku gotinên mezinan ji bo mirov wekî makeqanûnan in. Her yek ji van gotinên mezinan derseke xweş dide me, ger em li gotinên mezinan binêrin, em ê bibînin ku wan di hemû alîyên jîyanê de cih girtîye û gotinên bikêrhatî ji bo her rewşê hene, ji bo

mebesta hoşdarîkirin û hînkirina kesê din tîn bikaranîn da ku mirov nekeve heman xeletîyên berê yan jî eger ew karekî bike, da bizane dê çawa û ji ku dest pê bike, ji ber ku gotinên mezinan wekî serpêhatîya bav û kalên me yê ku bi devkî ji nifşekî derbasî nifşekî din bûne tîn hesibandin, bi vê wateyê gotinên mezinan serpêhatîyên bav û kalan in.

Di zimanê kurdî de ji bo gotinên mezinan gelek peyv û tîgeh hatine bikaranîn. Çimkî her herêmek li gorî dengnasî û zaravayê xwe peyvek bi kar anîye, weha: Gotinên Mezinan, Gotinên Pêşîyan, Pendên Pêşîyan, Pendî Pêşînan, Pende Bawekan...hwd, ev yek ji ber dewlemendîya zimanê kurdî ye. Di *Ferhenga Kurdistan* de “Gotin” yanî pend tî wateya: Amojgarî, terin, moç, mûçyarî, amojyarî, rîyonî, bela, gêçel, ruşe, karasat, ketin, etik, hetik, serkone, bebîrdin û namûsbîrdinê tî karanîn, herweha peyva “mazinan” tî wateya pêşîyan, bav, kal û rabirdûwan, yanî yê berî me tî, bi gelemperî gotinên mezinan tî wateya axaftin û serpêhatîya mirovên mezin ên berî me (Mokriyanî, 1999: 165). Socadî li ser gotinên mezinan dibêje: Ew hevok in, yanî çend bêjeyên kurt ên kurdî bi hev re hatine nivîsandin û wateyeke bilind di xwe de dihevwîne, ji mêj ve ketine ser zimanê kurdî, awayê jîyanê, urf û bawerîyan çî ji alîyê reftarên sîyasî, civakî, malbatî, dewlemendî û xîzanîyê li cîhanê dîyar dikin (Xankî, 2008: 13). Gotinên mezinan li ser: Heywanan, mirovan, xwezayê, amûran û her tiştî hatine gotin, ji ber vê yekê carinan gotinên ku mirov dibêje pir sivik in, lê xwedî wateyek pir berfireh in, ev gotin ji alîyê mirovan ve tîn gotin û ji mêj ve tîn bikaranîn û hurmeteke mezin li wan tî girtin. Gotinên mezinan berhema kevnar a xelkê ye. Di nav gelên seretayî û sade de felsefeyeke resen e û li ser exlaqê bi bandor e, hemû rastî, hemû bûyerên jîyana mirovan û hemû kirinên baş û xirab ên mîlet li dor bigihîje encamê, bêtî ku li mijar mêze bike, diçe li jêr pîvanên gotinên mezinan (‘Ebdula, 2017: 98), Bi vê wateyê ev gotin berhema zanî û aqilmendîya bav û kalên me ne, ji ber vê yekê, divê ew bi aqilmendî bixwînin û serederîyê pê re bikin.

Gotinên mezinan di bingeha xwe de ji çîrok û serpêhatîyên rasteqîn hatine, ev agahdarî bi devkî tîne şandin û bi rengê kurt û hêsan tîne pêşkêşkirin, amanc ew e ku hemû gel jê sîd wergire. Gotinên mezinan ji bo mîletê şîret û rêberîyê dikin, ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku çendî gotar û şîretên bi bandor û birêkûpêk ên bav û kalên me ne, gelek salan berî niha wekî çandek gihiştine me, di jîyana xwe ya rojane de wekî delîl û

qanûn bi kar tînin û sûd jê girtine (Şarezûrî, 1981: 7). Di serdemên kevnar de jîyan hêsan bû û her tiştê ku dihat bikaranîn berhema wan bixwe bû, ev ders û çîrokên ku wan di bûyer û rewşên cuda de digotin çand û edebîyata wan a wê demê bû, îro jî qanûn û destûr in ji bo ku em jîyana xwe pê bi rê ve bibin. Gotinên mezinan cureyekî edebî ye, ew bi kurtîya xwe, bedewîya wateyê, nazikîya hevgirtinê û rastîya têgihîştina navdar e, tu gel ji gotinên mezin vala nînin, yanî di nav hemû çînên millet de xuya dikin, berevajî helbest û pexşana hunerî ya ku tenê ya çînên jorîn e (Herib, 1999: 146), Bi vê wateyê pêwendî û têkilîya gotinan bi civakê re dîyar dibe, anku ev gotin ji civakê hatine girtin. Milletê kurd rêzê ji gotinên mezinan re digire, di civaka kurdî de em dikarin bibêjin gotinên mezinan mil bi milê bîr û bawerîyên hemî olan, ayetên Qur'anê û hedîsên Pêxemberî (sxl) wekî qanonên civakî û aborî ji bo çareserkirina pîrsgirêkên gel bikar anîne (Şareza, 1976: 12), Bi vê wateyê ev gotin di nav neteweya kurd de qanûn in, bîr û bawerîyên civakî yên neteweyê nîşan didin, pir caran bi van gotinan pîrsgirêkên xwe çareser dikin.

2.6.1. Zimanê Gotinên Mezinan

Di gotinên mezinan de zimanek sade û asan tê bikaranîn, zimanê rojane yê gel, yanî ne zimanekî felsefî ye, vê yekê kir ku di nava gel de belav bibe û bikeve ser zarê her kesî. Çimkî zimanê gel, milkê hemû milletî ye, anku zimanê xwenda, nexwenda, dewlemend û feqîran e. Gotinên mezinan di civakê de derketine, yanî ev gotin berhema raman, dîtin, îdeolojî û têgihîştina netewe ye. Ji ber vê yekê zimanê ku di van gotinan de tê bikaranîn, zimanê rojane yê neteweyê ye, loma jî derbirînê ji nax û dilê millet dike û bi awayekî sivik û hêsan tê gotin, ji bo ku civak bi tevahî têbigihîje û ji bo birêvebirina jîyana xwe bikar bîne. Gotinên mezinan di qonaxên destpêkê yên jîyanê de bi devkî dihatin bikaranîn, heta roja me ya îro bi piranî di nav kesên nexwendewar de tene bikaranîn, yanî di qonaxên destpêkê yên jîyanê de xwendin û nivîsandin tune bû, ji ber vê yekê axaftin bi awayekî melodîk dihate gotin, anku gotinên mezinan rîtmîk in, ew bi kurtî û hêza xwe ya rîtmîkî ji axaftina rojane tene cudakirin.

Gotinên mezinan afirandina herî biçûk ya devkî a zimanê neteweyî ye, di warê mantiq û rêzimanê de hevokeke temam e, bi piranî rîtmîk û kêşdar e, herweha kurt û sade ye, lê ew ji bo ramanek taybetî pir dewlemend û ronî ye, ji serpêhatîya civakî û dîrokî ya

neteweyê hatîye girtin (‘Ebdula, 2017: 95). Yanî gotinên mezinan kurt û dewlemend in, ger were lêkolîn kirin, ev dewlemendîya gotinên mezinan hemû vedigere zimanê wê, çimkî bi zimanekî sade, hêsan, berfireh, zelal û ritmîk tê gotin û nivîsandin. Çimkî her kesê gotinên mezinan bixwîne, dê fam fam bike û bifikire ku ji bo wî hatine nivîsandin û civaka wî îfade dike, loma jî tê gotin ku zimanê gotinên mezinan zimanê hemû milletî ye. Gotinên mezinan ji hevokên kurt û sivik pêk tên ku di axaftina rojane de têne bikaranîn, hevok û peyvên van gotinan xweş in û xwedî muzîkeke taybet in (Dawid, 2009: 77), Bi vê wateyê ev kurtî û sadebûna gotinan bûye sedem ku ew pir belav bibin û bigihîjin encama ku ji bo wan hatine afirandin. Yek ji taybetmendîyên gotinên mezinan, ew e ku wateya wan yekser û eşkere ye, mirov baş wan fam dike û guhdana wan xwezayî ye, çimkî form an jî peyv li gorî asta perwerdehiyê an pêşkêşkirinê dikarin biguherin, çimkî em dibêjin aîdî gel e, yanî gel li gorî asta xwe wê biguhere û kes nikare vê yekê rawestîne (Xankî, 2008: 11). Her berhemeke edebî ku ji alîyê zimanî ve hêsan be, wê bi hêsanî bigihîje temaşvanan, bi vê wateyê belavbûn û giringîya gotinên mezinan, ji ber zimanê wê yê sade ye.

Zimanê gotinên mezinan bi awayekî xweş û lihevhatî hatîye nexşandin û xwedî rîtmeke xweş e, carinan jî bi awayê helbestê tê gotin û nivîsandin, anku rîtmîk e û ziman jî pir sade û rewan e (Şareza, 1976: 15). Ziman di gotinên mezinan de rehendek giring e, bedewbûn, kurtbûn û sadebûna ziman, rûxsarên giring ên vê rehendê ne, dema ku ev zimanê xweş bi naverokeke xweş re were tevlihevkirin, dê gotinên mezinan wekî peykerê bedewîyê were dîtin, wekî vê gotinê “Bihar bi gulekê nayê”, di warê bedewîyê de hûn ê çend gotinan bibînin ku nîrxê wan bi zêr û koral e, ev nîrx hemû vedigere ji bo ziman. Di gotinên kurdî de wêneyên zimanî yên xweş hene, bi kurdîyeke xweş, sivik, nazik, sade hatine nivîsandin, peyvên ku ji bo nivîsandina gotinên mezinan têne bikaranîn ji bo lêkolînê amûrek baş in, çimkî hemû peyvên kurdî resen in û hemû jî yên milletê kurd in, ger peyvek bîyanî, wek: ‘Erebî, Farisî, Tirkî...’, tê de hebe û ew peyvên bîyanî were lêkolîn kirin dê derkeve holê, ev peyv girêdayî zimanê kurdî ye, lê ew ji ber bazirganî an hatinûçûnê bi zimanên din re tevlihev bûye, ev ji bo ziman û ji bo gotinê nabe kêmasîyek, ji ber ku dîyardeyek zimanî ya normal e.

Gotinên mezinan beşeke giring a folklorê ne û di jîyanê de cihekî giring digirin, di nava hemû civakan de têne zanîn û bi her qulaçên edebîyatê re hatîye tevlihevkirin. Herweha ziman û gotinên mezinan têkilîyên dualî hene, anku zimanê gotinên mezinan berbelav û hêja kirine û ji alîyê din ve jî gotinên mezinan zimanê resen parastîye. Li ser zimanê gotinên mezinan tê gotin: Gotineke ji gotina hatî gotin cuda ye, lê ji alîyê wateyê ve nêzîk in. Ziman û rîtim di gotinên mezinan de pir giring in, heta ku qaîdeyên rêzimanê jî dişikînin, amanca vê yekê ew e ku rêzikên rêzimanê bişikînin da ku rîtma axaftinê xirab nebe, wekî vê gotina mezinan:

Xwezîya sêwîya, ne hêvîya.

Gotin di nav gel de bi vî awayî hevpar e, lê gotina rastî ev e:

Xwezîya sêwîyan, ne xwezîya hêvîyan.

Belê da ku di warê formê de xweş be û di warê zimên de jî bi hêsanî û sivik were derbirîn, peyva xwezîya carekê hatîye bikar anîn û ji bo sivikkirina wê nîşana pir hejmarîyê hatîye rakirin. Gotinên mezinan xwedî zimanekî sade û zelal in, bi awayekî kurt têne pêşkêşkirin, ji ber vê yekê, ew bi hêsanî tê qebûlkirin û ji her babetên din ên wêjeya gelêrî bêtir belav bûne, bi vê wateyê gotinên mezinan bi zimanekî bêasteng hatine naskirin û şandin, destûrbûna gotinên mezinan bûye sebeb ku piranîya mirovan ji wan gotinan bawer bikin.

2.6.2. Rehendên Gotinên Mezinan

Gotinên mezin curekî giring a folklorê ne, di hemû warên jîyanê de tên bikaranîn, bineretek kûr hildigire, naveroka gotinên mezinan ji mijarên cuda hatîye xemilandin, wek: Xweza, civak û cîhana heywanan, ev yek li ser bingeha lasayîkirina prensîb, serpêhatî û têgehên baş pêk tê. Gotinên mezinan di nav her milletî de wekî dewlemendîyek mezin têne hesibandin, ji ber ku ji civakê derketine û dîroka vê civak û neteweyê, herweha hemû qonaxên jîyana vê civakê tomar dike û nîşanî milletî dide, ev ji bo ku gotinên mezinan û her tiştê li cîhanê heyî bi hev ve girêdayî bin, ji ber vê yekê gotinên mezinan xwedî gelek rehendên berfireh û cuda ne.

Dewlemendîya çanda me kurdan bi giştî û gotinên mezinan bi taybetî ev e, gelek rehendên vê xezîneyê hene, ev tiştekî normal e, ji ber ku ev çand û wêjeya zêrîn ji dilê millet derketîye, gelek rehendên gotinên mezinan hene, lê em ê yên herî gelemperî nîqaş bikin:

2.6.2.1. Rehendê Civakî

Mirov û civak bi hev ve girêdayî ne, ev têkilîyek dualî ye û her du jî bandorê li hev dikin. Mirov dikare vê civakê biparêze û xizmetê ji bo wê bike, lê di heman demê de dikare wê tune bike û ber bi xirabûnê ve bibe. Ji alîyê din ve civak jî vê yekê dike, ji ber ku mirov di nava xwe de ji lasayîkirinê hez dike, ev ji bo mirov tiştekî cewherî ye. Ji ber vê yekê dema ku mirov jîyanê hîs dike, di qonaxên destpêkê yên vê civakê de ye, bi vê wateyê her tiştê vê civakê wê bi dil û mejîyê mirov re tevlihev bibe û ew ê ji bo jîyana me bibin destûr û qanûn, heman nêrîn ji bo gotinên mezinan jî raste, ji ber ku ev gotin li ser bûyer, çîrok û kevneşopîyên vê civakê ne, ji bo jîyana wan bibin qanûn û destûr, ev gotine nîfş bi nîfş hatine vegohastin da ku bibin rêber ji bo jîyana wan, bi vê wateyê civak di avakirin û afirandina gotinan de roleke baş dilîze, ji alîyê din ve, gotin her tiştê di jîyana me de kurt dike û wekî filmek nîşanî me dide.

Di vê derbarê de gotinek heye, dibêje: Amûrên gotinên mezinan ên di zimanê kurdî de ji ketwarê tîn girtin (Xankî, 2008: 15), Bi vê wateyê ketwar li vir tê wateya civak û her tiştê di nava civakê de hey tê, yanî çavknîyê gotinên mezinan civak e.

Ji bo ku em wateya rastîn a rehendê civakî fam bikin, divê ew jî li ser çend cureyan bêne dabeş kirin, ji ber ku sînore vî rehendî pir berfireh e, li vê derê yên herî berbilav dê hêne gotin, çimkî ev rehend dibite gelek cur:

1. Jinanîn û jinxwazî

Zewac bingeha malbatê ye, çimkî civak ji malbatê dest pê dike, yanî dibistana yekem a mirov malbat e, lewma mezinên me li ser mijara avakirina malbatê pir baş axaftine û bi giringî lê mêze kirin û gelek gotinên zêrîn ji me re vegêrane da ku em ji xeletîyan werin parastin. wekî vê gojinê:

Avê vexwe ji kanîya, keçê bîne ji ‘eslîya da bibînî ‘ecêbîya.

Bi vê wateyê giring e ku jin ji malbateke bi ‘esil û esas be, ji ber ku malbata jinê ji bo wê dibistanek e (Ehmed, 2013: 54), Yanî jin ji bo malbat û civaka xwe wekî neynikekê ye, di folklorê me ya kurdî de jî, li ser jinê û giringîya vê mijarê gelek gotinên mezinan hene, wekî van gotinên li jêr:

Jina çak ne‘met e, jina xirab ‘ilet e (Dêrşewî, 2000: 80).

Jin stûnî mal e (Gerdfî, 2005: 90).

2. Malbat (Xêzan)

Malbat ji bo pêkhatina civakê gava yekem e, anku civak bi malbatê dest pê dike, bi vê wateyê ger destpêk baş be dê heta dawîyê bidome, loma jî di nav me kurdan de li ser vê yekê gelek gotinên heja hatine gotin. Wekî van gotinên li jêr:

Malek ava çêtir e ji sed xirabeyan (Sindî, 2009: 95).

Malek tifaq beramberî êlekê, êlek tifaq beramberî dewletekê (Sindî, 2009: 96).

3. Cîran (Hevsû)

Ji bilî endamên malbatê cîran kesên herî nêzîk in, ji ber ku ew bi berdewamî têne dîtîn û di bextewarî û nexweşîyên mirov de hevpar in, ji alîyê cografî ve gelekî nêzî mirovan in û di olê de giringîyek mezin ji wan re hatîye dayîn û di hemû warên jîyanê de bi giringî li cîranan dinêre û ji ber vê yekê gotinên mezinan jî giringîyek mezin didin vê mijarê. Wekî van gotinên li jêr:

Eger cîran cîran e, mal avedan e (Ahmed, 2013: 58).

Cîranê baş ji malbata dûr baştir e (Akreyî, 2008: 54).

4. Mêvan

Di çanda kurdî de bi gelemperî û di folklorê me de bi taybetî ev mijar pir giring e, bi hurmeteke mezin mêvan têne mêze kirin, ev yek di gotinên mezin de jî tê dîtîn û van gotinan qîmet û hurmeteke mezin daye mêvan, dibêjin: Rêzgirtin û xizmetkirina mêvanan tiştêkî pir giring e. wekî van gotinan:

Mêvanan mal ava kirin.

Mêvan berxê makê ye (Amêdî, 2019\IV: 922).

Nan bi mêvana xilas nabît (Amêdî, 2019\IV: 929).

5. Hevaltî

Her civakek saxlem li ser bingehe rêzgirtin û hezkirinê di nav xelkê wê civakê de tê ava kirin, hevaltî ew e ku rêz û hezkirinê diafirîne, ji ber vê yekê divê li heval û hevaltîyê rêz were girtin, ji bo ku civaka me bikêr û bextewar bibe, di gotinên mezinan de giringîyek mezin li ser vê mijara çêker hatîye dayîn. Wekî van hevokan:

Dostên dilsoz di tengavîyê de der dikevin (Pêndiroyî, 2005: 90).

Hevalê parî naçit harî (Dêrşewî, 2000: 359).

6. Perwerdekirin

Ev yek ji mijarên herî giring e, di pêşketina neteweyê bi giştî û civakê de bi taybetî roleke baş dilîze, perwerde bi gelemperî wekî rehenderk serbixwe tê dîtin, lê bi rastî perwerde di warê civakî de dibe mijarek kêrhatî, çimkî di qonaxên destpêkê yê jîyanê de gotinên mezinan bûne qanûn û destûr ji bo birêvebirina jîyana millet, ev gotin ji civakê hatine girtin, li wî serdemê cihê xwendin û nivîsandinê tune bû, anku perwerde ji perwerdehiya malbatî û civakî cuda nabe, loma jî mezinên me li ser perwerde û pêşketina milletan gelek gotinên heja vegêrandine da ku asta me ya perwerdehiyê bilind bikin û karibin rêwîtiya jîyanê bi serbilindî bi rê ve bibin. Di vê derbarê de gotinek mezinan heye, dibêjin:

Şifik bi terî diçemyêt (Elî, 2006: 96).

Merema vê gotinê ew e ku divê malbat û civak ji qonaxên destpêkê yê jîyanê de zarokên xwe bi awayekî rast perwerde bikin, ji ber ku eger mezin bibin hêdî perwerde bêsûd e. Di nav me kurdan de li ser perwerdehiyê gelek gotin hene, her yek ji bo amancekê ye, yek ji amancên hevpar jî ew e ku em zarokên xwe baş mezin bikin, ji ber ku ew bi çî awayî mezin bibe dê heta dawîya jîyana xwe wisa bimîne. Wekî vê gotinê:

Yê girtî bi şîrî, bernadet bi pîrî (‘Ebdula, 2017: 180).

Di gotinên me yên kurdî de jî mijarek giring heye, dibêje: Divê em perwerdeyê bidomînin û nese kinin, di vê derbarê de gotinek heye:

Hûn çend bizanin, hûn çi nizanin.

Divê em li ser vê fikrê nese kinin, divê em hewl bidin, ne tenê perwerdehîyê, belku, ew li dor her werzîş an çalakî ye, ku em ji bo birêvebirina jîyanê kêrhatî bin, divê em berdewam bixebitin û nese kinin. Wekî vê gotina mezinan:

Palewan bi rojekê naçîte ser şelîte (Elî, 2006: 56).

2.6.2.2. Rehendê Abûrî

Aborî li malî rêyek giring e, pergala jîyanê baş tê rêvebirin, bi pêvajoya aborîkirinê mirov tiştên pêwîst û nepêwîst ji hev cuda dike, bi vê wateyê aborîkirin serkeftin û rêya derketinê ye ji rewşên nexweş û nedîyar. Bav û kalên me derbarê aborîyê de gelek peyamên hoşdarîkirinê ji me re şandine, ev peyam şîret û rêberîyê bi xwe ve digirin, lê divê were gotin ku aborî pir giring e, lê divê negihîje rezîlî û qelsatîyê.

Kal û pîran hoşdarî dane me ku em li demê zêdeyî yê aborîkirinê bikin da ku em di tengasîyê de poşman û rezîl nebin, li dor vê axaftinek heye, dibêje:

Ger di pêşîyê de hizra dawîyê nekin, li dawîyê ê mecbûr bin li pêşîyê bizivirin.

Ev axaftin amaje bi gotina jêrîn e, di serdema kevin de li havînê xebat dihatin kirin û xwarin û pêwîstîyên zivistanê jî li berfireyê dihatin hilgirtin, herweha eger kesekê ev hevsengî neparasti bûya, zivistan wê bi dijwarî li ser wî sekinî ba û ew da baca xeletîya xwe bide, wekî vê gotina mezinan:

Diravê sipî bo roja reş e (Yasîn, 2006: 110).

Ji ber giringî û firehîya vî rehendî, eger li ser sê beşên giring were dabeşkirin wê watedartir be:

1. Çandin

Çandin yek ji taybetmendîyên civaka Kurdî ye, di nav neteweya Kurd de berbelav e, mîletê kurd her tim cotkar bûye û heywan xwedî kirine, jîyana gundan bi awayekî sereke

li ser çandinîyê ye, ew çavkanîya sereke ya jîyana wan a rojane ye (Ahmed, 2013: 63), Bi vê wateyê dahata neteweya kurd di qonaxên destpêkê yên jîyanê de hemû li ser çandinîyê bû, anku hemû hilberên xwarinê li wir têne çandin, her demsalek berhemên xwe hene û ev yek di gotinên mezinan de xuya dibe, ji me re tê gotin ku em berhemên zêde di demsalên pîrbûnê de kom bikin, ku em wan di demsalên kêmbûnê de bikar bînin, herweha da ku em li gorî van demsalan berhemên xwe biçînin jî gelek hoşdarî dane me, wekî vê gotinê:

Xwelî bi wî kesî werbe yê biharê nekit cotî (Ahmed, 2013: 13).

Ev tê wê wateyê ku bihar demsala çandinîyê ye, lewma divê xwe amade bikin û dest bi çandinîyê bikin.

Havîn babê feqîr û jaran e (Ehmed, 2013: 64).

Havîn demsala hatina pîranîya berhemên çandinîyê ye.

Payîz hat berka feqîrî dirîya (Ehmed, 2013: 64)

Payîz destpêka zehmetî û sermayê ye.

Çi roja baran e, ew roj zivistan e (Qerenî, 1984: 39).

Zistan rojêkî mabê bawerî pê meke (Kakeyî, 2006: 152).

Ev tê wê wateyê zivistana kurdan pîr dijar û zehmete, lewma divê li berfireyî yê xwe amade bikin.

2. Karkirin

Kar yek ji şert û mercên sereke yên berdewamîya jîyana ye, ji ber ku bi karkirinê mal tînin avakirin û alîkarîya pêşketina malbat û civakê dike, ji ber vê yekê xebat serbilindîya her mirovî ye, çimkî mirov hewcey tu kesî nabe, di derbarê karkirinê de gelek gotinên mezinan hene, ev dê me pal bidin ku em bixebitin û xizmeta gel û welatê xwe bikin. Wekî van gotinan:

Destî bo kar nebêt bo birîn çak e (Gerdî, 2005: 78).

Merema vê gotinê ew e ku kesê bêkar mirî be çêtir e, ji ber ku wê ji malbat û civaka xwe re bibe bargiranî.

Pîyaw be kariye we dîyar e (Elwenî, 2008: 95).

Ev gotin dibêje: Karê mirovan ji bo wan neynikek e û bi xebata xwe civak dê we nas bike, bi gotineke din kar biryarê dide ka mirov baş e yan xirab e, gotinên mezinan qîmetek mezin daye mirovê kedkar.

3. ‘Embarkirin (Hilgirtin)

Ev yek ji taybetmendiyên bingeîn ên mirovên berê bû, ji ber ku jîyan wê demê zehmet bû, her tiştê ku wan dixwar an bi kar di anîn berhema wan bixwe bû, ji ber vê yekê depokirin di çanda kurdî de baş tê dîtin, her madeyek bi rengekî tê hilanîn û ev yek di gotinên mezinan de wekî karekî giring tê hesibandin, bi vê xebatê mirov li pêşerojê difikire, yanî mirov nikare tenê li îro bifikire, çimkî ya giring ew e ji ber ku mirov nizanin paşeroj wê çawa be. Wekî van gotinên mezinan:

Xwarina îro bihêle bo sibê, lê karê îro nehêle bo sibê.

Bihar hat rakirin, zivistan hat dakirin.

2.6.2.3- Rehendê Dîrokî (Mêjûyî)

Gotinên mezinan berhemeke gelekî qedîm a gel e, ev berhem di dilê gel de wekî mîrateyek hatîye parastin, çimkî dîroka wî mîletî di nava xwe de parastîye, van gotinan hemû bûyerên jîyana mîlet bi devkî û bi ewle tomar kirine, çimkî ev dîroka neteweyê ye, bi rêya wê bûyerên jîyanê û trajediyên berê nîşanî mirovan didin. Dîrok bi çavek mezin li gotinên mezinan dinêre, ji ber ku di serdemên kevînar de ev gotin bi rolê Hiqûq, destûr, wêje, çand, rêveberî, perwerde û rênîşanderîya netewî di lîstin, ey yek nêrîna dîroknasa ye.

Di gotinên mezinan de ji gelek alîyan ve rehendê dîrokî tê dîtin, mîna ku behsa navek, dîrokek, bûyereka an tişteka bi dîroka ve girêdayî ye, wekî van gotinan:

Felah erzî kêlaw e, axa cergî biraw e (Ehmed, 2013: 63).

Ev dîyarde di çanda me kurdan de pir berbelav e, eşkera ye piranîya axa û giregiran kesên pir pîs in û Xwedê nas nakin, çavên xwe li mal û namûsa feqîran di gerandin.

Axa sîbera darane bo kesê mal nînin (Akreyî, 2008:12).

Ev xusûsiyeteke Axayane, amanca wan tenê berîka wan e û ji bilî wan kes li cem wan xem nîne, yanî kesên xweperest in.

Xweyê sebrê dibin melkê Misrê (Abuzêd, 2021: 168).

Ev gotin li ser bûyereke dîrokî ye, li ser Êsivê jîr e, ku bi sebrê bû mezin û ‘ezîzê Misrê.

Şîrî Mîsir le kalana nawestê (Xal, 1971: 104).

Ev gotin behsa jîrî û mîrxasiya leşkerên Misrê dike, bi taybetî di serdema fir‘ewnan de hêza wan pir berfireh bû û her tim di nava şer de bûn.

Şaran le hesret Bexda ekran, Bexdaş wêran bû (Xal, 1971: 99).

Ev gotin girêdayî wê dîrokê ye dema ku Mexolan êrîşî Bexda kirin û Bexda wêran kirin.

Ev yek di nava rehendê dîrokî de tê dîtin, lê yek ji taybetmendîyên gotinên mezinan ew e, li pişt her gotinekê bûyerek, serpehatî û çîrokek heye, yanî gotinên mezinan li ser esasê heqîqetê tên avakirin û tu gotin ji valahî û bê amancê derneketine.

2.6.2.4. Rehendê Exlaqî (Rewîştî)

Exlaq rehendekê pir giring e, di hemû warên jîyanê de û di çanda kurdî de ev rehend pir rêz lê hatîye girtin, cimkî exlaq yanî mirov, exlaq bi rêya reftarên mirov derdikeve hole, ger xwedan exlaqek we ya baş hebe, wê demê hûn ê karên qenc bikin û hûn ê bibin kesek berhemdar û hûnê sûdê bidin yên derdora xwe, mirovê bi exlaq bi rêya kirin û reftaran xuya dibe û her tim ji bêhêvîyan re dibin hêvî, çimkî mirovên bi exlaq her dem ji bo pêşdebirinê dixebitin, dixwazin derdor ji wan sûd wergirin.

Gotinên mezinan ji hemû beşên din ên folklorê zêdetir ev rehend di nav xwede girtîye, di civaka me kurdan de li dor exlaqê gelek gotin hene, ji bo ku em bi kêrî xwe bên

û em bi edetên baş, wek: Cesaret, merdînî, dilsozî, bawerî, cesaret, yekîfî, hevkarî...hwd, ji ber ku ev binyatin ji bo avakirina civakeke saxlem.

Di nav civaka me ya kurdî de li ser reftarên xirab gelek gotinên mezinan hene, ji bo me hişyar bike û me ji van reftaran dûr bixe, wekî van gotinan:

Sax dibe şûna xincera, lê sax nabin şûna xebera.

Zimanê mirovan ji bo wan nasname ye, lewma divê em nasnameya xwe pîs nekin, dema ku hûn dixwazin di nav gel de kesek bişkînin û hûn tiştên xelet dibêjin, bawer bin heta mirinê jî ew dê we ji bîr neke û we ‘efû nake.

Derew darkokê sere xwedanîye.

Derew reftareke gelek şerm e û bi rêya gotinên mezinan hatîye nîşandan, ku ew ne ji exlaqê mirovî ye. Dawîya derewan xuya dibe û kes jê bawer nake û ew dê bi tenê bimînin, wekî vê gotina li jêr:

Agir ket mala derewînî, kesê jê bawer nekir.

Her kar û tevgerê xirab di gotinên mezinan de ji me re hatîye gotin, dibêje eger tu zirar û nexweşîyê bidî kesekî, ew dê bi serê te jî were, wekî vê gotinê:

Ya vî destî ji bo destê din namîne.

Mezinan em hoşdarî kirine, eger hûn qencîyê dikin, bikin û eger hûn nikarin bikin, xirabîyê jî nekin, wekî vê gotinê:

Eger hûn nebin gul, nebin stirî jî.

Gotinên mezinan bi her awayî me hişyar dikin ku em qencîyê bikin û îşaret bi hemû kirin û tevgerên baş kirine, ew jî nîşanî me da ku karên qenc xwedî xelatên baş in, herweha karên xirab jî zerê digihînin mirov, ev gotin gelek tevgerên exlaqî nîşanî mirovan didin, bi vî awayî divê mirov bi tiştên ku Xwedê daye razî be, nabe mirov xwe rezîl bike û ji yên din tiştan bixwaze, yanî çavê meriv ne li malên kesên din be, herweha dibêjin kesên dîlpak û rastbêj bextewar û serbilindin, dilê wî çî bixwaze bê tirs û şerm wê bike, çimkî yê rast e û xirabîyê nagihîne tu kesan, wekî van gotinên li jêr:

Nanê xwe bixwe bi avê, mineta xelkê bavê.

Rast be lay Şêr da biro.

Axaftin Zîv be, neaxaftin Zêr e.

Baş be, lê ne belaş be.

2.6.2.5. Rehendê Olî (Ayînî)

Miletê kurd ji çend olan pêk tê, her olekê yasa, bawerî û pîrozîyên xwe hene, ev bawerî, dîtin, yasa û destûrên van olan, di nav civaka kurdî de, cihê xwe kirine û bandor li çanda kurdî kirîye, ji ber vê yekê bawerîyên olî di gotinên mezinan de têne dîtin. Gotinên jêderka wan bawerîya olî jî pir in, lê piranîya wan gotinan, neku giştî di pirtûkên pîroz de derbas bûne, pirê wan gel ji xwe re afirandine, dema mirov ketine tengasîyê hatine gotin, an çare ji derdê xwe re nedîtine û wekî ku xwe bi qederê ve girêdane û gotinê xwe jî li gor wê yekê anîne zimên, lê di vê derê de tenê xwe xapandinek, an ji alîyê derûnî de xwe rehet kirinek heye, dema mirov li dawîyê rast tên, an prisgirêk dibin girêkutik, dibêjin: Çareya her tiştî heye, wekî vê gotinê:

Xwedê derd daye, derman jî daye (Hisên, 2006: 15).

Naveroka vê gotinê di nava piranîya olan de tê dîtin, anku ji bo wan wek bawerîyekê ye, gotinên mezinan li ser hemû alîyên olan hene, anku di olan de her mijara hatî nîqaşkirin, gotin li dor wê mijarê hene, ew mijar tevlihev kirine û mohra kurdî lê kirine, wekî van gotinan:

Bila Xwedê yar be, dinya hemû neyar be.

Ev gotin li ser mezinatî û pîrozîya Xwedê ye, yanî Xwedê ji her tiştî mezintir e, dibêje: Bila navbera we û Xwedê de xweş be û hemû dinya dijmînê we be, hûn bê minet û serfiraz in.

Başîyê bike û di avê de berde.

Naveroka vê gotinê dibêje xêr û başîyê bike û li çî cih û deman qala xêra xwe neke, çimkî Xwedê xelata we dide, ne mirov. Ev bawerî jî di nava hemû olan de tê dîtin.

Mirin kerê Beqalane li ber derê hemû malan e.

Naveroka vê gotinê dibêje: Her kesê hebe wê bimire, yanî kes ji mirinê xilas nabe. Li dor vê yekê, qewleka Êzdîyan heye, dibêje: Bin Ademo hezar salî tamam key, mîratîyê li şerqê heta bi Şam key, dimayîkê her dê ji kasa mirinê tam key (Denanî, 2012: 209).

Dinya şekal e, dîv xwe ra bikêşe (Akreyî, 2008: 67).

Mebest ew e ku em teslîmî dinyayê nebin, ji ber ku ev دنیا ji bo me ezmûnek e, yanî em li vê dinyayê ji bo amancekê dijîn, cihê me yê rast ne ev دنیا ye, loma divê em li vê dinyayê bi serbilindî bijîn da ku em ji Xwedayê xwe şerm nekin, ev yek di Qur‘ana Pîroz û hedîsên Pêxember de jî heye.

Heke ya Xwedê hat, ya ‘ebda betal e (Ce‘fer, 1986: 108).

Naveroka vê gotinê li dor qederê ye, yanî tiştê ku Xwedê plan kirîye dê bibe, ne kêr ne jî zêde. Ev yek nîşanî me dide ku li دنیا û axretê tenê Xweda xwedî biryar e.

Riziq yek e, nabe du.

Naveroka vê gotinê li ser rizqê ye, yanî riziq ew e ku Xwedê daye we, loma çavbirçî nebin û çavê xwe li malên kesên din negerînin, cîmkî Xwedê dide, ne mirov.

2.6.2.6. Rehendê Sîyasî (Polîtîk)

Sîyaset ew zanist e ku asta mirov di civakê de bilind dike û cihê mirov xweş dike. Ji alîyê din ve sîyaset hunera birêvebirina gel e, her miletekî ku di warê sîyasî de jêhatî û xwedî sîyasetmedarên baş be, ew ê pêgehê xwe baştir bike û bi welatên cîran re gelek têkilîyên sûdmend ava bike. Ji ber bûyerên dîrokî yên ku hatine serê milletê kurd, rewşa sîyasî û partîyên sîyasî bûne beşek ji kesayeta kurdan, divê kurd ji alîyê sîyasî ve jî bîn perwerdekirin da ku bûyerên dîrokî yên serdema xwe fam fam bikin, Ji bo ku ew bizanin ka meriv çawa di derheqê bûyer û rewşan de biryarên durist bide, ji ber vê yekê pirsgerêka sîyasî bûye beşek ji gotinên mezinan, çîmkî divê ev ji bo millet were zelelkirin, dîsa ji bo îfadekirina van bûyeran çeka herî baş zanîn e û ev yek di gotinên mezinan de hatîye gotin (Ehmed, 2013: 75), Bi vê wateyê her nexweşî û azareke ku hatîye serê neteweya Kurd, berhema nezanî û xişîmîya neteweya Kurd e, em milletê kurd di piranîya warên jîyanê de

nemaze di sîyasetê de pir lawaz in, ji ber vê yekê divê em zêdetir li ser vî alîyê giring bisekinin, ji bo rêwîtiya jîyanê ji nîfşê li dû xwe re rast bikin.

Ji ber bindestî û bêxwedanîya neteweya Kurd, di hemû warên jîyanê de hestên xwe bi awayekî mecazî û veşartî anîne ziman, yanî tiştên ku wan dixwest bibêjin ewan ne dikarî rasterast bibêjin, bi her halî de dixwestin milletê xwe hişyar bikin, ev di piranîya gotinên mezinan ên derbarê sîyasetê de xuya dibin, wekî van gotinan:

Destê tu nikarî gez bikey, maç bike (Ehmed, 2013: 75).

Cara hey mirov dibêje yarê dîya xwe baba.

Mebesta vê gotinê ew e, kesên ku we hêza wan nebe hûn pêşîya wan bigirin, hurmetê bidin wan, heta roja we were.

Roj her li pişt ‘ewran nabit (Abuzêd & Elî, 2022: 894).

Mebesta vê yekê ew e ku meriv li gorî rewşa îro tev bigere, ji ber ku dê her roja me jî were, yanî li welatê me jî roj wê derkeve.

Eger şivan rûnişt, pez dê dîr çit (Abuzêd & Norî & Elî, 2022: 894).

Naveroka vê gotinê hoşdarîyê dide karbidest û sîyasetmedaran ku hay ji neteweya xwe hebin, ji ber ku her dema ew ji bo berjewendîyên xwe xebitîn û haya wan ji neteweya wan nema, millet wê ji wan dîr bikevin û bi rehetî bibin nêçîra dijmin.

2.6.2.7. Hoşdarîkirin Wekî Rehendeke Gotinên Mezinan

Hoşdarîkirin kirdeyeka axaftinê ya pir giring e, di çandê de bi gelemperî û di gotinên mezinan de bi taybetî rolek mezin dilîzin,. Ger mirov bi zanistî li gotinên mezinan binêre, wê dîyar bibe ku di hemû gotinan de hoşdarîkirin hene, lê her gotinekê peyamek heye, anku nameyên hoşdarîkirinê peyamên hoşdarî, şîret, tehdîd, tirsandin, rêberîyê hildigirin. Hoşdarîkirin rehendeke giring a gotinên mezinan e, ji ber ku piranîya gotinên mezinan hoşdarîyan hildigirin. Gotinên mezinan û hoşdarîkirin xwedî heman amanc in û her du jî ji bo wê amancê dixebitin, ew jî xizmetkirina guhdêran e û ji bo berjewendîya guhdêran tene pêşkêşkirin, ji bo ku pêvajoya jîyanê nesekine û bi pêş ve biçe, lewra ev yek bûye eger guhdêr ji her guhertin û bûyerekê agahdar bibe, bi vê wateyê wê li hember

van geşedanan helwestên baş hebin, ev nîşan dide ku peyamên hoşdarîyê yên ku di gotinên mezinan de hene kêrhatî û bi bandor in.

Guman tune ye ku hoşdarîkirin rehendek giring a gotinên mezinan e, cîmkî gotinên mezinan li ser esasên hoşdarîkirinê hatine avakirin. Herweha gelek taybetmendîyên hevpar û têkilîyên dualî hene, nameyên hoşdarîkirinê yên di gotinên mezinan de hatine xemilandin bûne sedem ku millet bikeve bin bandora van gotinan û ji bo jîyana xwe bike qanûn. Gotinên mezinan jî asta kirdeya hoşdarîkirinê bilind kirîye û sînorê wê berfireh kirîye, heta wê astê ku hoşdarîkirin di hemû alîyên jîyanê de cih girtîye. Zimanê hoşdarîkirinê û zimanê gotinên mezinan wekî yek in, di warê kurtî, zelalî û pêşkêşîyê de rêbaza pêşkêşkirina van her du cureyan bi bûyeran ve girêdayî ye, ger hewce be, dê bi renekî hişk û bi hêrs were pêşkêşkirin û eger rewîş aram be, dê bi renekî sivik û xweş were pêşkêşkirin.

Ger hûn ji alîyê dîrokî li vê yekê binêrin nameyên hoşdarîkirinê bikêr in, dê were dîtîn ku ev gotinên mezinan ên giranbiha yên ku îro di destê me de ne, di qonaxên destpêkê yên jîyanê de hemû nameyên hoşdarîyê bûn û her yek peyamekê hildigire, dema ku bûyerek an pîrsgirêkek diqewime, divê ji mirovên hêja nameyên hoşdarîyê bêne belavkirin, ji bo çaraserkirina vê pîrsgirêkê, ev tişt bûne qanûn û destûrên jîyanê û ji vê re gotinên mezinan dihatin gotin. Kesên ku bi karê pêşkêşkirina hoşdarîkirin û gotinên mezinan radibin, kesên hêja û rêzdar in, çîmkî ew ji bo xizmeta mirovahîyê dixebitin.

Nivîskara Sovyetî Aristovay gotîye: Di serpêhatî, gotinên mezinan û axaftinên hêjayan de aqil û hoşdarîyeke mezin heye, wêneyên dîrok, ferman, nexweşî, êş, exlaq û edetên gelan di hewîne (Resol, 1970: 82). Gotinên mezinan hemû bextewarî û nexweşîyên millet bi xwe ve girtine, wî ev yek bi zanistî ji me re zelal kirîye, di gotinan de hoşdarîyek baş û saxlem heye û dikare bandorê li dil û naxê mirovan bike, wekî van gotinan:

Bira le pişt bira bê, meger bela le lay Xweda bê (Xal, 1971: 82).

Gelek caran di navbera birayan de li ser mîras an zewacê pîrsgirêk derdiketin, ev gotin ji hêla mirovên aqilmend ve hatîye gotin, ku hişmend bin û ev yek nebe sebeba

dûrbûn û dilmana wan ji hev, ji ber ku eger bira bi hev re tifaq bin, ji Xwedê pê ve tu kes nikare wan têk bibe.

Aw bitba le pirdî namerd meperewe (Xal, 1971: 12).

Ev gotin jî me hişyar dike, ger rewşa me çiqas xirab be û çî hatibe serê me, nabe em xwe hewceyî nemerd û çavbirçîya bikin, ji ber ku ev mirov tu carî bi heval û milletê xwe re alîkar nebûne.

Ew xurmayeyî tu eyxoyît denkekey wa le gîrfanî min da (Resol, 1970: 106).

Ev gotin me hoşdar dike ku bi rêya rû û şiklê der ve nabe ku em qet ji kesî bawer bikin, ji ber ku ev gotin dibêje xurmeya tu dixwî navika wê di bêrîka min de ye, yanî heger tişt an mirov çiqas ciwan û kamil bin jî divê me hay ji xwe hebe.

Keleşêrîş nebêt, xwa roj her ekatewe (Xal, 1971: 118).

Ev gotin gelek watedar e û felsefeyek wê ya baş û hoşdarîyek xweşik heye, hoşdarîyê dide millet ku bi rêk û pêk jîyana xwe bi rê ve bibin, bila desthilatdar we naxapînin, çimkî ya ku niha li meydana ye û di nav civakê de cihê xwe girtîye, ne berhema ked an xirabîya kesekî ye, belku berhema xebat û reftarên civakê bi giştî ye, berpirsîyarê vê yekê kes nîne û ev daxwaza civakî ye ji bo vî karî.

Eva li jêr hatî gotin delîle ku hoşdarîkirin rehendek giring a gotinên mezinan e, heta asteke baş kariye bandorê li dil û derûnê millet bike û millet pabendî van gotinan kirîye.

2.6.3. Hoşdarîkirina Rasterast û Nerasterast di Gotinên Mezinan de

Kirdeya hoşdarîkirinê rehendekê giring ê gotinên mezinan e, bi awayekî serekî dibe du cur, dema ku li ser van her du cureyan dipeyivin, xuya dibe ku ewan di pêşvebirina gotinan de rolek baş listîye, van cureyan şîrîyet û bedewî têkelî gotinan kirine û bûne sedem ku her gotinek ji yek wateyê zêdetir bide. Bi vê wateyê dema civak dibîne, her gotinek xwedî gelek wateyên xwe ye û bi gelek awayan tê bikaranîn. Wê demê civak wê di bin bandora gotinên mezin de bimîne û ji bo jîyana xwe wê bike yasa û destûrên bingehîn.

Hoşdarîyên rasterast bi gelemperî di gotinên mezinan de têne dîtin, di vê cureyê hoşdarîyê de, amanca daxuyanîyê bi zelalî tê vegotin, anku ji bo têgihîştina wateyê ne hewceyî ramana kor a hişyarîyê ye. Dema ku ev cure hoşdarîkirin di gotinên mezinan de xuya dibe, ew taybetmendîyek hoşdarîyê nîşan dide, ew jî gotinên mezinan milkê hemû milletî ne û ji hemûyan re hatine pêşkêşkirin. Di nav civakê de her cure mirov hene, hinek ji wan asta zanîna wan kêr e, heger wateya peyvan ne dîyar be sûd jê nagire û nagihîjin wateya rast, ev cure hoşdarî jî wekî gotinên mezinan ji bo xizmeta gel tê bikaranîn, yanî amanca her duyan jî yek e.

Hoşdarîya nerasterast di gotinhên mezinan de bi zanistî hatîye xemilandin. Di vê cureyê de wateya hoşdarîyê neşkere ye, lê wateya wê veşartî û kor e, divê ew bi baldarî lêkolîn bikin, da ku wateya rastîn ya ku tê gotin fam bikin. Herweha divê gotinê têkilî derdorê jî bikin, mebest ew e ku gotin di hemû cihan û rewşan de nayê kirin, loma jî bi vî awayî amancên giring pêşkêşî millet dikin. Berê jî hatibû gotin ku her gotineke mezinan li pişt xwe bûyer û çîrokek heye, wateya veşartî ya gotinê dibe ku li herêmekê êşkere û li cihekî din veşartî be, her dema ku çîroka li pişt gotina mezinan were zanîn, wate û amanca gotinê dê dîyar bibe. Ger civak wate û mebesta hemû gotinan bizane û di jîyana xwe de bi cih bîne, wê demê pêvajoya jîyanê wê rasterast bibe û nexweşî û pirsgirêk namînin.

Li ser hemû qadên jîyanê gotinên mezinan hatine kirin, li her pirsgirêk û rûdanên ku çêdibin lê xwedî derketîye û bi zanistî pê re mijûl bûye. Gelek gotin hene ku ji yek amanc an mijarek zêdetir in û wateyên wan ên êşkere û veşartî hene. Ev yek delîl e ku gotinên mezinan bi qîmet in û bi awayekî zanistî hatine gotin. Bi vê wateyê gelek gotin hene, xwedî hoşdarîyên rasterast û nerasterast in, yanî di yek gotinê de duriste hoşdarîkirina rasterast û nerasterast hebe, wekî van gotinan:

Asin req e (Ce‘fer, 2006: 11).

Ger kesek li nêzî hesinekî bixebite yan bilîze û nizanibe ew hesin e, ew dê vê gotinê pêşkêşî wî bikin, da ku ew hişyar be û ji hesin were parastin, ku nekeve tengasîyê, ev hişyarîya rasterast e, lê eger kesek serhişk û xirab be, yanî guh nade kesî, tiştê ku dilê wî bixwaze divê li gor xwestek û têgihîştina xwe bike, ew dê ji kesên li dora wî re bibêjin

“Hesin req e” hay ji xwe hebin ku bi wî re tev negerin, ji ber ku dê ji wan re bibe sedema tengasiyê. Ev mîna hişyarîyek nerasterast e.

Bi ‘elba mezin dikire, bi ‘elba biçûk difiroşe (Ce‘fer, 2006: 23).

Wateya vê gotinê rasterast û nerasterast heye, di her du rewşan de gel hişyar dike, ku xwe biparêze, ger di sûkê de sextekarek hebe, tişt bi giranî bifiroşe dê derdor li ser wî vê gotinê bibêjin, çimkî divê civak jê dûr bisekine û tiştêkî jê nekirin, ji ber ku civak dê zîrê bibîne, ev rasterast e. Lê wateya veşartî ya vê gotinê ew e ku li pişt wê çîrokek di torbeyên mezinan de heye, kesekî fêlbazî dikirin, tişt bi ‘elba biçûk dikirîn û bi ‘elba mezin difirotin, wekî ku dîyar e di hemû olan de karê terazandin û pîvandîna giring e, divê mirov di terazûyê de kesî nexapîne, lê ji ber ku vî kesî terazûyê rast nekir, Xwedê xefis lê kir û ew kire Kûsî û ‘elba mezin danî ser piştê wî û ‘elba biçûk xiste bin zikê wî, ev tê wê wateyê ku divê em ji xapandinê dûr bikevin da ku Xwedê me ceza neke.

Dê bêjî ‘Emê Gozê ye.

Amanca vê gotinê ew e ku ger kesek mîrxas û wêrek hebe, rasterast vê gotinê dibêjin da ku yên din bizanin ku ew mirovekî jîr û wêrek e, divê rêz û qîmetê bidin wî, çimkî eger hûn di derheqê wî de xeletîyekê bikin wê zîrê bide we û wê we biêşîne. Lê eger kesek tîrsonêk û newêrek hebe, vê gotinê bi dengêkî dirêj û bi awayekî nerasterast pêşkêş dike da ku yên din bizanin ku ew tîrsonêk e û nikare bibe sedema nexweşiyê û zîrê bide kesekî. Ji ber ku di gotinên mezinan de hoşdarîkirinên rasterast û nerasterast hene, yanî di navbera gotinên mezinan û kirdeyên hoşdarîkirinê de têkilîyeke xurt heye.

2.6.5. Zehmetîyên Destnîşankirina Hoşdarîyê di Gotinên Mezinan de

Gotinên mezinan zanistek berfireh e û xwedîyê felsefeyek veşartî ye, çimkî ew rengvedana jîyana miletan e, da ku em bi rastî wateya gotinên mezinan bizanin, em dê gelek astengî û zehmetîyan bibînin, bi taybetî heke em hoşdarîya rast dîyar bikin.

Eger ev astengî bi awayê xalan bihête şirovekirin, wê baştir xuya bibe, bi vî awayî:

1. Gotinên Mezinan bi Awayekî Zanistî û Watedar tene gotin: Her gotinek li pişt xwe çîrokek heye. Anku tu gotinek ji valayê derneketîne, ev jî yek ji wan astengan e,

eger em wateya vê çîroka li pişt gotinê nezanin, em wateya gotinê ya rastîn fam nekin û amanca hoşdarîyê jî nayê zanîn, wekî vê gotina mezinan:

Xuwa le Siltan Mehmûd gewretir e (Resol, 1970: 85-86).

Evê gotinê çîroka xwe heye, ger em vê çîrokê nezanin, em nikarin nêrîn û hişyarîya xwe bînin ziman. ev gotin li ser Siltan Mehmûdê Xeznewî tê gotin ku di dema desthilatdarîya wî de hêza wî pir berfireh bû, ew hêzdar bû û çî bixwasta dikaribû bike, kesên zana û jîr ji bo ku morala xelkî bilind bikin ev gotin pêşkêşî civakê dikirin, ev tê wê wateyê ku Siltan Mehmûd jî dê biçe, cimkî ew jî mirov e dê bemire, ev dinya aîdî Xwedê ye û desthilatdarîya wî ji ya hemûyan mezintir û bihêztir e.

2. Gotinên Mezinan bi Awayên Cuda têne Nivîsandin: Lê naveroka wan ji bo heman amancê ye, ev awayên cuda yên axaftinê ji civakê re dibin asteng, bi vî awayî:

Berxê nêr her bo kêrê ye.

Berxê nêr dayî bo kêrê.

Berxê nêr bo serbirîn e.

Berxê nêr seba kêr.

Berxê nêr, ji bo kêr (Xankî, 2008: 17).

Van gotinan hemûyan heman wate heye, lê formê hemûyan ji hev cuda ne, bi vê wateyê civak ji bo hoşdarîya rast bizane, divê xwedî zanîneke baş be.

Ev guhertinên di forma axaftinê de durist dibin, li ser sê cureyan têne dabeşkirin:

A. Guhertinên di Asta Deverê de: Gotinên mezinan milkê hemû miletî ne, her devereke gotinên xwe hene, ev gotin li gorî taybetmendî û şewaza jîyana wan derketine holê. Di vir de zehmetî ew e ku li her herêmê gelek peyv hene ji bo yek wateyê, yanî yek peyv e, lê bi gelek awayan tê nivîsandin, ev nîşana dewlemendîya zimanî ye, lê ji civakê re jî dibe asteng li hember zanîna raman û merema hoşdarîkirinê, wekî vê gotinê:

Serma zivistanê ye.

Persîva zivistanê ye.

Peja zivistanê ye.

Nexweşîya zivistanê ye.

Êşka zivistanê ye.

Dihok bajarekî biçûk e, lê ji alîyê ziman ve dewlemend e, ev her pênc peyv her yek bi awayekî cuda hatine nivîsandin, lê ewan hemûyan heman wate heye, evê gotinê du wateyên xwe hene: Wateya rasterast ew e ku kesek nexweş be û nîşanên sermayê hebin, wê jê re bibêje nexweşîya zivistanê ye, ku hişyarî xwe be û xwe netirsîne. Wateya wê ya veşartî jî heye, ger kesek dem demî be û li ser şert û mercên xwe nesekine, hoşdarîyê dide ji bo ku derdorên wî hay ji xwe hebin û bizanin ku ev kes ne wekî gotina xwe ye vê yekê dibêjin.

B. Guhertinên di Asta Zarava û Devokan de: Neteweya kurd ji alîyê ziman ve gelek dewlemend e, xwedî gelek zaravayên cuda ye, her zaraveyekî gotinên xwe hene, ev jî asteng e li hember dîyarkirina raman û amanca hoşdarîkirinê, wekî van gotinan:

Çake bike û bîde bedem awe we. (Sorani)

Başîyê bike û di avê de berde. (Kurmancî)

Van her du gotinan heman wate heye, lê formên wan cuda ne, ji ber ku yek bi Sorani û ya din jî bi Kurmancî hatiye nivîsandin, amanca van gotinan ew e ku me hişyar bike da ku em qencîyê bikin û nebêjine kesî. Ji ber ku her dema me behsa qencîya xwe kir, tu qîmeta wê sedeqeyê namîne û Xwedê hez ji vê tevgerê nake, fikra vê gotinê ji Îslamê hatiye girtin, ger me wateya van her du gotinan nizanîba, me amanca wan fam fam nedikir.

C. Guhertinên di Asta Netewî de: Gotinên mezinan di nav hemû miletan de hene, pir caran gotinek di nava zêdetir ji yek miletî de tê dîtin, ev yek normal e ji ber ku awayê jîyana destpêkê ya hemû neteweyan wekî hev bû, an jî dibe ku ev gotine ji ber bazirganîyê an zêdebûna têkilîyan nêzî hev bibin û gotin ji hev wergirtine, lê ev yek jî dibe asteng ji bo ku civak amanca rast a gotin û hoşdarîkirinê bizane.

Helbestvanê mezin ê faris Xeyam di helbestên xwe de du gotinên mezinan bi kar anîne û ev her du gotin bi kurdî jî hene û ji bo heman raman û heman amanc tên gotin:

Avazê duhol az dûr xuş ast. (Farisî)

Dengê deholê ji dûr ve yê xweş e. (Kurdî)

Ner mîduşend. (Farisî)

Nêre bi doşe. (Resol, 1970: 28). (Kurdî)

3. Civakên Xwecihî yên Destpêkê li Rojhilata Navîn: Jîyana wan a civakî nêzî hev bû, lê piştî zêdebûna mirovan û tevlihevbûna edebîyat û şaristanîya netewên rojhilat bi neteweyên rojava re, di çanda van gelan de gelek guhertin çêbûne, ev jî di warê zanîna wate û amanca hoşdarîyê de pirsgirêk bû, çimkî naveroka gotinên mezinan bi ramanên olî, civakî, sîyasî, netewî, aborî, dîrokî û exlaqî yên her neteweyekê ve girêdayî ne. Yanî ev gotin xwedîyê felsefeyeke veşartî û berfireh in, ji bo famkirina rastîyê divê em şaristanîya hemû neteweyên cîhanê nas bikin û li ser bûyerên giring ên cîhanê jî pisporîya me hebe, ev hemû asteng in ji bo naskirina hoşdarîkirinê.

4. Gotinên Mezinan Hemû Zanist di Nava Xwe de Hembêz kirine: Ev zanist bi xweşîkî wêne kirine, ev zanist bi wateyeke veşartî hatine îfadekirin. Divê civak wateya van gotinan bi awayekî zanistî lêkolîn bike. Tiştê ku van gotinan ji axaftina rojane cuda dike, hebûna hizreka hişyar û hişmend e, çimkî naveroka wan xwedî wateyeke zanistî ya tevlihev e, ji ber vê yekê jî ger civak ne zana be, wateya van gotinan rast fam nake, ev berfirehbûna zanistê ji bo civakê jî bûye asteng.

3. STRATEJÎYÊN HOŞDARÎKIRINÊ DI GOTINÊN MEZINAN DE

3.1. Modela Searle ji bo Kirdeya Hoşdarîkirinê

Di mijarên zimanî de bi gelemperî rêyên taybetî yên analîzkirina kirdeyên axaftinê hene. Ji wan rêbaz û amûran re stratejîk têne gotin. Hoşdarîkirin bi gelemperî di ziman de û bi taybetî di pragmatîkê de karekî giring e, lewma ji bo ku ev çalakî bigihîje encam û nirxên rast divê bi stratejiyeke giring were şirovekirin.

Di vê beşê de em dê stratejiyên hoşdarîkirinê li gorî xwendina Searle bikar bînin. Gelek zimanzanan ji bo kirdeya hoşdarîkirinê stratejiyên danîne, lê piştî nirxandinek kûr, xuya bû ku stratejiyên Searle ji bo vê xebatê stratejiyên çêtirîn in, bi van stratejiyan em dê hewl bidin ku bigihin têgihiştin û amancên rast ên gotinên mezinan.

Stratejiyên Searle li ser çar cureyan têne dabeşkirin (Elî & Koçer, 2021: 57-61), Bi vî awayî:

3.1.1. Hoşdarîkirina Eşkere (Explicit Warning)

Ev stratejî bi awayekî eşkere ye, zelalbûna vê stratejiyê vedigere ji bo wan huner û formên di nav de amanc ji vê yekê ew hêz û melodîya di vê stratejiyê de ye, hin peyv hene ku têgehên cextkirinê “tekîdkirinê” hildigrin, ev peyv hêza xwe di hevokê de digirin, wek: Sond, formên nerêkirinê û formên pêwîstîyê...hwd (Şêrzad Sebrî Elî, 2023: 89).

Bi Xwedê ez dev ji vê rêya pîroz bernadim.

Divê ew were fêrkirin.

Na, ew nayê dîlanê.

Di vê stratejiyê de awaza “melodî” jî heye, her ku awayê gotina hevokê hat guhertin, yanî hin peyv tîr girankirin an tîr guvaştin an jî bi awayekî hêrs tîr gotin. Ev yek wateya hevokê ya rast xirab dike, bi vî awayî hevoka ragihandin dibe hevoka pîrsî û fermanî, wekî vê hevokê:

Garey Metîn girt.

Ev hevok ragihandin e û me hişyar dike ku Garey Matîn yê girtî, her ku peyva yekem hat girankirin û guvaştin, dibe hevokek pirsîyar. Herweha, ger ev hevok bi awayekî sivik û bi hêrs ve bê gotin, wê bibe tehdîd yanî dibe hevoka fermanî.

3.1.2. Hoşdarîkirina Nepenî (Implicit Warning)

Ev stratejî wateya wê yekser nayê dîtin, lê ramanek an xeyalekê hildigire, bi vê wateyê ne awaz, ne hêz ne jî şêweya axaftinê û hevokê heye. Herweha wateya wê bi rêya derdorê jî yekser nayê dîtin, ji bo famkirina wateya rastîn a vê stratejîyê, divê em xwedîyê agahdarîyên baş bin, ji ber ku hêza vê stratejîyê vedigere ji bo xeyalek taybetî, ev fikrên xeyalî vedigerin bawerîyên olî, civakî, netewî, însanî..., ev fikir di dilê civakan de hatine çandin, bi vî awayî wê asta têgihiştina gel derkeve holê, ji ber ku her kes nikare wateya rastîn a vê stratejîyê fam bike, wekî van hevokan:

Tîyek çand.

Pîr dike, lê ji bîr nake.

Ev hevok ji bilî wateya xwe ya rasterast, ramanên xeyalî û gumanbar hildigirin. Di serî de fikra çandçîna dara tîyê vedigere rûniştin û binecihbûna kurdan, dema ku malên kurdan li cihekî dihatin danan, wekî bawerîya kurdan dareka tîyê li ber derîyê malê dihat çandin, hevoka duyemîn behsa bawerîyên olî dike, gava Xwedê hêvî û xewna mirov pêk neyîne, ew ji bo qencîya mirov e, ji ber ku ger bihata kirin dê ji bo mirov bibe şer û xirabî. Ev stratejî îşareta sersormanê û gelek nîşanên din bikar tîne da ku meriv bikare li ser bisekine û bifikire, ev nîşana asta bilindîya vê stratejîyê ye.

Navê vê stratejîyê jî wê yekê hatîye, ku her kes ji fikir û bawerîyên ku têne bikaranîn bawer nakin û guman li cem wan derdikeve, çimkî dibe ev civak xwedî asteke nizim ya zanînê be an jî xwedî fikir û bawerîyên cuda bin.

3.1.3. Hoşdarîkirina Rasterast (Direct Warning)

Ev stratejî rasterast di nameyên hoşdarîkirinê de xuya dibin. Ev tê wê wateyê ku têkilîyek rasterast di navbera şiklê hevoka (Ragihandin, Pirs, Ferman) û erkên ragihandinê (îfade, pirs, daxwaz) de heye. Herweha piranîya caran peyvên hoşdarîkirinê jî di hevokê de hene, wekî van hevokan:

Hişyarî evroya xwe bin.

Daxwazkirina pêwîstîyên jîyanê mafê miletî ye.

Di van her du hevokan de têkilîyek rasterast di navbera forma hevokê û erkê wan de heye, delîl ji bo vê yekê ew e di van hevokan de peyvên hişyarî û daxwazî hene.

3.1.4. Hoşdarîkirina Nerasterast (Indirect Warning)

Ev stratejî di nameyên hoşdarîyê de nerasterast xuya dibin, ev tê wê wateyê ku têkilîyek nerasterast di navbera forma hevokê û erkê wê de heye. Ev cure hoşdarî pir berbelav e û heta ku em wateya rastîn a vê hişyarîyê fam bikin hewceyê hawirdorê ye, Hoşdarîkirina nerasterast bi hevokên ragihandin, pirs, ferman, eger, encam û amajedanê re têne bikaranîn, wekî van hevokan:

Xwe ji avê dûr bike. (Ragihandin)

Erê tu yê xwe ji zevîya min dûr bikî? (Pirs)

Tiştên tûj bikar neyînin. (Ferman)

Ger hûn bi tenê seferê bikin, rê dê li ber we winda be. (Eger û Encam)

Hevala min tê. (Amajedan)

Van hevokan hemûyan wateyên nerasterast hene, anku her yek xwedan wateyeke cuda ye, ji wateya forma hevokê, bi vê wateyê her nameyeke hoşdarîkirinê gelek wateyên xwe hene, anku durist e ku di nameyeka hoşdarîyê de ji yek stratejîya hoşdarîyê zêdetir hebe.

3.2. Stratejîyên Hoşdarîkirinê yên Searle di Gotinên Mezinan de

3.2.1. Hoşdarîkirina Eşkere di Gotinên Mezinan de

Ev cure hoşdarîkirin di gotinên mezinan de bi zelalî tên dîtin. Wekî ku li jor hatî behiskirin, hoşdarîya eşkere ji hêla hêz û awaza xwe ve ji stratejîyên din ên hoşdarîyê têne cuda kirin. Amanca hêzê bikaranîna peyvên serdest û cextkirî ne, wek: sondxwarin, peyvên pêwîstîyê, peyvên redkirinê, peyvên nalîn, peyvên du'akirinê. Herweha wateya awazê jî dema ku awayê gotin û bilêvkirina axaftinê diguhere, lê di gotinên mezinan de

awaz tune ye, ji ber ku gotinên mezinan bi awayekî xweş û bikêr tînin gotin, dema ku awaz di gotinên mezinan de were bikaranîn, dê wate û giringîya xwe winda bike û namînin gotinên mezinan dê bibin gotinên rojane. Ev cureyê hoşdarîkirinê bi vî awayî di gotinên mezinan de tê bikaranîn:

Yê bi serî sond xwarî (Rêkêş Amêdî, 2019\IV: 1082).

Ev gotina mezinan bi êşkere hoşdarîkirinê dide, bi rêya bikaranîna peyva “sond”, dema ku şer an pîrsgirêk çêdibe, heke kesek were êşan an birîndar bibe, eger ew kes biryara tolhildanê bide, wê demê ev gotina mezinan tê gotin. Raman ew e ku sond xwarîye, ku dê heyfa xwe hilîne. Amanca vê gotinê hişyarkirina kesên gunehbar e da ku ji wî kesî dûr bikevin.

Emanet, emanetê Xwedê ye (Mehmet Oncu, 2020\II: 1170).

Ev gotin hoşdarîyek xweş pêşkêş dike, bi rêya peyvên “emanetê Xwedê”, ev peyv ji bo vê gotinê formeke hêzê ye, ji bo parastina emanetê tê xuyakirin, anku ew emaneta Xwedê ye, yanî divê meriv hay jê hebe û dest nekinê. Herweha divê ew baş bînin parastin, heta xwedanên emanetî werin.

Xweda dibêjê mi ji tifaqê ‘eyb e (Şingalî, 2010: 55).

Ev gotina mezinan bi êşkere mirovan hişyar dike, bi rêya gotina Xwedayê mezin, amanca gotinên mezin xizmetkirina civak û mirovan e, ku nekevin tengasîyan, loma jî di gotinên mezinan de hin peyvên xurt tînin bikaranîn. Ji bo mirov hurmeta van gotinan bigire û di jîyana xwe de bişopîne, ev yek bi xurtî di vê gotinê de xuya dibe. Ew jî bikaranîna peyva Xwedê ye, mana vê gotinê eger Xwedayê ‘erd û asîmanan bi mezinatîya xwe ji tifaqê şerm bike, erê ji bo me mirovên lawaz û çavbirçî ma ne bêhurmetî ye ku em bê tifaq bin. Lewma divê em mirov bibin yek û ji bo belavkirina yekîtiyê bixebitin.

Ser ve la îlahe îlla Allah, ji bin ve ne‘uzubilah (Amêdî, 2019\III: 646).

Di vê gotinê de du gotinên giring ên Îslamê ên giring di nava xwe de bi kar anîne, “La îlahe îlla Allah”, yanî ji Xweda pê ve tu îlah tune ne. “Ne‘uzubilah”, yanî Xwedayê min, ez xwe bi te diparêzim. Amanca vê gotinê ew e ku mirov bi zelalî hişyar bike û bandorê li wan bike, ev gotin hoşdarîyeke tund dide ku ji durûyan dûr bikevin, ji

ber ku ew dê ji mirovan re bibin êş û nexweşî, ev minafiq xwe wekî mirovên baş nîşanî civakê didin, lê bi rastî ew mirovên pîs in û Xwedê nas nakin, ji ber ku guneh û xirabîyên gelek mezin dikin.

Heta bi çavê xwe nebînî, sondê li ser nexwîne (Amêdî, 2019\IV: 966).

Di vê hevokê de peyvên “sond nexwin” an jî sond nexwînin formeke hêzê ye, bi rêya vê formê tê zanîn ku ev gotin bi eşkere hoşdarîyê dide mirovan, Mebesta vê yekê ew e her tiştê ku mirov dibêjin hûn bawer nekin, çimkî her kes ji bo berjewendîyên xwe diaxive. Ev gotin mirovan hişyar dike ku heta hûn tiştêkî bi çavên xwe nebînin bawer nekin û sond nexwin. Herweha dibêje ku nabe axaftinên xelkî bandorê li me bikin û em bibin dîvelankên wan.

Sozê mêrê çê betal nabe (Oncu, 2020\IV: 484).

Ev gotina mezinan bi awayekî eşkere û bi rêya peyva “sozê” mirovan hoşdar dike. Ji ber ku ev peyv li hember peyva sondxwarinê ye û ji bo vê gotinê dibe forma hêzê. Ev gotin du hoşdarîyan dide, ya yekem mêrê baş her tim soza xwe tîne cih, eger di şert û mercên giran de jî be, yan jî barê wî çiqas giran be, ew dê soza xwe bê dudilî bîne cih, bi vê fikrê bi mêrê merxas bawer bikin, ji ber ku xwedan sozin. Hoşdarîya duyem ev e ku ji bo ku hûn bibin mirovekî baş, divê hûn sozên xwe bicih bînin, ger hûn vê nekin hûn ê bibin mirovekî xirab û civak jî dê ji we birevin. Feydeya vê gotinê ew e ku mirov û civakan pal dide, ku li gotinên xwe xwedî derkevin, anku gotinên xwe bi kirinan îsbat bikin.

Hey teqdîr barî feyde nakit hişyarî (Amêdî, 2019\IV: 1042).

Di vê gotinê de her du peyvên “hey û teqdîr” formên xurt in û bi rêya van formandîyar dibe ku ev gotin hişyarîyeke eşkere ye. Wateya vê yekê ew e ku Xwedê ji bo mirovan çî nivîsandibe dê bibe, ne kêr ne zêde, eger qedera Xwedê bê, çî hişyar bî û çî jî mijûl bî dê were, ev bi zelalî mirovan li ser hêza Xwedê hişyar dike. Bi vê wateyê mezinahî tenê ji Xwedê re ye, ew Xwedayê dinya û axretê ye, ma ev ne dînatî û xişîmî ye mirov xwe mezin bike, çimkî dizane ku qedera cîhana mirovan ne di destê mirovan de ye, yanî wenda ye tenê Xwedê dizane.

Jina xirab bela ye, îşallah çu mal ew bela nebin (Amêdî, 2019\III: 608).

Peyva “îşallah” di vê gotinê de şiklê hêzê ye, nîşana du‘a û hêvîxwestinê ye. Ev form di vê gotinê de hişyarîyek eşkere ye. Amanca vê yekê ew e ku ji jinên xirab dût bikevin, ji ber ku ew felaket in. Bi vê wateyê jinên xirab dikarin malan xirab bikin û bibin sedema şer û nexweşîyê. Ev gotina mezinan me hoşdar dike ku em ji van jinên xirab dût bisekinin, ji bo ku nekevin nava alozî û wêranîyê, lê divê bê gotin ku jina qenc xêr e û ne‘met e, ew e malan ava dike, yanî yên ku malan xirab dikin û ava dikin jin in.

Ya Allah ya Hey, eger tu nedey, çi biket Hatimê Tey (Amêdî, 2019IV: 1074).

Di vê gotinê de her du peyvên “Ya Allah û Ya Hey” navên Xwedê ne, wekî şêweyên hêzê ne. Ev form nîşan didin ku ev gotin hoşdarîyek eşkere ye. Di vê gotinê de bi her du navên Xwedê gazî wî dike û dibêje: "Hatim çi bike ku tu nedî?" Navê Hatimê Tay Merdîniyê çûye, dema mirovekî dewlemend û merd yanî çavvekirî hebe, wî bi Hatim re didin ber hev. Mebesta vê yekê ew e ku bêtî Xwedê kes nikare tiştê bike, bila Hatimê Tay jî be, bi vê wateyê desthilatdariya Xwedê ya herî mezin e, ev gotin mirovan hişyar dike ku bizanin ku tenê hêza Xwedê bêdawî ye, yanî hêza hemû însanan bisînore.

Tajî dibêjit ya Allah û kêrvoşik jî dibêjit ya Allah (Amêdî, 2019II: 336).

Di vê gotinê de peyva “Allah” du caran hatîye bikaranîn, ev peyv wekî hêzekê tê bikaranîn ku nîşan bide ku hoşdariya vê gotinê eşkere ye. Peyva Allah yanî ya Xwedê yan bi navê te Xwedê, amanc ew e ku her tişt bi navê Xwedê dest pê bike. Ev gotin bi eşkere mirovan hişyar dike ku di her tiştî de Xwedê ji bîr nekin, wekî ku di vê gotinê de tê gotin. Tajî diçe nêçîra xwe û kêrvoşik jî ji bo ku nekeve nêçîrê direve, her du jî bi navê Xwedê vê yekê dikin. Amanca tajî bi navê Xwedê ew e ku Xwedê alîkarîya wî bike û hêz bide wî ku ew kêrvoşik bigire û bixwe û amanca kêrvoşik ew e ku Xwedê alîkarîya wê bike û tajî wê nexwe.

Aha bizina koç ji bizina bi şax naçît (Amêdî, 2019I: 138).

Peyva “Aha” an jî ax tê wateya êş û jan, ev peyv wekî forma hêzê ye. Bêguman ev gotin bi eşkere hoşdarîyê nîşan dide, li vir bizina koç yanî bêşax behsa feqîr û hejaran dike, lê bizina bi şax wekî kesekî bi hêz û desthilatdar nîşan dide. Amanca vê gotinê ew e, mirovan hişyar bikin ku zilmê li kesî nekin, çimkî tişt kevin dibin, lê nayên jibîrkirin,

heger roja feqîr û hejaran bê ew dê tola xwe ji zaliman hilînin, bi vê wateyê xem û girî wê rojekê bibe gazî û hewar.

Her tişt xweş e we‘dê Xweda (Sindî, 2009: 76).

Di vê gotinê de peyva “we‘dê Xweda” yanî soza Xwedê, nîşana hêzê ye. Lewma hoşdarîya vê gotinê eşkere ye. Wateya vê yekê ew e ku heke tiştek bi soza Xwedê bihête kirin, ewd ê kêfxweş û hilberîner be, ji ber ku dema soza Xwedê bê dayîn, ew tişt dê rast bê kirin û di berjewendîya gel de be, yanî kes ji bo berjewendîyên xwe kar nake, ev gotin eşkere bi erkê hişyar kirina mirovan radibe û dibêje: Ger hûn dixwazin aram û bextewar bin, bi soza Xwedê bixebitin û tu kêmasîyan nehêlin, çimkî Xwedê ji her tiştî agahdar e.

Xwezî bi aqilê pêşî (Amêdî, 2019\II: 45).

Peyva “Xwezî” tê wateya hêvî yan daxwazê, bi peyva “xwezî”yê dîyar dibe ku ev gotin hoşdarîyek eşkere ye. Dema ku kesek tiştekî bêfîkrî dike ger karê wî bi ser nekeve, di dawîyê de vê gotinê dibêje, ev gotin bi awayekî eşkere ji civakê re wekî hoşdarîyekê ye, ew ji wan re dibêje: Destpêka tiştan ji dawîyê giringtir e, ger hûn di destpêkê de û li ser bingehek saxlem û baş bifikirin, di dawîyê de wê encamên baş û serkeftî hebin. Bi vê wateyê hoşdarîkirin xizmetkirin û rêberîkirina civak û mirovan e, ger guh bidin pey peyamên hoşdarîkirin, ew dê civakê biparêzin û geş bikin û dê ji nexweşî û zirarê dûr bikevin.

Îşallah çoka li ber ve nedy (Amêdî, 2019\I: 212).

Di vê gotinê de peyva “Îşallah” tê wateya du‘a û nîfirê, ev peyv formê hêzê ye. Wateya vê gotinê ew e ku Îşallah nebîye zava, dema ku kesek nexweşî û derdeserîyek giran dikişîne ev tê gotin, li wê demê ji bilî nîfiran nikare tiştekî li wî kesî bike ewê ku ew xistîye wê rewşa nexweş. Ev gotin bi eşkere hoşdarîyê dide mirovan, divê ji mirovan re rêz were girtin, ew dibêje: Nabe ku bi tu awayî mafên mirovan were bînpêkirin, bi taybetî mafên evîndaran, çimkî kesên evîndar ji alîyê ruhî ve gelek diloan û lawaz dibin, ji ber vê yekê bila kes ji wan re nebe asteng, ger kesek nehişt ku ew bigihîjin hev, yanî dema kesek bixwaze ku bi keçeke evîndar re bizewice, hevalê wê ji ber civaka kurdî nikare tiştekî bike, ji ber vê yekê ew xwe dispêre Xwedê û vê gotinê dibêje.

Şerî‘et bibirît, xwîn jê nahêt (Amêdî, 2019\II: 487).

Di vê gotinê de peyva “Şerî‘et” ê tê wateya qanûnên Xwedê, ev peyv nîşana hêzê ye, tê wê maneyê ku eger qanûna Xwedê be, her kes razî ye. Ev gotina mezinan bi awayekî eşkere ji rayedaran re wekî hoşdarîyekê ye, dibêje: Her kes ji qanûna Xwedê razî ye, ger hûn dixwazin civak ji we hez bike û ji biryarên we re rêz bigire, divê hûn qanûna Xwedê bi cih bînin. Çimkî qanûn rewşa ye û her kes jê azad e, bi vê wateyê qanûnên Şerî‘etê çiqasî xurt û hişk bin jî, her kes di bin bandora wan de ye, çimkî dizanin ev di berjewendîya wan de ye.

Tinê bo Xwedê baş e (Amêdî, 2019\II: 354).

Peyva “Tinê” di vê hevokê de tê maneya lêhûrbûnê, mebesta vê yekê ew e ku tenê Xwedê dikare tenê bimîne, tenêti yek ji sifetên Xwedê ye. Ev gotin bi eşkere hoşdarîyekê dide mirovan, dibêje: Hişmend bin û xwe ji mirovan dûr nexin. Herweha nabe ku ew li tenêtiyê jî bifikirin, ji ber ku mirovên asayî nikarin bi tenê bijîn, ji ber ku di cîhanê de mirov hewcedarê hev in, çimkî ger mirov xwe ji mirovan dûr bixe û bi tenê bijî dê rastî pirsgerêk û felaketan bê.

Bes muxberê deng jê nahêt (Amêdî, 2019\I: 245).

Peyva “Bes” di vê hevokê de tê maneya lêhûrbûnê, mebesta vê gotinê ew e ku tenê goristan bêdeng e, ev gotin bi eşkere hoşdarîyekê dide mirovan, çimkî li goristanê tenê cenaze hene, lewma goristan bêdeng e, yanî li goristanê gîyan nîn in, bi vê wateyê kesê bê kar ew kesekî bêdeng e, ew mîna cesedekî bê can e, anku ji bo berdewamkirina rêwîtiya jîyanê divê bixebitin.

Ay hewar û sed hewar, bo nezanê neguhdar (Amêdî, 2019\I: 138).

Di vê gotinê de peyvên “Ay hewar û sed hewar” formên hêzê ne, bi wateya hêrs û xemgînîyê tê, ji bo teselîya kesên neguhdêr jî tê bikaranîn. Ev gotin bi eşkere hoşdarîyekê dide da ku cahil guh bidine wan, ji ber ku jîyana cahilan ber bi xirabîyê ve diçe. Herweha bi erkê hişyarkirina mirovan radibe, ku ber bi zanîna biçin, çimkî ger nezanî mirov dagir bike, ew êdî guh nade kesî û dê bifikire ku ew rast e û her kesê din xelet e.

Rehmet li gora kefendizî (Amêdî, 2019\II: 557).

Peyva “Rehmet” li vir formek bi hêz e û ji ber vê formê ev gotin bi eşkere hoşdarîyekê dide mirovan, çimkî gelek tiştên xirab têne kirin, hişyar bin, dema karekî xirab an jî dizîyeke giran tê kirin ev tê gotin, mebest ji vê yekê ew e ku Xwedê ji kefendiz razî be, yanî ev xirabî ya hatî kirin, ji dizîna kefen gelek xirabtir e.

3.2.2. Hoşdarîkirina Nepenî di Gotinên Mezinan de

Ev stratejîya hoşdarîkirinê di gotinên mezin de wekî xeyalek taybetî xuya dibe. Anku ji her sê stratejîyên din cuda ye. Bi vê wateyê hêz û melodîya axaftinê nîne û wateya wê bi forma gotinê nayê îfadekirin û tu wateyên nerasterast jî nagire, yanî derdor di vê stratejîyê de rol nalîzin, lê hinek bawerîyên olî, civakî û netewî îfade dike, ev bawerî ji aliyê her kesî ve nayên pejirandin, dibe ku gelek ji van bawerîyan bawer nekin, çimkî dibe ku civak û olên wan ên cuda hebin, bi vê wateyê ev stratejî fikrek an jî bawerîyek e, lê di pêkhateya gotinê de nayê dîtin. Di vir de divê were zanîn ku gotinên mezinan gelek fikir û ramanan di nava xwe de dihevin, her kes bi awayekî fam dike, ji ber ku eger komek ji mirovan heman ravekirin ji bo heman gotinê hebe, wê demê ew dê ne gotina mezinan be, wê bibe gotina jîyana rojane. Ev stratejîye bi vî awayî di nava gotinên mezinan de tê xuyakirin:

Bawerîya Kurdan her bi çîya tê (Oncu, 2020\III: 769).

Ev gotin fikra bîdewletbûn û bîxwedîtîyê hildigire. Ev fikir di nav piranîya kurdan de heye, dibe ku hinek bibêjin ev fikir derew e, lê ev bîdewletbûn ji bo kurdan bûye derd. Ji ber vê yekê, ev raman di vê gotinê de bi xweşîkî hatîye xemilandin, bi vê fikrê kurdan hoşdar dike ku bibin yek û ji bo berjewendîyên neteweya kurd kar bikin. Rast e wê çîya Kurdan bihevin, lê çîya nikarin ji hemû Kurdan re xwarinê amade bikin, lewma divê ev gotin bandorê li Kurdan bike, ku bibin yek, ev fikir wekî bawerîyeke netewî ye.

Tuyek li hewşa xwe çand (Se‘îd, 2011: 49).

Di vê gotinê de peyva “Tu” û kurdîyê bi hev ve girêdayî ne. Dema kurd li cihekî binecî ban dareke tuyê di mala xwe de diçandin, yanî fikrên wan ên kurdewarî saxlem in. Li çîya nebin jî dê kurd bin û xizmeta kurdîyê bikin, eşkera ye her kesê ku kurdîyê bike, ew dê yan bê girtin yan jî bê kuştin yan jî neçar bimîne ji welêt bireve, ev qedera

kurdan e. Amanca vê gotinê ew e ku ji xwe re felaketek çêkir, vê ramanê wekî bawerîyeke netewî di jîyana kurdan de cihê xwe girtîye.

Dinê bişêwire, lê bi aqilê xwe bike (Sindî, 2009: 63).

Ev gotin fikra bêbawerîyê îfade dike. Ev gotina giranbiha hoşdarîyek pir xweş pêşkêşî civakê kirîye. Mebesta vê yekê ew e ku hûn li çaralîyê cîhanê bigerin û tiştê ku hûn nizanin bipirsin, şewirmendîyê bigirin an guh bidin mirovan, lê hay ji xwe hebin ku ji kesî bawer nekin. Ev bawerîya milletê kurd e, ji ber ku neteweya kurd di jîyana xwe de her tim rastî îxanetê hatîye, ev ji bo kurdan bawerîyeke netewî ye.

Ez zikê wî dixim, ew divê: Wey pişta min! (Sindî, 2009: 83).

Ev gotin bê xwedîtîyê îfade dike, yanî kesekî bêxwedî ye, yanî çi nas û mirovên wî nînin. Ji ber vê yekê, li zikê wî dixê ew dibêje: Ax pişta min, bi vê ramanê zikê wî diêşe, lê êşa wî ya mezin bêpişt û bêxwedîtî ye, çimkî ger nas û mirovnên wî heban, kes nedikarî li wî bixe. Ev yek kurdan îfade dike, mebest ji vê yekê jî ew e, ku em Kurd mêrxas in û natirsin, lê em bêxwedî ne, ev jî bawerîyeke netewî ye û me hoşdar dike ku em ji nas û civaka xwe dûr nekevin.

Xwedê dûr dike, lê bîr nake (Sindî, 2009: 83).

Ev gotin mirovan hoşdar dike, ku bêhêvî nebin, anku divê mirov her tim hêvî bi dinya û axretê hebe. Ev yek bawerîyên olî îfade dike, heke hûn qencîyekê bikin û xelata wê nebînin, piştrast bin ku Xwedê we di axretê de xelat bike, di heman demê de heke kesek zorîyê li we bike, divê hûn bêtir nefesê bistînin, çimkî yan Xwedê wê heyfa we hilîne, yan jî dê roja we jî were, ku hûnê bi hêz bibin û hûn bi xwe dê tola xwe hilînin.

Pêlên mayîn ji yên çûyîn pitir in (Amêdî, 2019\II: 328).

Ev gotin bawerîyeke civakî îfade dike, ev bawerî li dor temenê mirov e, anku dema ku mirov pîr dibe, tenduristîya mirovan xirab dibe û mirov nexweş dibin. Mebest ji vê yekê ew e ku dibêje: Ji nexweşîyên çûyî zêdetir nexweşî mane. Çimkî di ciwantîyê de mirov li ser hêza xwe ye, lewma eger nexweşîyek were, zêde bandorê li mirov nake, lê di pîratîyê de eger mirov nexweş bibe, hêza mirov kêmtir dibe, mirov dê pir nexweş bibe û dê bandoreke mezin li ser mirovan bike. Ger ev bawerîya hatî gotin, di nava hemû mirovan

de nebe jî, civakê wekî bawerîyek ji me re gotîye, pîratî we nexweş dike û tenduristîya we xirab dike.

Nêçîrvan Teyrê xwe li mijê bernadê (Şingalî, 2010: 200).

Ev gotin hoşdarîkirinekê dide gel û civakan, di derbarê mijara bazirganîyê de ev bawerî ji civakê tê. Mebesta vê gotinê ew e nabit ku bazirganî û kar li ser prensîbên veşartî bihêne kirin, ji ber ku dawîya wê dê nexweş be, yanî dê zirareke mezin bibîne. Bi vê wateyê ev gotin hoşdarîyê dide microvan, ku tiştên berçav bikirin û bifiroşin, anku bazirganî divê li ser prensîbên saxlem û bawerîyê bihêne kirin, çimkî ji bo mirovatî û civakê bi giştî encamên baş û bikêrhatî wê hebin.

3.2.3. Hoşdarîkirina Rasterast di Gotinên Mezinan de

Ev stratejîya hoşdarîkirinê rasterast di gotinên mezinan de xuya dibe, anku rasterast di navbera pêkhateya gotinê û erkê gotinê de têkilîyek heye. Ev yek bi awayên ragihandin, pirs û daxwazan tên îfadekirin, gelek caran peyvên rasterast jî hene, ku vê stratejîyê îfade dikin, ev stratejî bi vî awayî di nava gotinên mezinan de xuya dibe:

Gelê raze ranabe, lînexî hişyar nabe (Oncu, 2020\I: 54).

Ev gotin hoşdarîyeke rasterast pêşkêşî milletî dike, ev yek bi rêya peyva “hişyar”, anku şiklê ragihandinê ye. Ev çend delîl e ku ev gotin rasterast civak û mirovan hoşdar dike, ev tê wê maneyê ku ger civak û netewe hişmend û zana ne bin, ji bo hişmend kirina wan zordestî û lêdan hewce dike, bi vê wateyê ger civak bikeve xewa xefletê, ji bo şîyarkirina wan pêwîstî bi hêzê heye.

Ku mirov qenc be, dinya qenc e (Oncu, 2020\I: 845).

Ev gotina mezinan hoşdarîkirina rasterast pêşkêş dike, ev bi rêya forma ragihandinê tê kirin. Vê gotinê hoşdarîyek xweş bikar anîye, dibêje: Ger hûn dixwazin dinya, yanî mirov û civak ji we re baş bin, divê hûn ji wan re dilovan û rêzdar bin, çimkî qencî û xirabî di destê mirov de ye. Heger tu baş bî, hemû dinya baş e û heger tu xirab bî, hemû dinya xirab e. Anku hûn ji kirinên xwe berpirs in, bi vê wateyê ger hûn vê gotinê bişopînin û di jîyana xwe de pêk bînin, jîyan dê pir çêtir be, ev yek ruhê lêborîn û dilovanîyê li civakê belav bike.

Sifreya xwe li ber her kesî ranexe (Oncu, 2020\II: 260).

Ev gotin bi rêya forma ragihandinê hoşdarîyeke rasterast dide mirovan. Ev tê wê wateyê ku divê derîyên xwe ji her kesî re venekin, yanî tu nikarî hemû mirovan bikî mala xwe de anku ne hewce ye ku hûn bi her kesî re bibin heval, yanî nabe ku bi her kesî re rabin û rûnin, divê guh bidin vê gotinê ji ber ku mirovan û xirabîyên mirovan ev dinya wêran kirîye, ji bo ku mirov bê parastin û ji pirsgirêk û felaketan dûr bikevin divê mirov guh bide vê gotinê.

Bawerîya Kurdan her bi çîya tê (Oncu, 2020\III: 769).

Ev gotin bi rêya formê ragihandinê û bi awayê rasterast milletê kurd hoşdar dike, ji bo ku ji bilî çîyayan bawerîya xwe bi tu kesî neyînin. Amanca vê gotinê ew e ku di dirêjahîya dîrokê de dijberên kurdan xîyanet li milletê kurd kirine, tu carî bi çavên biratî û bihevrejîyanê li kurdan nenêrîne. Her tim xwestine ku kurd bindest bin, ji ber vê yekê jî ev gotin milletê kurd li ser nîrxê millet şîyar dike, da ku ew êdî tu nexweşî û êşê nebînin.

Sozê merê çê betal nabe (Oncu, 2020\IV: 484).

Ev gotina mezinan rasterast hoşdarîyekê dide, amanca vê yekê jî hişmendkirina gel û civakê ye, da ku bizanin merivên baş û xirab ji hev cuda bikin. Ji ber ku di vê dinyayê de kêma kes soza xwe pêk tînin. Ev gotin dibêje ku mirovên qenc di çi şert û mercên dijwar de jî bin, dê soza xwe bi cih bînin, ev tê wê wateyê ku eger hûn mirovên weha bibînin, rêz ji wan re bigirin, çimkî kesên xwedan soz di vê serdemê de têkrar bûna wan zehmet e.

Ew bîra te av jê vexwarî, kevra navêjê (Şingalî, 2010: 10).

Ev gotin di şiklê ragihandinê de ye û rasterast mirovan hoşdar dike, mebesta vê yekê ew e ku nabe mirov bê paşî bin, anku heke kesek qencî li te kir û te ji cihekî yan tişteki sûd wergirt, ji ber ku te jê sûd wergirtîye ne hewce ye ku tu bi xirabî behis bikî. Di vê gotinê de hoşdarîyek rasterast heye, bi şêwazê şîretan tê gotin, ji bo ku bandorê li dilê mirovan bike, çimkî ger mirov guh bide vê gotinê dê ruhê dilovanî û hezkirinê li cîhanê belav bibe.

Ev dinya Xan e, mirov têda mêvan e (Şingalî, 2010: 18).

Ev gotin bi awayekî rasterast û pir xweş wesfa dinyayê kirîye. Dibêje ku ev dinya xane ye, yanî ne ya tu kesî ye, anku mirov tê de mêvan e. Mebest ji vê yekê ew e ku mirov xwe radestê dinyayê nekin, yanî nebin dîlên dinyayê, çimkî dinya û xweşîya dinyayê xapandin e, ev gotin hewl dide ku bandorê li mirovan bike, ji bo ku meriv ji bo serfirazîya dinyayê bixebite û hewcedarê nemerdan nebe. Lê ya giring ew e ku ji bo axretê bixebitin, ji ber ku ew cih ji bo mirovan cihê rast e.

Terka dostaniya dostê babê xwe mede (Şingalî, 2010: 40).

Ev gotin rasterast hoşdarîyekê dide mirovan. Amanca vê gotinê şîretkirina civakê ye, dibêje: Hevalên bavê xwe ji bîr nekin, yanî dev ji wan bernedin û ji wan dûr nekevin. Çimkî hevaltîya mirovên mezin hevaltîya dil e, bi taybetî ji hevalê bav û kalê mirovan, bi vê wateyê ev gotin ji valayê derneketîye, anku bûyerek qewimîye, ji xeynî hevalên bav û kalên mirov tu kesî xwe li wan nekirîye xwedan, bi vê wateyê dîyar bû ku kî bû xwedanê mirovî di tengasîyê de ji ber vê yekê divê rêz li hemû mirovan bê girtin, ji ber ku dinya xweşî û nexweşî ne.

Şihîna Hespê ji hinera wê ye (Şingalî, 2010: 123).

Ev gotin rasterast hoşdarîyê dide mirovan, dema hesp li meydanê dengê xwe derdixe, ev nîşana huner, hêz û zanîna hespê ye, bi vê wateyê ger hesp bi hêz û jêhatî be, lê eger ew li meydanê êşkere neke, ji bo çi ye? Amanc ji vê yekê ew e ku mirov hişmend bike. Ji ber ku mirov çiqasî bi hêz û hunermend be jî, eger vê yekê di xizmeta mirov û civakê de neke, bêkêr e. Ji ber vê yekê divê mirov zanîna xwe pêşkêşî mirovahîyê bike, lê divê bê zanîn ku ev yek di berjewendîya mirovan de ye, çimkî ew dê di berdêla vê zanînê de qezencê bistînin.

Nêçîrvan teyrê xwe li mijê bernade (Şingalî, 2010: 200).

Ev gotina mezinan ji mirovan re dibêje ger dinya mij be, nêçîrvan teyrê xwe naberde, ji ber ku eger berde jî bêkêr e, çimkî nêçîrê nagire. Amanca vê yekê rasterast hoşdarkirina mirovan e, da ku ew her dem nexebitin, di şûna wê de divê karê xwe li gorî derdora xwe û jîngeha ku tê de dijîn bikin, ger rewşa bazarê ne aram be, divê bazirganîyê

nekin, divê di hemû demsalên salê de çandinîyê nekin. Amanca vê yekê ew e ku mirov hişmend bike û bandorê li wan bike, da ku ew fêr bibin ku her tiştî di wextê rast de bikin.

Berkê ber hewara ye (Şingalî, 2010: 10).

Ev gotin rasterast civakê li ser kesekî agehdar dike, ew eşkere dike ku ew di hemû xweşî û nexweşîyan de amade ye, yanî çi tiştê hebe ew pêşeng e, amanca vê daxuyanîyê ew e ku divê rêz û qîmetê bidin wan mirovan, ji ber ku kêma kes hene ku di hemû bextewarî û nexweşîyan de li pêş bin, lewma divê ji civakê re bibin mînak, da ku civak bikare çav li wan bike.

Asinger le pençekanî ra dîyar e (Hemûd Gerdî, 2005: 14).

Ev gotin rasterast di şiklê regihandinê de peyamekê dide, da ku hişmend bin, ji ber ku hemû ne yên hemû xebatan e, yanî ji roxsar û şiklê mirovan dîyar e, çi kar dikin, ev gotin dibêje: Hesinkar bi dest û tilîyên wî xuya ye, ji ber vê yekê, şiklê mirovan eşkere ye ku ew karkerên baş in an na, gotinek heye dibêje: Yê ku sermayê li pişt pencereyan bibîne û di fîlman de tirs û birçîbûnê bibîne, ew bikêrî rêberîyê nayê, bi kurtasî, divê her kes wî karî bike ku jê re gunca be.

Însan şîrî xawî xwardîye (Gerdî, 2005: 31).

Ev gotina mezinan di formê ragihandinê de, hoşdarîyek rasterast dide mirovan. Ev tê wê wateyê ku mirov bi tiştekî xav mezin bûye, yanî bingeha wî ne baş e, ji ber vê yekê divê bawerîya xwe bi mirovan neyîne, lê divê ev yek me ji mirovan dûr neke, ji ber ku li vê dinyayê gelek mirovên qenc hene. Mebesta vê yekê ew e ku hûn ji mirovan bawer nekin heta ku hûn wan baş nas nekin, bi vê wateyê ev gotin mirovan hişmend dike, da ku mirov li ser bingeheke saxlem ji bo kar û hevaltîyê bêne hilbijartin.

Kuwêr le tarîkî natirsê (Gerdî, 2005: 130).

Ev gotina mezinan rasterast hoşdarîkirinê dide, dibêje: Kor ji tarîyê natirse, yanî çi tarî be çi ronahî be, wekî hev e, ji ber ku ew nabîne. Mebesta vê yekê ew e ku eger mirov ji tiştekî netirse, divê jê neyê ceribandîn, ji ber ku hûn dê bixisrin û zirarê bibînin, bi vê wateyê mêrxas ji şer natirsin, xwedan dil jî ji merdîniyê natirsin.

Bawik gunah eka û ewlad pê gîr eka (Roxzadî, 2003: 67).

Ev gotina mezinan tişteki giring radigihîne û rasterast hoşdarîyê dide mirovan. Ew dibêje zarok ji kirin û xeletîyên bavê xwe berpirs in. Amanca vê yekê ew e ku hûn hay jê hebin ka bav û kalên we bi kesekî re pirsgerêkek heye, eger wan berdêla pirsgerêkên xwe nedabin, divê hûn hay ji wan kesan hebin, ji ber ku ew dê zirarê bidin we. Amanca vê yekê ew e ku hay ji xwe hebe ku nekeve tu bela û nexweşîyan, ev yek di mijara neyarî û dojminkarîyê de baş xuya dibe.

Rîşim le ber xwera çermig nekir dike (Roxzadî, 2003: 222).

Ev gotina mezinan rasterast hoşdarîyê dide mirovan, dibêje: Ev rîh ji qasta spî nebûne, yanî ji betalîyê hulê nehatine. Amanca vê gotinê şîyarkirina mirovan e, nabe bi hemû mirovan re bi heman awayî biaxivin û serederîyê bikin. Çimkî mirovên aqilmend, dinyadîtî û xwedanserbûr hene ku dê ji we re sînoran dayînin, çimkî asta zanîn û têgihîştina wan ji ya we bilindtir e. Kesên nezan û neguhdar jî hene ku dê we biêşînin û we hêrs bikin, ji ber ku asta têgihîştina wan kêm e. Bi vê wateyê heke hûn dixwazin ku bi rêz û qîmet bin, divê mirov li gorî temen û asta têgihîştina mirovan bi wan re têkildar bibe.

Dinê bişêwire, lê bi aqilê xwe bike (Sindî, 2009: 63)

Ev gotin bi forma fermanî û rasterast hoşdarîyê dide mirovan, dibêje: Li dinyayê binêre, lê bi hişê xwe tev bigere. Wateya vê yekê ew e ku ji bo fêrbûna zanîna li cîhanê bigere, bi vî awayî hûn ê adet û rabûna mirovan fêr bibin, anku asta zanîna we dê zêde bibe. Lê gava hûn dixwazin tişteki bikin, bi hişê xwe bikin, tiştê ku hûn dizanin ji bo we baş e û di berjewendîya civakê de ye bikin, lê divê hûn bizanin ku ya ku hûn dikin bi bawerîyên we yê civakî re hevaheng e, bi vî awayî hûn ê di civakê de bi ser kevin û rêzdar bin.

Ez axa tu axa, kî golka bibe nav baxa? (Sindî, 2009: 67).

Ev gotin di forma pirsê de hoşdarîyeke rasterast û xweş pêşkêş dike. Di vê gotinê de ew pirsêk pir xweşik dike, ji ber ku axatî berhema nezanîn û xeşimîyê ye. Amanca vê yekê jî hişmendkirina civakê ye, ku ji vê mijarê dûr bikevin. Ji ber ku her kesê têr xwar nabe ku bibe axa, eger hemû bibin axa kî dê tiştên din bike? An jî dê ev hemû axa

desthilatîyê li kê bikin? Bi vê fikrê re wê di civakê de şer, nexweşî û pîrsgirêk rû bidin, çimkî axatî mirovî fêrî poz bilindîyê dike.

Xwedê dûr dike, lê bîr nake (Sindî, 2009: 83).

Ev gotina mezinan di şiklê ragihandinê de hoşdarîyek rasterast dide mirovan, ji bo ku li xwe û mirovên din tiştekî xirab nekin. Ji ber ku tu tişt di ser mirov re derbaz nabin û wenda nabin. Mebesta vê yekê ew e ku hûn çî bikin hûn dê li dor wê kirinê werin xelat û cezakirin. Ev tişt Xwedê gotîye û mezinan ji me re xweş vegerandine, da ku em bi zanebûn û serbilindî bijîn. Çimkî dema hûn tiştekî xirab bikin, hûn dê her tim li ser wê bifikirin, ji bilî ku te zîrar û nexweşî ji mirovan re çêkirîye, herweha bandorek mezin li ser dil û mejîyê te jî dike.

Cehnem ne hinda germe wekî jê dibêjin (Se'îd, 2011: 53).

Ev gotina mezinan di şiklê ragihandinê de rasterast hoşdarîyê dide civakê, dibêje: Agirê dogehê ne bi qasî ku mela dibêjin germ e. Divê hay ji vê gotinê hebin, ji ber ku mebesta vê gotinê ne bêhurmetîkirina axaftina Xwedê û ne jî ji axaftina melayan e. Amanca vê gotinê û peyama hoşdarîyê ya ku tê de heye, wekî her car xizmeta guhdêran e, di demên berê de mela, pîr, qeşe û şêxên xapînok hebûn, bi navê olên pîroz civak dixapandin, yanî ol ji bo berjewendîya xwe bi kar dianîn, li wê demê kesên zane û aqilmend hebûn ji civakê re ev gotin pêşkêş kirin, da ku ew hemû gotinên wan bawer nekin û li hember wan jî rabûn, ji bo ku sînorek ji karên wan yên qirêj re dayînin, çimkî ev yek van olên pîroz bêqîmet dike û civakê wêran dike.

Axaftinên bab û bapîra, çêtir in ji yê hakim û wezîra (Amêdî, 2019\I:102)

Ev gotin bi awayekî rasterast û li ser şiklê ragihandinê hoşdarîyê dide civakê, dibêje: Gotinên ronakbîr û mezinên we ji gotinên huqûq û şaristanîya nûjen çêtir in. Ev nayê wê maneyê ku li gorî qanûn û desthilatdarîyê tev negerin, di şûna wê de hewce dike ku civak ji gotin û çîrokên bav û kalên xwe sîd wergire da ku jîyana xwe birêve bibe. Ji ber ku ev gotin ji civakê hatine girtin û li gorî bawerîya wan in, civak hemû jî van gotinan dişopîne, lê gotin û qanûnên desthilatdarîyê ji çandê nayên girtin, belê, ew berhema şaristanîyê ye û dibe ku bi bawerîyên civakî re ne li hev be jî.

Asinê bê esas, nedibite şîr û nedibite das (Amêdî, 2019\I: 106).

Ev gotina mezinan di şiklê ragihandinê de rasterast hoşdarîyê dide civakê, dibêje: Hesin bê esil û lawaz nabe şîr û das. Amanca vê yekê tişt û mirovên bê qîmet, mezin û rêzdar nekin, çimkî ew ne hêja ne. Herweha dibêje ger hûn hesinê lawaz bikin şîr, ew ê di şer de bişkê yan xwar bibe û bibe sedema zîrarê. Di heman demê de heke hûn bikin das di dema xebatê de ew ê bişkê, yanî nikare birêkûpêk xizmetê ji mirovan re bike, di her du rewşan de jî dê karê mirovan nîvco bibe, ji ber vê yekê divê hûn guh bidin vê gotinê.

Agirê koçkî tim yê germ e, direng sar dibit (Amêdî, 2019\I: 134).

Ev gotin rasterast hoşdarîyê dide, dibêje: Agirê koçkî her dem germ e. Amanca vê yekê ew e ku xwe ji şewatê biparêze, ji ber ku koçik germ be wê zîrarê bide we, bi vê gotinê dixwaze mirovan şîyar bike ku dê agirê koçikî zû sar nebe û venemire, lewma xwe nêzîk nekin.

Ay hewar û sed hewar, bo nezanê neguhdar (Amêdî, 2019\I: 138).

Ev gotina mezinan rasterast du peyamên hoşdarîyê radigihîne, vê gotinê li wî demî dibêjin, dema ku kesek hewl dide ku kesekî din hîn bike, lê ji ber ku ew nezan, neguhdar û bêkêr bû, wateya yekem a vê gotinê hewarkirin û bêhêvîbûn e, ji ber ku ew pir bi mirovên neguhdar ve westîyaye. Amanca vê yekê ew e ku ji mirovên cahil û neguhdar dûr bikevin û wan şîret nekin, çimkî ew difikirin ku ew her tiştî dizanin û ew rast in û her kesê din xelet e. Wateya duyem jî ew e ku gava kesek şîret an jî agahîyekê dide te, divê tu hurmeta wî kesî bigirî û guh bidî wî, ji ber ku dibe ew bi kêrî we were da ku ew di nava xwe de aram be.

Eger ba hat kolavê xo bigire (Amêdî, 2019\I: 157).

Ev gotin hoşdarîyek rasterast dide mirovan, ji bo ku wan biparêzin û nekevin tengasîyê, dibêje: Dema ba tê, kumê xwe bigire, nehêle ba bibe da ku paşê nekevî dîv. Ev tê wê wateyê ku heke pirsgirêkek an şerek ber bi we ve hat, dûr bimînin an lêborînê bixwazin, ji ber ku lêborîn dê nîrxê we di civakê de zêde bike, heke hûn ji pirsgirêkê xilas nebin, ew dê xirabtir bibe, lê di dawîyê de ew her dê çaraser bibe, loma di serî de her kesî efû bike, da ku ruhê lêborînê di civakê de belav bibe.

Eger ba hat Genme Şamî bide bay (Amêdî, 2019\I: 157).

Ev gotin rasterast bi şiklê ragihandin hoşdariyê pêşkêşî civakê dike, dîsa jî ev di berjewendîya guhdêran de ye. Amanca vê yekê ew e ku îşê we baş biçe û genimê we paqij bibe. Lê ji mirovan re eşkere ye, ku hewa bandorê li Genimê Şamê nake, yanî bi xwe re nabe, lê dema ku ba tê birinc û koncîya nede ber bayê, ji ber ku ba dê her tiştî bi xwe re bibe.

Eger tejî devê te xwîn bit, li nik dojminî tif neke (Amêdî, 2019\I: 163).

Ev gotin bi forma fermanî ye û hoşdariyeke rasterast dide mirovan. Amanca vê yekê ew e ku bila tu kes nexweşî û pirsgirêkên we nebîne, bi taybetî dijminên we, ji ber ku ew ê şa bibin. Wateya vê yekê serbilind be û bila kêfa kesî li te neyê, heger nexweşî û problemên we hebin, bila tu kes nebînin, wesa xwe nîşanî mirovan bidin ku hûn aram in û tu pirsgirêk û nexweşîyên we tune ne.

Bi axaftina mirov, mirovan dinyasê (Amêdî, 2019\I: 213).

Ev gotina mezinan bi awayekî rasterast mirovan hoşdar dike, dibêje: Mirov bi axaftinê tê naskirin û asta zanîn û têgihîştina wî dizane, bi vê wateyê ger hûn dixwazin yekî nas bikin, wî bidin axaftin, ji ber ku axaftina mirov berhema kirinên mirovan e. Amanca vê gotinê ew e ku axaftin berhema zanîn û ramana me ye, çimkî em dixwazin çi bikin û çi di bernameyên jîyana me de heye, em hemû yê dibêjin, ev gotin mirovan hoşdar dike, ku hay ji axaftina xwe hebin, ji ber ku hemû gotin li her demî û li her cihî nayên gotin, her cihekî axaftina xwe heye, yanî axaftin bi xweyî ne.

Barê namûsê yê giran e (Amêdî, 2019\I: 219).

Ev gotina mezinan di derbarê mijareke giring de rasterast civakê hoşdar dike, dibêje: Ceza û barê namûsê zehmet e, yanî hemû pirsgirêk çaraser dibin, lê tu rê naçe ser meseleya namûsê, yên namûsê pîs dikin divê bedel û cezayê xwe bidin. Amanca vê yekê ew e ku destwerdana namûsa kesî neke, çimkî meseleya namûsê di civaka Kurdan de mijareke xeternak e.

Bext bextê mêran, nan nanê genim (Amêdî, 2019\I: 231).

Ev gotina mezinan di forma ragihandinê de ye û bi awayekî rasterast hoşdarîyê dide. Amanca vê gotinê ew e ku derbarê du tiştên giring de agahîyan bide mirovan, dibêje: Bext bextê merivekî mêrxas e, yanî problema te hebe, xwe biavêje bextê merivekî mêrxas, çimkî mêrê wêrek tu carî bextê xwe xirab nake, ev dê we biparêze û nehêle ku kesek zirarê bide we. Herweha gelek cureyên nan jî hene, yanî ji gelek madeyan nan çêdikin, lê ji bo nan madeya herî baş genim e, ev her du agahdarî pir giring in ku meriv wan bişopîne.

Berek li asmana veresyê dê bi serê feqîrî kevit (Amêdî, 2019\I: 37).

Ev gotin rasterast civakê li hember feqîr û bêhêzan hoşdar dike, ji bo lênêrîna belengazan, ji ber ku her pirsgirêk û felaketa hebe dê bi serê feqîran de bişkê. Ev bûye adet û cihê xwe di nava civakê de girtîye, dibe ku ev qedera feqîran be. Amanca vê yekê ew e ku xwe li hejar û xîzanan bikin xwedan, ger pirsgirêkek wan hebe alîkarîya wan bikin.

Bitîfaq bin ne ku mêrxas (Amêdî, 2019\I: 257).

Ev gotin rasterast di mijara lihevkerinê de mirovan hoşdar dike, da ku ew li hev bikin. Çimkî lihevkerin ji mêrxasîyê çêtir e. Mirov her gav ne hewceyî mêranîyê ye, lê di her demê de û li her derê yekîtîya mirovan lazim e. Ji ber ku bingeha serkeftinê yekîtî ye. Ger hûn bibin yek, dê ji we were hezkirin û civak jî ji we şerm bike. Gotinek heye dibêje: Civak ji mirov şerm bike, çêtir e, ji mirov bitirs e, çimkî roj wê bê tirs dê bişkê, lê eger civak ji we şerm bike, hûn ê her tim rêzdar û hezkirî bin.

Pare, îman diz e (Amêdî, 2019\II: 317).

Ev gotin rasterast hoşdarîyê dide mirovan, ji bo ku xwe teslîmî pereyan nekin, ji ber ku gava kesek pere bi dest bixe û pereyê wî pir bibe, ew dikare çi bixwaze bike. Dema ku mirov di pereyan de diherike û hemû wextê xwe dide berhevkirina pere û malê dinyayî, wê demê îmana mirov lawaz bibe, çimkî di vê qonaxê de ol, bawerî û amancên mirovî hemû dibin pere, ji xeynî pere û komkirina pereyan tiştek di hişê mirov de namîne.

Tirba siwara her ya kola ye (Amêdî, 2019\II: 347).

Ev gotin di forma ragihandinê de ye û rasterast civakê li ser siwaran an jî şervanan hoşdar dike. Mebesta vê yekê ew e ku mirovên şerker ji mirinê natirsin, ji ber ku eger ew

bitirsîyan, ew dê vê yekê nekin. Ev gotin bi du awayan bikêrhatî ye, yek: Rêzgirtin ji van şervanan re û bi wan re tevlihev nebe, çimkî yê ku ji mirinê natirse, ji kuştinê jî natirse. Ji ber vê yekê jî her ku li hember şervanan xeletîyek bê kirin, dê tola xwe hilîne, feydeya duyemîn: Ev gotin teşwîqek e ji bo bilindkirina morala şervanan da ku axa xwe û welatê xwe biparêzin.

Dewsa Şûra rehet dibe, dewsa gotinan rehet nabe (Amêdî, 2019\II: 499).

Ev gotin rasterast mirovan hoşdarî dikan, ku bi gotinên xwe dilê kesî neşkînin. Ji ber ku gava hûn ji yekî re tişteki xirab bibêjin, dibe ku dilê wî bişikê û heta mirinê jî ji bîr nake. Bi vê wateyê ev yek di civakê de dibe sedema nexweşî û dilgiranîyê. Mebest ji vê yekê ew e ku, eger axaftineke we ya baş hebe bikin, eger tu gotinên we yên baş nebin, bêdeng bimînin, çimkî axaftina xweş dibe sedema aştî û lihevhatinê. Yanî axaftin pir ji şûr zirartir e, ji ber ku şûr tenê zirarê dide laşê mirov, lê axaftin zirarê dide dil û mejîyê mirovan jî.

Kar Şêr e, dest bavêjîyê dê bite Rîvî (Amêdî, 2019\III: 738).

Ev gotina mezinan rasterast li ser karî hoşdarîya mirovan dike, mebesta vê jî ew e ku mirov ji kar netirse, ji ber ku tirs û zehmetîya kar ew e ku hê mirov dest pê nekiri be, dema ku hûn dest bi kar bikin, hûn ê bi hêsanî û di demek kin de bi temam bikin. Feydeya vê gotinê ew e ku morala mirov bilind dike ku bê tirs çi bixwaze dikare bike.

Nivistin birayê mirinê ye (Amêdî, 2019\IV: 959).

Ev gotin rasterast dîyar dike ku xew wekî mirinê ye, yanî dema ku mirov di xew de be wekî mirîyan e, ji ber ku haya mirov ji xwe û derdora xwe nîne. Amanca vê yekê ew e ku mirov hişmend bin û zêde nerazin, çimkî xew bê kêr e, ger hûn pir razên, ew dê feydeya laş neke, lê dibe sedema nexweşîyê, ev jî tê wê wateyê ku divê mirov li cihekî aram razê da ku bê parastin.

Heta bi cavê xwe nebînî, sondê li ser nexwîne (Amêdî, 2019\IV: 966).

Ev gotina rasterast û di şiklê ragihandinê de hoşdarîyek giring radigihîne. Vê gotina mezinan ji bo civaka me ya îro pir pêwîst e. Ji ber ku îro her kes li gorî daxwazên xwe behsa mirovan dike, kesek rast behsa mirovan nake, mebesta vê yekê ew e ku tiştê tê

gotin ne rast e, ji ber vê yekê divê meriv hişmend be ku nekeve tengasîyê, tenê tiştên ku hûn bi çavên xwe dibînin bawer bikin. Herweha behsa sîfetên baş ên mirovan bike û yên nebaş veşêre. Çimkî Xwedê û civak ji kesê ku xirabîyên kesên din vedişêrin hez dike.

Heram ji kesî re helal nabe (Amêdî, 2019\IV: 979).

Ev gotina mezinan rasterast di forma fermanê de biryarekê dide, hoşdarîyê dide mirovan ku heram bi tu awayî helal nabe. Mebesta vê yekê ew e ku bi tu awayî heramîyê rewa nekin, ev tê wê wateyê ku divê di vî warî de asanî neyên çêkirin. Çimkî heram çi biçûk çi mezin be guneh e, hûn dê ji ber vî gunehî bîn cezakirin. Amanca vê yekê ew e ku ji karên xirab dûr bikevin.

Hemû mên nabin şêr (Amêdî, 2019\IV: 1040).

Ev gotina mezinan rasterast hoşdarîyekê dide, ku mirov ji vê yekê haydar bibe, nabe ku mirov bi heman awayî perwerde û zanîna bide mirovan, ji ber ku hemû mirov ne wekî hev in. Ev tê wê wateyê ku hemû mên ne wêrek in. Amanca vê yekê ew e ku mirov li gorî asta wan bi rê ve bibin, da ku qîmeta wan bizane. Ji ber ku hûn ji qîmeta wan zêdetir rêzê li mirovan bidin, ew dê sînor derbas bikin û zirarê bidin we.

Hey teqdîr barî feyde nakit hişyarî (Amêdî, 2019\IV: 1042).

Ev gotine rasterast û di şiklê ragihandinê de hoşdarîyek giring radigihîne, dibêje: Heger qedera Xwedê were wê bê, xwe ji kesî nagire û ji kesî napirse. Di vê gotinê de peyva hişyarî rasterast mirovan ji hêza Xwedê hoşdar dike. Bi vê wateyê desthilatdarîya Xwedê ya herî mezin e, tiştê ku li vê dinyayê diqewime bi daxwaza Xwedê ye û Xwedê ji her tiştî agahdar e. Ger mirov vê gotinê bişopîne dê sûd wergire û ruhê razîbûnê dê di civakê de belav bibe.

Yê hişyar be nekevî, ger tu keftî jî zuy rabe (Amêdî, 2019\IV: 1102).

Ev gotina mezinan rasterast hoşdarîyê dide mirovan, da ku ew hişmend bin. Ev tê wê wateyê ku her tiştî plansaz bikin, ne ku tişteke bêserûber bikin da ku hûn nekevin û zirarê nebînin. Lê ev jîyan her gav bi awayê ku em dixwazin derbas nabe, hin tişt bi plan û rêkûpêk tênê kirin, lê bi ser nakeve, ji ber vê yekê hoşdarî da me û got, eger hûn ketin, zû rabin, yanî qet bêhêvî nebin, ji ber ku nexweşîya herî mezin bêhêvî bûn e.

Stratejîyên rasterast pir giring in, ji ber ku ew mirovan yekser hoşdar dikin, ji bo parastina wan û dîrxistina wan ji xirabîyê. Amanca vê stratejîyê û amanca kirdeya hoşdarîkirinê û amanca gotinên mezin yek in, ew dixwazin bi awayê herî hêsan alîkarîya mirovan bikin. Ew ji hemû çînên mirovan re xizmetê dikin, bi vê wateyê asta zanîn û têgihîştina mirovan lawaz be jî, dê wateya vê stratejîyê bizane, ji ber ku ev stratejî yekser hişmendîya gel bilind dike.

3.2.4. Hoşdarîkirina Nerasterast di Gotinên Mezinan de

Ev stratejî bi awayekî nerasterast di gotinên mezinan de xuya dibe, wekî ku ji navê wê jî diyar dibe, di navbera forma axaftina mezinan û erkê wê de têkilîyek nerasterast heye. Di vê stratejîyê de jîngeh roleke giring dilîze. Ger gotinê tevî hawirdorê nekin, wateya wan a nerasterast xuya nabe. Ev stratejî di piranîya gotinên mezin de heye, ji ber ku piranîya gotinan peyamek nerasterast hildigirin, da ku bikarin di nav gel û civakan de hoşdarîyê bidin. Ev stratejî bi hemû awayan, wekî: Ragihandin, pirs, ferman, amaje, eger û encam tê îfadekirin.

Ev stratejî bi vî awayî di nava gotinên mezinan de xuya dibe.

Ku mirov qenc be dinya qenc e (Oncu, 2020\I: 845).

Ev gotin bi awayekî nerasterast û bi formê ragihandinê hoşdarîkirinê pêşkêşî mirovan dike, dibêje: Ger tu baş bî, hemû dinya baş e, mebesta vê yekê ew e, ku meriv gazinan ji kesî neke, bibêje xirab in, ji ber ku te bi awayekî xirab serederî pê re kirîye, lewma ew xwe xirab nîşan dide, dibe ku ew mirovekî nizim û bêqîmet be, lê we di berdêla wê de gelek qîmet daye wî, an jî dibe ku ew mirovekî hêja û bihurmet be, lê we birêkûpêk serederî pê re nekirîye, ya rast ew e ku her kes li gorî asta wî pê re elaqedar be.

Sifreya xwe li ber her kesî ranexe (Oncu, 2020\II: 260).

Ev gotin bi awayekî nerasterast ji civakê re peyameke hoşdarîyê ya giring dişîne. Ev tê wê wateyê ku nabe her kesê hebe bînin nav mala xwe û derîyê xwe ji bo wan veikin. Ji ber ku hûn dê ji bo vê yekê zirarê bînin, bi vê wateyê ger tu derîyê mala xwe ji kesekî re vekî, yanî te qencî li wî kesî kir, lê dibe ku ew hurmeta karê te yê qenc neke û ew dê ji we sûdê wergire ku wê nexweşî û zirarê bide we.

Hêrsa qîzê, kela dîzê (Oncu, 2020\III: 167).

Ev gotin bi awayekî nerasterast derbarê hêrsa jinê de agahîyan dide, dibêje hêrsa keçikê wekî kela qazanê ye, yanî zû germ dibe û zû sar dibe. Mebesta vê yekê ew e ku gava keçek aciz dibe, divê hûn li ser xwe bin û bi gotinên xweş pê re biaxivin, ji ber ku xwezaya jinê ye ku ji tiştên biçûk aciz bibe û hûn dikarin wê bi gotineke xweş aram bikin. Giringîya vê gotinê ew e ku dema ku jin aciz dibe, tu bi awayekî ciwan û bi rêz pê re biaxve, ji bo ku tu pirsgirêk dernekevin, dema tu vê serederîyê pê re bikî, wê şerm bike û lêborîna xwe ji te bixwaze.

Sond şûrê du dev e (Oncu, 2020\IV: 483).

Ev gotin nerasterast hoşdarîyekê dide mirova, da ku mirov hişmend bin û nekevin tengasîyê. Mebesta vê yekê ew e ku tu sozan nedin tu kesî, ji ber ku dê zirarê bibînin, ev yek wekî şûrê dudevî tê binavkirin, bi vê wateyê mirov gelek sozan dide, ger hûn li pişt soza xwe bin û soza xwe bi cih bînin, hûn dê zirarê bidin, lê eger hûn soza xwe bişkînin, hûnê bêrûmet bibin. Bi vê wateyê xwedîyê sozê gelek caran zirarê dibîne. Ji ber vê yekê, ya rast ew e, ku hûn alîkarîya civaka xwe bikin heke hûn dikarin, heger hûn nekarîn tu sozan nedin da ku hûn şermezar nebin.

Ew bîra te av jê vexwarî, kevra navêjê (Şingalî, 2010: 10).

Ev gotina mezinan bi awayekî nerasterast hoşdarîyekê dide mirovan. Mebesta vê yekê ew e, ku nabe meriv bê nan û xwê be, yanî dema kar û berjewendîya meriv ji yekî yan tiştekî re xilas bibe, divê meriv bi xirabî qala wan neke. Ger ew mirovekî xirab jî be, divê tu xirabîya wî veşêrî û ji mirovan re nebêjî, ji ber ku ji we re alîkarî û fêde kirîye, ger mirov vê gotinê bişopînin û jîyana xwe de bi kar bîne, di nav mirovan de wê ruhê hezkirinê hebe.

Ê deva xweyî bikî, derwenda derê xwe bilind dikî (Şingalî, 2010: 15).

Ev gotina mezinan bi awayekî nerasterast civakê li ser mijara qureti û axatîyê hoşdar dike, dibêje kî xwedî deve be divê serdera mala xwe bilind bike. Wateya vê yekê ew e, ku mirovê xwe mezin bike û xwe bikişîne ser xebatan, bi gotineke din, ji bo ku bibe mezinê herêmek an eşîrekê, divê di her warî de mazin û jêhatî be. Divê ew li ser hemû

bûyeran bifîkire û ew ji bo her tiştî amade be. Ji ber ku eger yek bixwaze bibe mezin û pêşkêş, divê bizane ku hemû xêr û şerên wî dê mezin bin, yanî jîyana wî dê ya ji mirovan cuda be.

Bitrî ji gayê cuht re nema (Şingalî, 2010: 26).

Ev gotina mezinan bi awayekî nerasterast mirovan ji derbaskirina sînoran hoşdar dike. Mebesta vê jî ew e ku tu carî sînor neyê derbaskirin, yanî divê her tişt normal be, divê her tişt ji şîyanên mirovî derbas nebin. Ev gotin mirovan piştrast dike, ku her carê û di her warî de, eger mezaxtinek zêde were kirin, ew dê zîrê bibîne û dê berdêla wê bide, wekî ku bi kurdî jî dibêjin, tiştek di ser difna mirov re derbas nabe. Ev gotin mijareke giring e û ji mirovan tê xwestin ku di civakê de asta xwe bilind bikin û bibin xwedî nîrx û rêz, divê hûn rêzê li xwe û azadî ya gel bigirin.

Terka dostanîya dostê babê xwe mede (Şingalî, 2010: 40).

Ev gotin bi awayekî nerasterast mirovan li ser tîkilîyên civakî hoşdar dike. Amanca vê yekê xurtkirin û zêdekirina tîkilî û dostanîya civakî ye. Li vir dostê bavê yanî tîkilîyên malbatî, tîkilî pir giring in, nemaze yên bab û kalan, ji ber ku ev tîkilî li ser hin prensîbên giring û saxlem hatine avakirin, di rewşên nexweş de ev tîkilî dê kêrhatî be. Ev gotina mezinan ronahîyê dide ser wê yekê ku tîkilîyên berê ji yên nû çêtir in. Çimkî tîkilîyên kevin li ser prensîbên baş û xweragirîyê têne damezirandin. Lê tîkilîyên nû bi piranî li ser mijar û berjewendîyên taybet in.

Tas ket û deng jê derket, bişkê û neşkê yek e (Şingalî, 2010: 43).

Ev gotin bi awayekî nerasterast li ser nîrxê mirovî û rûmeta mirovî hoşdarîyê dide. Amanca vê yekê divê rêzê li nîrxên xwe yên mirovî bigirin, yanî tiştên ku nîrxên mirovatîyê xirab dikin nekin. Divê meriv nebe xebera devê xelkê û baş hişyarî xwe be. Çimkî her ku yek dibe benîşt û dikeve devê mirovan, wekî Kurd dibêjin: Xwedê ji wî stand, heger wî tu xirabî li xwe û yên din nekiri be jî, ew bû sihbêta civakê û her kes wê li gor dilê xwe biaxive. Wateya vê gotinê ew e, ku tas ket û deng jê derket, her kesî zanî ku ew dengê tasê ye, vêca bişkê yan na, wekî yek e. Bi vê wateyê civak li naveroka mijarê nanêre, li tiştên ku dibîne û tê gotin dinêre.

Dengê topa xweştir e ji dengê dilopa (Şingalî, 2010: 75).

Ev gotin bi awayekî nerasterast behsa hejarî (xîzanîyê) dike, mebesta vê yekê ew e ku ya herî xirab xîzanî ye, dibêje dengê topê ji dengê dilopê çêtir e, yanî bila meriv di şer de be û dengê çekên giran were meriv, lê bila meriv belengaz nebe û mala meriv dilop neke. Ev gotin hoşdarîyê dide mirovan ku kar bikin û rewşa jîyana xwe baştir bikin, ji ber ku dema tu feqîr bî tu hêvî û amanca te tune ye, tenê hêvî ew e, ku birçî nemînin, anku tenê meriv ji bo bidestxistina xwarinê dixebitin.

Dîkê qenc di hêkê de ban dikî (Şingalî, 2010: 82).

Ev gotin bi awayekî nerasterast mirovan di mijara demê de hoşdar dike. Mebesta vê yekê ew e ku dem tu carî kesekî xirab û baş nake, lê dem rastîya mirovan nîşanî civakê dide. Ev gotin dibêje ku ger dîk baş û bikêr be, di nava hêkê de dê baş be heta bimire jî, dê bi awayekî baş bimire. Bi vê wateyê mirovên baş û mêrxas li hemû temenê xwe baş in. Ger mirovek baş di demek jîyana xwe de tiştekî xirab bike, ev ne îsbat e ku ew mirovekî xirab e, lê civakê ew neçar kirîye ku bi vî rengî serederîyê bike. Bi vê wateyê divê asta mirov bi kiryarekî yan jî bi karekî neyê dîyarkirin, ji ber ku merivê baş ew di esasê xwe de baş e û ev ji bav û kalên wî maye.

Deftera mirov pişt mirov tê xwendin (Şingalî, 2010: 88).

Ev gotin bi awayekî nerasterast li ser mijareke giring mirovan hoşdar dike. Divê ew bi gotinên kesên din neyê xapandin, çimkî kî li ber te pesnê te bide, divê tu bizanî ku berjewendîyeke wî ya taybet bi te heye. Bi vê wateyê dema ku meriv ne amade be axaftin û kirinên meriv tên nîqaşkirin, rastîya mirovan qet li hember wan ji wan re nayê gotin, ger hûn dixwazin xwe nas bikin, li yê li pişt xwe guhdarî bikin.

Şihîna hespê ji hinera wê ye (Şingalî, 2010: 123).

Ev gotin bi awayekî nerasterast li ser şîyanên mirovan hoşdarîyê dide. Mebesta vê gotinê ew e, ku mirov bi roxsar û rûyê der ve xuya nabe, ka jîr e yan baş e yan xirab e, ew bi çalakîyan xuya dibe ku kesekî jêhatî ye. Bi vê wateyê mirovên bêdeng û bêberhem lawaz in, lê kesên xwedî kar û huner ew bikêr in. Ji ber ku ew dê bi hunera xwe sûdê li civaka xwe û derdora xwe re bikin. Gotinek heye ku ger tu dixwazî yekî nas bikî, bêjê

biaxive, da ku ez te nas bikim, amanca vê yekê ew e ku kesên bêdeng û bêberhemdar wê wenda bibbin û qet neyên naskirin.

Girara mêra bi hemid dikelî (Şingalî, 2010: 149).

Ev gotin bi awayekî nerasterast, civakê li dor taybetmendîyên kesek mêrxas hoşdar dike. Mebest ji vê yekê ew e, ku mirov karê xwe bi sebir û bi aqilane bike, di karê xwe de qet lez nakin, da ku ew poşman nebin, di vî warî de divê lez û bez ji bo xebatê nekin, divê bi aramî û bi xîret bixebitin, ji bo ku encamên baş hebin.

Li ser nefsê kete hebsê (Şingalî, 2010: 153).

Ev gotin bi awayekî nerasterast mirovan hoşdar dike, da ku ew hay ji xwe hebin, ku xwe teslîmî nefsa xwe nekin. Ji ber ku dê encam xirab bin, nefsa mirov ji çend xwestekan pêk tê û ev xwestek tu carî têr nabin. Mîna xwesteka xwarinê û xwesteka şehwetê, ev her du xwestek jî heta hetayê têr nabin, tenê ji bo çend demjimêran têr dibin, ji ber vê yekê divê teslîm nebin, çimkî dê encamên xirab derkevin holê.

Kuwêr le tarîkî natirsê (Gerdî, 2005: 130).

Ev gotin bi awayekî nerasterast civakê hoşdar dike, dibêje ger pêwîstîya kesekî bi tiştekî nebe, nede wî û bi vê yekê wî neceribîne, çimkî ew ji bo xwe nake xem, yanî hebûn û nebûna wê wekî yek e. Bi vê wateyê kesek navdar ne hewce ye, ku hûn pesnê wî bidin. Herweha mirovekî mêrxas tehdît nekin, ji ber ku ew natirse. Dema mirov van tiştan dike bê qîmet dibe û her tim têk diçe.

Bawik gunah eka û ewlad pê gîr eka (Roxzadî, 2003: 67).

Ev gotin bi awayekî nerasterast di şiklê gilîkirinê de civakê hoşdar dike. Nîşan dide ku civakeke cahil û paşverû ye. Amanca vê gotinê hoşdarîkirina milletî ye li ser vê meseleya tirsinak. Eger bav xirab be û tiştên nerast bike, gunehê zarokên wî çî ye yan çima dê zarokên wî berdêla kirinên wî yên xirab bidin. Bi vê wateyê hoşdarîkirin û gotinên mezinan li êşên gel xwedî derketine, ew hewl didin ku kevneşopîyên çewt, ên di çandê de rast bikin.

Bare Guwêzî lê bine xirey nayet (Roxzadî, 2003: 65).

Ev gotin bi awayekî nerasterast hoşdarîyekê dide mirovan, dibêje: Kesê ku ev gotin jê re tê pêşkêşkirin, ji karê xwe hez dike û kêfxweş e, her tiştê ku hûn di derheqê wî mirovî de bikin, hûnê wînda bikin, Çimkî tiştê jê re ne xem e û haya wî ji vê dinyayê tune ye. Ji ber ku aram e û bi karên xwe ve mijûl e. Lewma divê ev gotin bandorê li mirovan bike.

Be kam sazi bîreşim? (Roxzadî, 2003: 97).

Ev gotin bi awayekî nerasterast di forma pîrsê de hoşdarîyê pêşkêş dike. Mebesta vê gotinê ew e ku dema mirov gelek derewan bike û gelek sozên derew bide, ev gotin jê re tê pêşkêşkirin. Ji bo ku hay jê hebe ku guhdêr zana ye û dizane ku gotinên wî ne rast in. Amanca vê yekê ew e, ku sînoren axaftinê nîşanî mirovan bide, ji ber ku divê tu carî sînoren axaftinê neyê derbaskirin, çimkî dema ku sînoren axaftinê derbas dibin, azadîya gel têk diçe û bandorê li hişê wan dike.

Tîr le kewan derçê, nagerêto (Roxzadî, 2003: 143).

Ev gotin bi awayekî nerasterast hoşdarîyê dide mirovan. Wateya vê yekê ew e, ku mirov ji her tiştê ku dibêje yan dike berpirs e. Bi vê wateyê her tiştê ku we got an we kir dibe malê we. Eger baş be, hûn dê xelata xwe bistînin û heke xirab be, hûn dê cezayê xwe bistînin. Bi vê wateyê divê mirov li axaftin û kirinên xwe baş hişmend be, da ku mirov poşman nebe.

Rîşim le ber xwera cermig nekirdige (Roxzadî, 2003: 222).

Ev gotin hoşdarîyek nerasterast dide. Ev gotin li wî demê tê pêşkêşkirin, dema ku mirov ji sînoren xwe derbas bibe, dema ku mirov pir bi axivê û xwe zane bike û bi her tiştî dizane. Guhdêr aciz dibe û dê vê yekê bike ku xeberdar rawestîne. Yanî ez jî zane me û zanîna min heye, ev rîh bi betalîyê spî nebûne, bi vê gotinê, axêver wê şerm bike û wê bizane ku wî sînoren xwe derbas kirine, ji ber vê yekê guhdêr ev gotin pêşkêşî wî kir.

Aşekî bihêle wekî arvanê xwe lê bikî (Sindî, 2009: 39).

Ev gotin hoşdarîyek nerasterast û ciwan e. Mebesta vê ew e, ku dilê hemû mirovan nehêle. Ji ber ku ev دنیا xerîb e. Rojek dê were hûn dê hewceyê hin kesan bibin, we qet nefikirîbû ku hûnê rojekî hewcedarî van kesan bibin. Ev gotin mirovan hoşdar dike, ku

mirov birêkûpêk bi civakê rê serederîyê bikit, da ku di tengasîyê de li mirov xwedî derkevin.

Tiştê bilez nagîje miraza (Sindî, 2009: 124).

Ev gotin bi awayekî nerasterast hoşdarîyê dide mirovan. Ev tê wê wateyê ku heke hûn dixwazin xebata we encamên baş hebin, divê ku ew bi bêdengî û rehet bê kirin, çimkî tiştê bilez bihête kirin, wê xirab bibe û negihîje tu encaman.

Zimanê xwe bibire, cîyê xwe bikire (Sindî, 2009: 130).

Ev gotin bi awayekî nerasterast hoşdarîyê dide mirovan, da ku haydar bin û jê sûd wergirin. Mebesta vê yekê ew e, ku meriv kêr biaxive û zêde wergire, ji ber ku heke hûn pir guh bidin mirovan wê asta zanîna we zêde bibe. Dema civak bizane ku tu mirovekî têgihîştî û zana yî, ew dê li hemû meqam û cihan rêzê li te bigirin û ew dê cihê çêtirîn pêşkêşî te bikin. Lê ger hûn guh nedin vê gotinê, yanî di hemû cihan de tenê karê te bû axaftin û te guh nada kesî û te nehêla kes biaxive, wê demê hemû civak wê ji te bireve û kes guh nade te, bi van şîret û agahîyan, ji millet re xuya dibe, ku kirdeya hoşdarîkirinê pir giring e.

Bikene avên genî dê hête vexwarin (Se'îd, 2011: 27).

Ev gotina mezinan bi awayekî nerasterast civakê li ser mirovên hêja, qenc û mêrxas hoşdar dike. Mebesta vê yekê ew e, ku ev kes mirovekî camêr e, di derbarê wî de her tişta baş ya ku bê gotin kêr e, ji ber ku ew rêzdar e û ji bo civakê sêdek mezin heye.

Cehnem ne hinda germe wekî jê dibêjin (Se'îd, 2011: 53).

Ev gotina mezinan xwedî wateyeke nerasterast e. Gava yekî xirab pesnê xwe dide û bi xirabîyên xwe şanazîyê bi xwe dibe, vê yekê jê re dibêjin. Yanî hay ji xwe hebe û bizane ku ew xelet e. Mebesta vê yekê ew e, ku mirovên xirab hîn bi rêk û pêk nehatine perwerdekirin. Çimkî ya herî xirab ew e, ku meriv bi gunehên xwe pesnê xwe bide, ji ber vê yekê, mirovên olî divê karê xwe baştir bikin, da ku arasteya jîyanê çêtir bikin.

Çi berê hat serê xwe nede ber (Se'îd, 2011: 58).

Ev gotin bi awayekî nerasterast mirovan hoşdar dike ku hişmend bin. Mebesta vê jî ew e ku mirov nekeve nav tu pirsgirêk û çalakîyan, cîmkî dê zirareke mezin bide mirovan, mirov wê bikeve tengasî û felaketê, çîmkî şîyanên mirovî yên bedenî û gîyanî kêşin.

Digel gorgî dixot û digel seyî direwit (Se‘îd, 2011: 83).

Ev gotina mezinan bi awayekî nerasterast, civakê ji durû û xayînan hoşdar dike. Amanca vê yekê ew e, ku civak van mirovên durû nas bike, ji ber ku mirovên durû her tim nexweşî û nefretê di nav mirovan de belav dîkin. Herweha mirovê xayîn jî ji bo mîletê xwe nexweşî û derd e.

Sohbet keleka bera ye (Se‘îd, 2011: 107).

Ev gotin bi awayekî nerasterast hoşdarîyê dide mirovan. Ji bo ku zêde neaxivin û ji derdora xwe re nebin bar, ji ber ku axaftin û sohbet qet naqede. Ev gotin sohbetê wekî gîrekê beran nîşan dide, yanî hûn alîyekî rakin, wê alîyekî din jî were. Amanca vê yekê ew e ku derdor ji we nereve û hûn bêqîmet nebin.

Heke beranê bisko ba, da li ber derê baboy bît (Se‘îd, 2011: 152).

Ev gotin bi awayekî nerasterast, civakê li ser kesên bi kêrhatî hoşdar dike, dibêje ger baş bûya dê li ber derîyê bavê xwe bûya. Wateya vê jî ew e, ku mirovê bikêrî mal û civaka xwe neyê, bawer bikin bikêrî kesî neyê, wê ji bo her kesî bibe nexweşî û êş. Ev gotin hoşdarîyê dide mirovan, ku ji kesên bêberhem dûr bikevin, ji ber ku ji xeynî xirabîyê nikarin tiştekî pêşkêşî mîlet û civaka xwe bikin.

Axa biharê xweştir e ji gîyayê biharê (Amêdî, 2019I: 99).

Ev gotina mezinan bi awayekî nerasterast hoşdarîyê dide mirovan. Mebesta vê yekê ew e ku her tiştê baş, bikêr û serketî îsbata wê ye, ku piştgirîyek wê ya xurt heye, yanî her tişt berhema tiştekî din e. Bi vê wateyê tiştên baş û bikêrhatî qet ji tunebûnê derneketine. Di civaka kurdî de tê gotin, ku her mêrekî serkeftî, li pişt xwe jineke bi hêz heye, ev gotin bi awayekî nerasterast dibêje, ku dilxweşî û feydeya nebata biharê vedigere axa wê, ji ber ku axa biharê ji alîyê hemû madeyên xwezayî ve dewlemend e. Bi vê wateyê,

ji bo serketinê divê mirov piştgirîyek xurt hebe û divê hûn bi mirovên serkeftî û xwedan zanîn re şêwir bikin.

Axaftinên bab û bapîran, çêtir in ji yê hakim û wezîra (Amêdî, 2019\I: 102).

Ev gotina mezinan bi awayekî nerasterast civakê li ser mijareke giring hoşdar dike. Mebesta vê gotinê ew e, ku dema şaristanîyên rojavayî yan yê bîyanî bi şaristanîyên mirovî re têkel bibin, ev yek pir xirab e, ji ber ku ew şaristanî bi jîyana civakî ya mirovan re nagunc e. Welatên pêşketî ji bo lawazkirina çanda mirovan, vê yekê bi zanebûn dikin, welatên pêşketî ji bo qencîya xwe her tiştî li cîhanê belav dikin, delîla vê jî ew e, ku ev modernîzim û modelên serdem bûne beşek ji civaka kurdan, lê tu eleqeya wan bi çanda kurdî re nîne û ji bo kurdan bûne nexweşîyek.

Asinê bê esas, nedibîte şîr û nedibîte das (Amêdî, 2019\I: 106).

Ev gotin bi awayekî nerasterast mirovan ji tiştên xirab û lawaz hoşdar dike. dibêje xwe ji van tiştan dûr bixin, çimkî ew bêkêr in. Amanca vê yekê ew e ku nîşan bide, ku ji tiştên lawaz û kesên bêbingeh dûr bibin û divê hûn ji wan bawer nekin, ji ber ku ew tiştêkî bi temamî nakin, hemû karan nîvco dihêlin, ji bo derdorên xwe dibin nexweşî û êş.

Aha bizina koç ji bizina bi şax naçit (Amêdî, 2019\I: 138).

Ev gotin bi awayekî nerasterast civakê hoşdar dike, ku zorîyê li kesî neke. Heger meriv zorîyê bike, ew ji bo merivî nemîne, yanî ew kesê din dê tola xwe hilîne, wekî ku dibêjin Xwedê ya vî destî ji bo destê din nahêle, yanî tu li yekê bidî û zulmê li wî bikî, teqez ji te re namîne, ew jî dê zîrarê bide te, wateya vê yekê ew e ku eger civak ji mirovan şerm bike, çêtir e ku mirov ji mirovan bitirsin.

Eger ba hat kolavê xwe bigire (Amêdî, 2019\I: 157).

Ev gotina mezinan bi awayekî nerasterast û bi forma eger û encamê hoşdarîkirinê pêşkêşî civakê dike. Amanca vê yekê jî ew e, ku divê mirov hişmend û zana be, ji bo ku mirov hay ji her bûyereke hebe û divê haydar be û bizane ku meriv çawa bi bûyeran re mijûl dibe, bi vê wateyê divê mirov ji her bûyerê re amade be û xwedî helwest be. Ji ber ku mirov nikare ji bo hemû bûyeran heman helwest û tevgerê bike, ji ber ku divê her bûyer

bi renegekî bê çaraserkirin. Giringîya vê yekê ew e ku meriv bikare bûyeran bi ser bixîne û meriv bizane çawa serederîyê pê re bike.

Eger ba hat Genme Şamî bide bay (Amêdî, 2019\I: 157).

Ev gotin bi awayekî nerasterast di formê eger û encamê de civakê hoşdar dike. Amanca vê yekê ew e, ku meriv xwe ji her rewşê re amade bike, yanî divê çalakîyên xwe birêxistin bikin û li benda bûyeran bin, ji bo berdewamîya jîyanê. Ji ber ku eger mirov ji bo tiştekî amade nebe, wê zirareke mezin bibîne, bi vê wateyê nabe tiştek ji meriv here, ji ber ku dem firset e û xwe ji kesî nagire, ger hûn firsetê ji dest bidin, ew dê di jîyana we de bibe kêmasîyek, çimkî we jîyan birêkûpêk nekir û we derfet ji dest da.

Eger tejî devê te xwîn bît, li nik dojmin tif neke (Amêdî, 2019\I: 163).

Ev gotin bi awayekî nerasterast di formê eger û encamê de civakê hoşdar dike. Ji bo parastina xwe divê berdewam li ser xwe bin û berhingarîyê bikin. Wateya vê jî ew e ku divê tu carî nesekine û teslîm nebe, lewma divê her tim hûn li ber xwe bidin, da ku jîyana we têk neçe. Herweha ger hûn teslîmî dijmin bibin û we lawazîya xwe ji dijmin re eşkere kir, ev nîşana lawazîya we ye û dijmin wê we bi hêsanî têk bibe. Bi vê wateyê hûn çiqas nexweş bin jî teslîm nebin, di şûna wê de divê hûn serederîyê bikin mîna ku hûn baş in û pirsgerêkên we tune ne.

Barê namûsê yê giran e (Amêdî, 2019\I: 219).

Ev gotin bi awayekî nerasterast hoşdarîya cezayê namûsê dide. Ji bo ku meriv namûsa kesê pîs neke, weha tê gotin. Mebesta vê jî ew e, ku meriv teslîmî xwestekên xwe nebe, bi taybetî jî şehwetê. Ji ber ku di civaka kurdan de cezayekî giran heye. Herweha kesên vî karî bikin jî dê bîr cezakirin, lê ev yek wê pirsgerêkê zêdetir bike û şer û nexweşîyê li civakê belav bike.

Bext nadim bi text (Amêdî, 2019\I: 230).

Ev gotin bi awayekî nerasterast hoşdarîyê dide mirovan. Ji bo nîrxên wan rêz bigirin û bizanin ku rêzdarîya mirovan heye û asta wan bilind e. Mebesta vê yekê ew e, ku mirov ji ber berjewendî, yan meqamekî civakî, yan jî ji ber meqamekî îdarî, yan jî

sedemeke din kesayetîya xwe neşikîne. Lewra kesayetî û bextewarîya mirovan ji her tiştî giringtir e. Ji ber vê yekê, ev nirxa mezin ji bo amancek dinyayî nayê şikandin.

Bes moxberê deng jê nahêt (Amêdî, 2019\I: 245).

Ev gotin bi awayekî nerasterast kesên bêkar û bêberhemdar hoşdar dike û wan bi tundî rexne dike. Mebesta vê yekê ew e, ku kes neseke û bêhêvî nebe. Ji ber ku jîyan berdewam e û divê mirov li ser vê rêyê bidome, nexwe dê jîyan mirov wêran bike, bi vê wateyê kesên bêkar mîna mirovên mirî ne, çimkî tenê ew û goristan bêdeng in, ev kes ji bo malbatên xwe bar in. Ev gotina mezinan xwedî hoşdarîyeke bilind e, ji bo ku mirov bikare moral civakê bilind bike û ber bi karkirinê ve bibe.

Befir li çîyayên bilin dibarît (Amêdî, 2019\I: 247).

Ev gotina mezinan bi awayekî nerasterast, civakê li ser mirovên mezin û bi hêz hoşdar dike. Mebesta vê yekê ew e, ku mirovên mezin dikevin tengasîyan, ji ber ku di civakê de çi dibe, arîşe, rûdan, xêr û şerê hebe civak van pîrsgirêkan digihîne mezinan. Çimkî şîyana wan a civakî heye, dikare van pîrsgirêkan çareser bike, giringîya vê yekê rêzgirtina van kesan e, ji ber ku ew xizmeta civakê dikin. Herweha ger civak bi tevahî li dora yekî kom bibe, divê bizane ku ew mirovekî mezin û hêja ye.

Bone banek û bagirdanek (Amêdî, 2019\II: 247).

Ev gotina mezinan bi awayekî nerasterast hoşdarîyê dide mirovan. Ev gotin ji kor û keçek an jî çend kesan re têne pêşkêşkirin. Mebesta vê yekê ew e ku têkilîya wan bi hev re pîr baş bûye. Eger ji kor û keçekê re were pêşkêşkirin, yanî evîna wan xurt e û bûne yek dil û yek amanc. Herweha ger ji komek kesan re were pêşkêşkirin, yanî têkilîyên wan xurt bûne, bi vê wateyê dema ku hinek ji van kesan hazir bin, divê li dor ên din bi xirabî neaxivin, ji ber ku dê bertekên wan hebin û rewîş wê xirabtir bibe.

Pare îman diz e (Amêdî, 2019\II: 316).

Ev gotin bi awayekî nerasterast hoşdarîyê dide mirovan. Wateya vê yekê ew e, ku nabe meriv xwe bi malê dinyayê ve girê bide, ji ber ku her ku mirov xwe radestî dinyayê bike, dinya wê di nava xwe de me winda bike. Di bingehe de em ne ji bo vê dinyayê hatine afirandin, lê ev cîhan ji bo me ezmûnek e. Erê ma durist e ku em xwe bi ezmûnek weha

ve girê bidin ku em encam û bextewarîya axretê ji bîr bikin, bi vê wateyê divê mirov cîhana xwe kontrol bike, da ku xwe serdest bike û encam jî wê di berjewendîya me de bin.

Pêlên mayîn ji yên çûyîn pitir in (Amêdî, 2019\II: 328).

Ev gotin bi awayekî nerasterast mirovan ji zehmetîyên jîyanê hoşdar dike, ji ber vê yekê divê mirov hoşdar be û ji her pêşhatekê haydar be, mebesta vê jî ew e, ku jîyan roj bi roj xirabtir û wêrantir dibe. Bi vê wateyê divê mirov di rojên xweş û bextewarîyê de li zehmetîyan bifikire, her tiştê ku îro ji we zêde ye divê ji bo rojên tengasîyê were hilgirtin. Çimkî pirsgirêk û tengasî ne bi destê mirov in.

Tajî dibêjit ya Allah û kêrvoşik jî dibêjit ya Allah (Amêdî, 2019\II: 336).

Ev gotin bi awayekî nerasterast civakê di mijara berjewendîyan de hoşdar dike. Ev nîşan dide, ku her kes ji bo berjewendîyên xwe dixebite, heta wê astê ku mirov xweperest bûne, yanî ji bo amancên xwe yên baş û xirab pîrozîyan bikar tînin. Mebesta vê jî ew e, mirov her tiştî tenê ji bo berjewendîyên xwe dixebitînin, ew dixwazin ku her tişt ji bo wan be. Bi vê wateyê gelek caran mirov ji bo berjewendîyên xwe, bi tiştên pîroz sond dixwin, da ku sûd wergirin. Ev gotin hoşdarîyê dide civakê, ku ji gotinên mirovan bawer neke, ji ber ku mirovên rast û nerast bi navê Xwedê tev digerin.

Tîr ji kivanê derkeft (Amêdî, Bergê Duyem, 2019: 344).

Ev gotin bi awayekî nerasterast civakê hoşdar dike. Dema ku pirsgirêkek an nakokîyek çêdibe û alîyek wenda bike, yan jî mirov zirareke mezin bibîne, vê yekê ji derdora xwe re dibêje. Yanî heke hûn dikarin tişteki bikin, ew dê baş be, nexwe ez dê ji guhdêran bim, ji ber ku ez ne haydar bûm, ji ber xeletîya xwe ez dê werim cezakirin, bi vê wateyê divê mirov bi baldarî bixebite, da ku tu pirsgirêk dernekeve.

Tirba siwara her ya kola ye (Amêdî, 2019\II:347).

Ev gotin bi awayekî nerasterast hoşdarîyê dide mirovan, da ku her mirovek li gorî şîyan û wêrekîya xwe karekî rast ji xwe re hilbijêre. Ev tê wê wateyê ku yên ji bo welat şer dikin bila netirsin, ji ber ku ew mirovên herî nêzî mirinê ne. Bi vê wateyê kesê ku ji mirinê ditirse divê nekeve vî karî, da ku zîrê nede dost û welatê xwe. Çimkî tiştên mezin bi destê mirovên wêrek tene kirin.

Tinë bo Xwedê baş e (Amêdî, 2019\II: 354).

Ev gotin bi awayekî nerasterast hoşdarîyê dide mirovan, ji bo ku ew nekevin nava tiştên ku nikarin bikin. Wateya vê yekê ew e ku dema Xwedê mirov afirand, qabilîyeta wî jî dîyar kirîye, yanî hin tişt hene ku mirov nikare bike, ji ber ku mirov ne xwedîyê hêza xebatê ye û ew kar ne taybetmendîyên mirovî ne, bi vê wateyê tenêû taybetmendîyek Xwedê ye, tu kes nikare heta hetayê bi tenê bijî. Çimkî hewcedarîyên mirovan pir in û divê ji alîyê mirovan ve bîn bicihanîn, ger mirov li dora mirovan nebin, dê pirsgirêkên mezin hebin.

Tixobê xortan tune ye (Amêdî, 2019\II: 357).

Ev gotin bi awayekî nerasterast, civakê li ser wêrekîya mêrxasan hoşdar dike. Ev tê wê maneyê ku divê tu kes hewl nede, ku mirovê wêrek bitirsîne yan zîrê bide wî, ji ber ku ew ji kesî natirsin. Eger kesek bixwaze zîrê bide wan dê rastî bersiveke tund bê, lewma divê civak hoşdar be û ji van kesan re pirsgirêkan dernexîne, çimkî belayên mezintir wê hebin.

Coya av lê neçûy, lê naçit (Amêdî, 2019\II: 374).

Ev gotin bi awayekî nerasterast civakê li ser malbatên çavbirçî (nemerd) hoşdar dike. Ev tê wê wateyê ku hin taybetmendî û kiryar ji bav û kalan ji bo mirov hatine, wekî mîras mane, ger malbatek nemerd û tirsonek hebe, divê civak ji zarokên wan cesaretê hêvî neke, ji ber ku ev zarok di destên wan de mezin bûne, wekî dibêjin mîr neynika mala xwe ye. Bi vê wateyê ger civak li hêvîya wêrekîya nemêran be, ew li wê demê şerê windabûnê dike, ji ber ku ne mimkin e, ku tirsonek karên mezin bike.

Çi kanî di bê serokanî nînin (Amêdî, 2019\II: 394).

Ev gotin bi awayekî nerasterast civakê hoşdar dike. Ev tê wê wateyê ku tu kes bê mirov nîne û tu bûyer bê plan nînin. Bi gotineke din divê civak hişmend û jîr be, yanî divê kesên bi tenê neêşînin û zorîyê li wan nekin, ji ber ku dema ku xwedîyên wî û xizmên wî werin, wê şer li civakê belav bibe, wekî bi kurdî dibêjin: Kes ji bin dar û beran derneketîye. Herweha, heke bûyerek çêbibe, divê hûn wê ji xwe re normal negirin, lê divê hûn bi baldarî pê re mijûl bibin, ji ber ku dibe ev bûyer ji bo bidestxistina amancekê hatibe plankirin.

Xozî bi aqilê pêşî (Amêdî, 2019\II: 450).

Ev gotin ji mirovan re hoşdarîyeke nerasterast e, ji bo ku ew bêyî plansazî tiştêkî nekin. Mebesta vê yekê ew e ku ger hûn dixwazin bibin mirovekî serketî û her tişt baş derbas bibe, ne hewce ye ku hûn bi rengêkî bêserûber bixebitin. Di şûna wê de divê di destpêkê de, ji bo her tiştî planek we ya baş hebe, da ku hûn wê bi serfirazî bikin, ger hûn vê nekin, hûn Dê di karê xwe de têk biçin, yanî hûn di warê madî û manewî de mexdûr bibin. Bi vê wateyê di destpêkê de li dawîya xwe bifikirin, ger hûn vê yekê nekin di dawîyê de hûn dê mecbûr bin, li destpêkê bifikirin.

Dar ji berê xo dîyar e (Amêdî, 2019\II: 469).

Ev gotin bi awayekî nerasterast civakê hoşdar dike. Amanca vê gotinê ew e, ku her kes bi karê xwe tê naskirin. Ger mirovek berhemdar be, yanî kêrî hawirdor û civaka xwe were, divê civak jê re rêz bigire, da ku kesên bêkar û bêberhem çav li vî mirovî bikin. Bi vê mebestê divê mirovên bêkar û bêberhem bên hoşdarîkirin, çimkî ji bo jîngeh û civakê nexweşî û metirsî ne. Wekî tê gotin ku hebûn û nebûna mirovên bêberhem jî wekî yek e, ji ber ku li şûna ku xizmeta malbat û civakê bikin, bûne bargiranî ji bo wan.

Defa xelkê ye, tu cima lêdixî? (Amêdî, 2019\II: 490).

Ev gotin bi awayekî nerasterast di forma pirsê de hoşdarîyê dide. Ji bo ku çavên wan li jîyana wan be û ji bo hêvî û amancên xwe bixebitin. Mebesta vê jî ew e, ku mudaxeleya jîyana mirovan nekin û çavê meriv ne li jîyana mirovan be, ji ber ku ev yek di berjewendîya çivakî de ye, tenê nexweşî û westandin ji mirovan re dimîne. Bi vê wateyê ger hûn beşdarî xêr û şerên kesên din bibin û wesa bihesibînin ku xêr û şerên we ne, tenê westûyan û xizmet ji bo te dimîne. Herweha ger mirov li jîyana mirovan binêre mirov dê ji serkeftinên mirovan hêrs bibe, yanî dê zîrarê bidin dil û mejîyê xwe, lê ya rast ew e, ku meriv li gorî şîyanên xwe alîkarîya mirovan bike û ji bo berjewendîyên xwe bixebite.

Devê xelkê ne doxîna mervan e (Amêdî, 2019\II: 493).

Ev gotin bi awayekî nerasterast hoşdarîyê dide mirovan. Dibêje kes nikare devê mirovan bigire, yanî dê her behsa mirovan bikin. Mebesta vê ew e ku çavê mirov li jîyana me ya taybet be, divê hûn guh nedin tiştên ku mirov dibêjin, ji ber ku her kes bi awayên

cuda li ser mirovan diaxive. Bi vê wateyê, ji bo ku mirov rêwîtiya jîyanê bidomîne divê xwedî kesayeteke xurt be û ji bo amancên xwe bixebite. Gotinek heye dibêje: Ez nikarim bi te, lê ez dikarim bi xwe, yanî kes nikare devê xelkê bigire, lê hemû dikarin guhdariya gotinên xelkê nekin.

Dinya bû dinyayê ye (Amêdî, 2019\II: 525).

Ev gotin bi awayekî nerasterast hoşdariyê dide mirovan. Çimkî çawa ku ew hat vê dinyayê, wesa wê ji vê dinyayê here, ew dê tenê kirinên xwe yên baş û xirab bi xwe re bigire. Mebesta vê yekê ne ew e, ku hûn dinyayê bixin dilê xwe, lê ew e ku meriv wê bike destên xwe. Bi vê wateyê divê ji bo serferazîya cîhana xwe bixebitin, lê divê nexebitin ku em qet namin. Herweha nabe di jîyanê de zordariyê li kesî bikin.

Zibil hevalekê bê behr e (Amêdî, 2019\III: 582).

Ev gotin nerasterast mirovan hoşdar dike. Ji bo ku tenê ji bo berjewendîya civakê nexebitin, divê haya wan ji jîyana wan hebe. Mebesta vê jî ew e, ku ne tenê ji bo berjewendîya gel kar bikin, her tiştê ku mirov dike divê ji bo berjewendîya sereke ya xwe be, lê ev nayê wê wateyê ku xizmeta gel û civakê nekin, divê ew li gorî îmkânên xwe alîkariya mirovan bikin. Bi vê wateyê kesê ku tenê ji bo berjewendîya gel û civakê bixebite, dê her tim feqîr be, ji ber vê yekê divê ew bi zanebûn jîyanê bi rê ve bibin.

Zil ji kadîne xilas nabin (Amêdî, 2019\III: 589).

Ev gotin bi awayekî nerasterast civakê hoşdar dike, da ku civak hişmend be, ji ber ku mirovên xirab ji civakê xilas nabin. Amanca vê jî ew e ku mirov xwe û derdora xwe baş nas bike, ji ber ku di nav civakê de gelek mirovên xirab hene. Mirovên nebaş ji bo berjewendîya xwe kar dikin, eger çiqas rewşa civakî xirab be û çiqas zirarê bide kesên din jî, ji ber ku tenê ew ji bo berjewendîyên xwe dixebite, divê mirov hay ji xwe hebe ku van kesan nas bike û ji wan dûr bikeve.

Ji ava pêlpêlo netirse, ji ava sekinî bitirse (Amêdî, 2019\III: 596).

Ev gotin bi awayekî nerasterast hoşdariyê dide mirovan, ji bo ku ew ji mirovên sohbetxweş, devbiken û geryayî netirsîn, di şûna wê de divê ew ji mirovên bêdeng û belengazan bitirsîn. Wateya vê yekê jî ew e, ku kesên livlivok tiştêkî veşartî tune ye, yanî

çi hebe dibêjin, eger baş be, dê baş bibêje, eger xirab be jî dê bi eşkereyî behsa xirabîya xwe bike, lê belengaz û bêdeng qet qala xwe nakin, yanî her tiştî bêdeng û veşartî dihêlin da ku kes nizane û tu kes jê sûd wernegire.

Masîyan di avê da difiroşit (Amêdî, 2019\III: 855).

Ev gotin bi awayekî nerasterast behsa kesekî ku xapînok e dike, ji bo ku civak hoşdar bibe û ji vî kesî dûr bisekine, ji ber ku dê zîrarê bibînin. Amanca vê yekê ew e ku civak hişmend be û neyê xapandin. Ji ber ku kesê ku ev gotin li ser wî tê gotin kesekî xapîner e û bi hêsanî mirovan dixapîne, ji ber vê yekê jî divê civak jîr be, da ku rû bi rûyê wî nebin.

Wekî niviştîka qeşey ye (Amêdî, 2019\IV: 1069).

Ev gotin bi awayekî nerasterast civakê hoşdar dike. Ji ber ku divê civak hişmend be û netirse, çimkî tişteki betal e, yanî ne başî heye ne jî xirabî heye. Mebesta vê jî ew e ku civak nekeve nava van çalakîyên bê serûber. Çimkî ew dê tenê wextê xwe winda bike, çimkî tu feyde tune ye, bi vê wateyê ew dikarin bibêjin, ku ew tenê mirovan mijûl dikin û ne tiştekin din.

Bizin çîqa bi dizî were nêrî, her yê eşker e bizê.

Ev gotina mezinan bi awayekî nerasterast civakê hoşdar dike, da ku ew tişteki bi dizî nekin. Wateya vê yekê ew e, ku hûn çi bikin bila baş û bêqisûr be, ji ber ku wê eşkere bibe û hemû civak wê bizane. Ger karê we baş be û di xizmeta civakê de be, hûn dê serketî bin û civak jî rêzê li we bigire. Herweha ger hûn tiştên nebaş bikin hûn dê şermazar bin û civak jî we sûcdar bike. Mebesta vê gotinê ew e, ku mirov bi xwe biryarê li ser xwe dide, ku di civakê de bi çi awayî be.

Noka rizî çû bajêr, bû Leblebî.

Ev gotin bi awayekî nerasterast xelkê bajêr rexne dike. Da ku civak haydar be û li gorî şiklê wan tev negere. Amanca vê gotinê ew e, ku her kesê ku diçe bajarê xwe bajarî tê hesibandin, bi rastî, ne bi wî awayî ne, lê ji ber ku xelkê bajêr ji cihên cuda tên û hev nas nakin, loma hemû, xwe wekî bajarî dihesibînin û xwe di ser hev re bilind dikin, lê divê ew bi baldarî serederîyê bi wan re bikin, da ku pirsgirêk dernekevin.

ENCAM

Zelalî û asanîya kirdeya hoşdarîkirinê, bû egera berfirehbûna vê kirdeyê. Herweha kurtasî û xweşikîya zimanê hoşdarîkirinê, çarçoveya hoşdarîkirinê mezin kir. Evê yekê piranîya kirdeyên din yê axaftinê, kirin erk û taybetmendî ji bo kirdeya hoşdarîkirinê.

Di serdemên kevin de gotinên mezinan wekî qanûn bûn, piranîya caran bav û kalan bi rêya wan pirsgrêkên xwe çareser dikirin, bi vê ramanê ev gotin berhema milletê û karê milatî jî asan kirine.

Modela Searle ji bo kirdeya hoşdarîkirinê, bi êşkere di gotinên mezinan de tê dîtin. Anku her çar stratejîyên hoşdarîkirinê, bi ciwanî li ser gotinên mezinan hatine analîz kirin. Ew stratejî ev in: 1. Hoşdarîkirina Êşkere, 2. Hoşdarîkirina Nepenî, 3. Hoşdarîkirina Rasterast, 4. Hoşdarîkirina Nerasterast.

Hoşdarîkirina êškere di nav gotinên mezinan de, bi awayekê zêde nayê dîtin, lê em nikarin bêjin nine, çimkî di gotinên mezinan de, gelek awayên hêzê hene. Herweha çimkî awaz di gotinên mezinan de nîne, ev stratejî bi kêmkî tê dîtin.

Hoşdarîkirina nepenî di nav gotinên mezinan de, gelek kêmkî e, çimkî asta vê stratejîyê bilind e, ji ber ku derbirinê ji gelek hizir, pirsgrêk û bawerîyên xurt dike. Civak gelek caran ji van bawerîyan bawer nake û qebûl nake, çimkî dibe ku ew bawerî li cem hemû civakê ne gunca be. Herweha hemû mirov ne xwedî asteke başa zanînê ne, ku van ramanan fam bikin. Ev stratejî delîl e ku gotinên mezinan ramanên baş û hêja hildigirin.

Hoşdarîkirina rasterast, ev stratejî di nav gotinên mezinan de, bi başî tê dîtin, anku di nav milletî de zêde parve bûye, ji ber ku wate û mebestên vê stratejîyê bi rêya forma gotinên mezinan tê zanîn. Ev nîşana wê yekê ye ku gotinên mezinan bi zimanekî sade tene gotin, dixwazin kêrî civakê bên, lewma bi awayekî rasterast peyamên hoşdarîkirinê pêşkêşî civakê dikin.

Hoşdarîkirina nerasterast di nav gotinên mezinan de, bi awayekê zêde tê dîtin, anku di nava piranîya gotinan de heye. Raman û amancên vê stratejîyê bi rêya hawirdora wê tene dîtin. Ev yek nîşana wê çendê ye, ku mezinan xwastîye hin peyamên hoşdarîkirinê yê nerasterast bidin civakê, da ku hişmend bin û di jîyanê de baş bifikirin, herweha bi

awayeke zanistî bûyer û pêşhatan bi rê ve bibin. Xaleke din ya giring di derbarê vê stratejîyê de, ew e ku divê bikêrî guhdêran bihêt. Ji ber vê yekê peyamên hoşdarîkirinê bi awayê nerasterast dide guhdêran, ku wate û amanca peyama hoşdarîkirinê rasterast eşkere nebe, da ku her kes van amancan fam neke, ew dixwaze tenê ev peyam ji guhdêrî re zelal be.



ÇAVKANÎ

- Abuzêd, M. R & Norî, H. T & Elî, C. M. (2022). “Hesta Netewayetî: Rehend û Nîşandan, Ferhenga Gotinên Mezinan ya “Rêkêş Amêdî”. *Govara Zanîngeha Dihok*. Mînak: 5(2), 885-907.
- Abuzêd, M. R. (2021). *Rengvedana Keltûrî di Romanên “Mehemed Selîm Siwarî da”*. Dihok: Weşanxana Gazî.
- Akreyî, X. H. (2008). *Gotinên Mezinan li Sala 2008ê*. Dihok: Weşanxana Hivî.
- al-Marrani, Y. M. (2010). “Polite Request Strategies as Produced by Yemeni EFL Learners”. *Language in India*, 9(25), 165-188.
- Amêdî, R. (2019). *Ferhenga Gotinên Mezinan*. Dihok: Weşanxana Parêzgeha Dihokê.
- Artis, L. (2018). “Speech Act Threat in Everyday Conflict Discourse”. *Prouction And Perception. Language Yesterday*, 6(17), 418-435.
- Austin, J. L. (1962). *How To Do Things with Words*. Oxford: Printed in Great Britain.
- Austin, J. L. (1972). *Performatives-Constative, in The Philosophy of Language, ed “Searle, J. R”*. Oxford: Oxford University Press.
- Axdûş, H. (2016). “Nezerîyyetu Ef’alu’l-Luxe leda el-Feylesûf Êstin Ususeha we Hidûduha el-Felsefîyye”.
- Bedîr, H. (2003). *Eseru’t-Turas eş-Şe’bî fî’l-Edebi’l-Hedîs*. Îskenderîyye: Daru’l-Wefa.
- Brauch, H. (2011). “Coping With Global Environmetal Change, Disasters And Security Threats, Challenges”. *Vulnerabilities And Risks*, Berlin Springer. 6(12), 131-152.
- Brown, P & Levinson, S. (1987). *Politeness: Some Universals in Languages Usage*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Ce’fer, H. (1986). *Gotinên Mezinan Li Devera Behdînan*. el-Wezîrîye: Weşanxana ‘Ela.
- Ce’fer, H. (2006). *Pejin û Gotinên Kurdî*. Hewlêr: Weşanxana Hacî Haşim.
- Cemîl, N & Elî, Ş. S. (2021). “Kirdeya Têkçûna Roxsarî û Stratîcîyetên Rêzgirtinê di Axaftina Senterê Xelkê Devoka Dihokê da”. *Govara Zanîngeha Dihok*, 24(2), 94-137.
- Crystal, D. (1992). *An Encyclopedic Dictionary of Language and Languages*. Oxford: Black Well Publishers.
- Crystal, D. (1992). “An Encyclopedic Dictionary of Language and Languages”. *Led, Black Well Publishers*, Mînak: 18(9), 36-61.

- Dawûd, A. S. (2009). *el-Emsalu'l-'Erebîyye el-Qedîme, Dîraset Uslûbîyye Serdîyye Hedariyye*. Beyrût: el-Mu'ssesetu'l-'Erebîyye li'd-Dirasat we'n-Neşr.
- Dêrşewî, M. M. (2000). *Mîstaxa Çîya ji Gotinên Pêşîya*. (Çapa Duyem). Hewlêr: Weşanxana Zanîngeha Selahedîn.
- Denanî, Ş. Q. (2012). *Çend Têkistên Pîroz ji Ola Êzdîyan*. Dihok: Weşanxana Hawar.
- Dharma, N. (2016). "The Use of Face, Threatening Acts Strategies in "The Confession"". *Movie. Unpublished Mathesis. Jambi University*, 9(18), 46-71.
- Dizey, E. M. (2012). *Şêwaz û Piragmatîk*. Istanbul: Weşanxana el-Rewze.
- Duskî, M. E. (2009). *Qamos Sipîrêz*. (Çapa Duyem). Dihok: Weşanxana Sipîrêz.
- ‘Ebdula, Ç. T. M. (2016). *Zimanê Şîretan di Posterên Saxlemîyê da "Posterên Rêveberî ya Giştîya Saxlemîya Dihokê Wekî Mînak"*. Teza Lîsansa Bilind. Zanîngeha Dihok: Kolîja Zanistên Mirovayetî.
- ‘Ebdula, E. M. (2017). *Gotara Civakî di Gotinên Mezinan de "Devera Behdînan" Wekî Mînak*". Teza Lîsansa Bilind. Zanîngeha Dihok: Kolîja Perwerda Binyat.
- ‘Ebdula, E. N & Elî, Ş. S. (2011). *Zimanvanî ya Tîyorî*. Hewlêr: Weşanxana Hecî Haşim.
- ‘Ebdulcelîl, E. (2006). *el-Mu‘cemu'l-Wezîfî li Meqayîsî'l-Edewat en-Nehwîyye we's-Serfîyye*. Urdun: Daru's-Sefa li'n-Neşri we't-Tewzî‘.
- ‘Ebdul‘ezîz, M. H. (2009). *‘Îlmu'l-Luxetî'l-Îctima‘î*. Qahire: Mektebetu'l-Adab.
- Ehmed, X. S. (2013). *Rengvedana Gotinên Mezinan di Roxsar û Naveroka Hozanên Nalbendî da*. Teza Lîsansa Bilind. Zanîngeha Dihok: Kolîja Adabê.
- el-Ferec, M. A. (2009). *el-Me‘acim el-Luxewîyye (Fî Dew‘î Dirasat ‘Îlmi'l-Luxetî'l-Hedîs)*. (Çapa Duyem). Beyrût: Daru'n-Nahdeti'l-'Erebîyye.
- Elî, A. M. (2006). *Gotin û Civak*. Hewlêr: Weşanxana Aras.
- Elî, M. M. Y. (2004). *Miqeddime fî ‘Îlmeyî'd-Delaleti we't-Textatub*. Beyrût: Daru'l-Kitab el-Cedîd el-Muttehide.
- Elî, Ş. S. & Xelîl, E. R. (2019). "Kirdeyên Arastekirinê Dinavbera Razîbûn û Retkîrînê da". *Govara Zanîngeha Dihok*, 22(2), 448-473.
- Elî, Ş. S. (2011). *Wata Dinavbera Sîmantîk û Pragmatîkê da*. Dihok: Weşanxana Xanî.
- Elî, Ş. S. (2012). *Razîkîrîn Di Gotara Ramyarî de*. Teza Diktorayê. Hewlêr: Zanîngeha Soran, Kolîja Adab.

- Elî, Ş. S. (2014). *Pragmatîk*. Hewlêr: Weşanxana Hacî Haşim.
- Elî, Ş. S. (2015). *Watasazî*. Dihok: Weşanxana Hawar.
- Elî, Ş. S. (2020). *Sirovekirina Gotarê*. Dihok: Weşanxana Muksî.
- Elî, Ş. S. (2023). *Ji Watayê Bo Watayê “Komeka Vekolînan”*. Dihok: Weşanxana Gazî.
- Elî, S. S. M. (2022). *Stiratîjîyetên Şîretê li Def Axivtinkerê Senterê Devoka Dihokê*. Teza Lîsansa Bilind. Zanîngeha Dihok: Kulîja Perwerda Binyat.
- en-Nehwî, E. E. R. (1998). *Edebu’l-Wesaye we’l-Mewa’iz*. Su’ûdî: Daru’n-Nehwî.
- el-Şerîfî, S. (2011). *Fî ‘Elaqat el-Edeb Bulnisyan*. Tunnis: Daru’l-Tunisîye lî’l-Kîtab.
- el-Şenawî, M. M. (1996). *el-‘Emelîyyetu’l-Îrşadîyye*. Qahire: Daru’l-Hurîyye.
- el-Wehhab, E. S. (1987). *el-Luxe we’l-Me’na we’s-Sîyaq*. Bexdad: Weşanxana eş-Şu’ûn es-Seqafîyye el-‘Amme.
- Elwenî, N. X. (2008). *Pend û Qisey Nesteqî Şarî Xaneqîn*. Hewlêr: Weşanxana Mokrîyanî.
- ‘Ezîz, S. R. (2014). *el-Ef’al el-Kelamîyye el-Tewcihîyye we’t-Te’bîrîyye fî’l-Qisesi’l-Qur’anî*. Teza Diktorayê. Hewlêr: Zanîngeha Koye, Kulîja Perwerda Binyat, Beşa Zimanê ‘Erebî.
- Farnia, M. (2014). “Advice Strategies In English By Maiay University Students”. *International Journal of Language Learning and Applied Linguistics World*, 5(3), 426-438.
- Gerdî, H. (2005). *Gencîne û Keltûrî Kurdî “Pendî Kurdî”*. Hewlêr: Weşanxana Roşenbîrî.
- Gerdî, H. (2005). *Gencîne û Keltûrî Kûrdî Pendî Pêşînan*. Hewlêr: Weşanxana Roşenbîrî.
- Green, G. (1996). “Pragmatics And Natural Languages Understand”. *United States of America: Mahwah-New*, 4(7), 232-256.
- Herb, T. (1999). *Ewlîyyetu’l-Nes*. Lubnan: Weşanxana el-Mu’essestu’-Cami’îyye li’d-Dirasat we’n-Neşri we’t-Tewzî’.
- Hinkle, E. (1997). “The Appro Priateness Of Advice, Dtc And Multi Choice Date”. *London: Routledge*, 4(3), 49-68.
- Hisên, E. (2006). *Ferhenga Gotinên Pêşîyan*. Hewlêr: Weşanxana Hacî Haşim.
- Holmes, J. (2001). “An Introduction to Sociolinguistics”. *Edinburgh: Longman*, 6(3), 333-358.
- Huang, Y. (2008). “Politeness Principle in Cross Cultur Communication”. *English Language Teaching Journal*, 1(1), 39-73.
- Kakeyî, H. (2006). *Pend û Qiseyî Nesteqî Maço*. Hewlêr: Weşanxana Kiştokal.

- Kemaluddîn, H. E. (2007). *‘Îlmu’ d-Delale el-Miqarin*. Bexdad: Weşanxana Daru Mektebetu’l-Adab
- Leech, G & Svartvik, J. (1994). “A Communicative Grammar of English. London”. **London: Longman**, 3(5), 231-257.
- Leech. (1983). “Principles of Pragmatics”. **London: Longman**, 5(11), 123-129.
- Lehto, M. R & Salvendy, G. (1995). “Warning. A supplement not a Substitute for other Approaches to safety. *Ergonomics*, 38(11), 2155-2163.
- Levinson, S. (1983). *Pragmatics*. London: Cambridge University Press.
- Îbn Menzûr. (1999). *Lîsanu’l-‘Ereb*. (Çapa Sêyem). Lubnan: Weşanxana Îhya et-Turas el-‘Erebî.
- Meqbûl, Î. (2006). *el-Usus el-Ebistimolocîyye we’t-Tedawulîyye li’n-Nezerî’n-Nehwî ‘inde Sîbeweyhî*. Arbed: Daru ‘Alemlî-Kutub el-Hedîs.
- Meriç, C. (2018). *Kûltürden İrfana*. (Altıncı Baskı). İletişim Yayıncılık. İstanbul.
- Me’rûf, A. E. H. (2013). *Rêzgirtin le Zimanî Kurdî da*. Silêmanî: Weşanxana Lerya.
- Me’rûf, B. O. E. (2000). *Mîtafor Le Riwaney Zimanîyewe*. Teza Diktorayê. Silêmanî: Zanîngeha Silêmanî, Kolîja Ziman.
- Mey, J. (1993). *Pragmatics. An Introduction*. Oxford: Basil Black well.
- Mîran, R. (2009). *Îtnografîya û Yekêtî Êtnîkî Kurd*. Hewlêr: Weşanxana Aras.
- Mokriyanî, G. (2017). *Ferhengî Kurdistan*. (Çapa Duyem). Hewlêr: Weşanxana Rojhelat.
- Mokriyanî, K. (1999). *Ferhengî Kurdistan*. Hewlêr: Weşanxana Aras.
- Mûsa, X. F. & Ehmed, F. F. (2014). *Îstîbaq Miqawime el-Îqna’*. Urdun: Weşanxana Zemzem Naşîrûn we Muwezzi’ûn.
- Nîzamedîn, F. (2003). *Ferhengî Estêre Geşe*. Hewlêr: Weşanxana Wezareti Perwerde.
- Norî, N. C. (2021). *Kirdeya Têkçûna Roxsarî û Straticîyetên Rêzgirtinê di Axaftina Xelkê Bajêrê Dihokê da*. Teza Lîsansa Bilind. Zanîngeha Dihok: Kolîja Perwerda Binyat.
- ‘Umer, A. M. (1982). *‘Îlmu’ d-Delale*. Kuwêt: Daru’l-‘Urûbe.
- Omer, C. Î. (2011). *Şîret û Şîretkarî “di Hozana Civakî ya Nalbendî da”*. Teza Lîsansa Bilind. Zanîngeha Dihok: Kolîja Adabê.
- Oncu, M. (2020). *Gotinên Pêşîyan*. Van: Weşanxana Sîtav.

- Pambudai, N. W. (2017). *An Analysis of Commissive Speech Act Used In The Vow (Pragmatics Study)*. Surakarta: English Letters Department Islamic Education and Training Faculty the State Islamic Institute.
- Parker, F & Riley, K. (2005). *Linguistics for Non-Linguistics Library of Congers Cataloging in data*. Printed in USA.
- Pêndiroyî, C. S. (2005). *200 Pend ji Cîhanê*. Hewlêr: Weşanxana Wezareta Perwerdê.
- Perry & Etal. (1981). *Evacuation Planing Emergency Management*. Lexington. Massachuettis and Toronto: Lexington Books.
- Qazî, H. (2005). *Ferhenga Qazî*. (Çapa Duyem). Dihok: Weşanxana Sipîrêz.
- Qerenî, E. (1984). *Kanî*. Bexda: Weşanxana Es'ed.
- Renkema, J. (2004). *Introduction To Discourse Studies*. Amsterdam: John Benjamins.
- Reşad, F. H. (2019). *Rehendê Sîmanîkî û Pragmatîkî di Deqê Şanoya Kurdî da*. Dihok: Weşanxana Parêzgeha Dihokê.
- Reşad, Î. H. (2012). *Rengdanewey Kelepûr le Romanî Kurdî da*. Hewlêr: Weşanxana Rojhelat.
- Resol, Î. M. (1970). *Edebî Folklorî Kurdî*. Bexda: Weşanxana Cahiz.
- Roger, L. B. (2016). *Safety And Helth For Engineers*. American: United State.
- Roxzadî, E. (2003). *Guwarey Kurdewarî Pend û Qisey Pîşînîyan*. (Çapa Duyem). Sine: Weşanxana Kurdistan.
- Şareza, K. (1976). *Pendî Pêşînan le Şî'rî Kurdî da*. Bexda: Korî Zanyarî Kurd.
- Şarezorî, E. M. (1981). *Pendî Pêşîna*. Bexda: Weşanxana el-Hewadis.
- Searle, J. R. (1974). *Linguistics and the Philosophy of Language, In Linguistics And Neighbouring Disciplines*. Amsterdam: North Holland.
- Searle, J. R. (1975). "Indirect Speech Act". *New York: Acadimic Press*. 3(1), 54-82.
- Searle, J. R (1979). *Expression And Meaning*. Cambridge: Cambridge University.
- Searle, J. R. (1969). *Speech Act. An Essay in the Philosophy of Language*. Cambridge University Press.
- Se'îd, N. M. (2011). *Çend Gotin û Pejnen Kurdan Ji Devera Badînan*. Dihok: Weşanxana Hawer.
- Se'îd, R. E. (2021). *Kotşikandin û Mebestên Ewê Yê Pragmatîkî di Zimanê Şî'rê da*. Teza Lîsansa Bilind. Zanîngeha Dihok: Kulîja Perwerda Binyat.

- Selîm, F. X. (2016). *Îslûbu't-Tenbîye fî el-Lu'lu'i we'l-Mercan fî Dew'i el-Nezerîyyeti't-Tewasyîyye li Cakibson*. Teza Lîsansa Bilins. Hewlêr: Zanîngeha Soran, Kolîja Adab.
- Silêman, L. F. (2021). *Kirdeya Gefkirinê Di Zimanê Hozanê da "Dîwana Baxê Kurda"*. Dihok: Weşanxana Gazî.
- Sindî, B. (2009). *Zargotina Kurda Gotinên Mezina*. Hewlêr: Weşanxana Aras.
- Şingalî, E. E. (2010). *Gotinên Mezinan û Îdyom Li Çîyayê Şingalê*. Silêmanî: Weşanxana Şivan.
- Solomon, K. A. (1995). *Warning: When Do They Help, When Do They Hurt*. Santa Monica Rand.
- Stubbs, M. (1983). *Discourse Analysis Sociolinguistic Analysis of Natural Language*. Oxford: Blackwell Publishers.
- Tewfîq, Q. K. (1995). *Curekanî Riste û Tîyorî Qiseyekan*. Teza Lîsansa Bilind. Hewlêr: Zanîngeha Selahedîn, Kolîja Adab.
- Thomas, E. D. (2012). *Human System Responses to Disasters*. New York: Fifth Avenue.
- Tiersma. (2002). *The Rutledge Handbook of Forensic Linguistics*. New York USA.
- Vanderveken, D. (1990). "Meaning And Speech Act". *Cambridge University Press*. 2(3), 80-143.
- Watts, R. J. (2003). "Politeness". *Cambridge University Press*. 4(9), 133-147..
- Wierzbicka, A. (1987). *English Speech Act Verbs. Semantic Dictionary*. Academic Press.
- Wogalter, M. S. (2006). "Purposes And Scope of Warning". *North Carolina State University*. 10(111), 1-9.
- Xal, Ş. M. (1971). *Pendî Pêşînan*. (Çapa Duyem). Silêmanî: Weşanxana Kameran.
- Xal, Ş. M. (2017). *Ferhengî Xal*. Hewlêr: Weşanxana Rojhelat.
- Xankî, K. (2008). *Gotinên Mezinan di Hozana Ceger Xwîn da*. Dihok: Weşanxana Azadî.
- Xetam, C. (2016). *et-Tedawîliye Esûluha we Îtticahatuha*. Urdun: Daru Kinûzi'l-Me'rîfe li'n-Neşri we't-Tewzî'.
- Yaqût, M. S. (1997). *Menhecû'l-Behsi'l-Luxewî*. Kuwêr: Daru'l-Menar el-Îslamîyye.
- Yasîn, W. M. S. (2006). *Gotinên Pêşînan li Devera Badînan*. Dihok: Weşanxana Hawar.
- Yule, G. (1996). *Pragmatics*. Oxford University Press. Printeg in Hong Kong.

ÖZGEÇMİŞ

Kişisel Bilgiler

Soyadı, Adı : Araz Khalaf AMO
Uyruğu :
Doğum Tarihi ve Yeri :
Telefon :.....
Faks :.....
E-mail :



Eğitim

Derece	Eğitim Birimi	Mezuniyet Tarihi
Yüksek Lisans	Van YYÜ.	05.06.2023
Lisans	Irak	2019-2020

İş Deneyimi

Yıl	Yer	Görev
.....		

Yabancı Dil

İngilizce

Yayınlar

.....

Hobiler

.....



VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU

05/06/2023

Tez Başlığı / Konusu:

Kirdeya Hoşdarîkirinê di Gotinên Mezinan de

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 120 sayfalık kısmına ilişkin, 10/05/2023 tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından Turnitin intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı %2 (iki) dir.

Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

05/06/2023
Araz Khalaf AMO

Adı Soyadı : Araz Khalaf AMO
Öğrenci No : 21950001008
Anabilim Dalı : Kürt Dili ve Kültürü
Programı : Kürt Dili ve Kültürü
Statüsü : Y. Lisans ☐ Doktora ☐

DANIŞMAN
Doç. Dr. Haşim ÖZDAŞ
05/06/2023

ENSTİTÜ ONAYI
U Y G U N D U R
05/06/2023

Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ
Enstitü Müdürü